# FELSEFEVAN

**kovara felsefî, zanistî û ramanî**
**hejmar 5, sal 2. rêbendan, sibat, adar**



**deng û rengê felsefe û zanyariyê**

**KOVARA FELSEFEVAN**
**Kovara felsefî, zanistî û ramanî**

Xwedî û berpirsiyarê giştî

**Ali Gurdilî**

*Chef Edîtor*

Ali Gurdilî

Hejmar 5, Sal 2

Rêbandan, Sibat, Adar 2016

Sêwirandina berg û rûpelan:

Weşanên Felsefevan

Berg

Socrates Drinking the Hemlock. Antonio Zucchi

E-peyam: felsefevan@hotmail.com

facebook: https://www.facebook.com/KovaraFelsefevan

twitter: https://twitter.com/KovarFelsefevan

Malper: www.felsefevan.org



# BIBE ABONEYÊ KOVARA FELSEFEVAN

Heke hewesa te li ser felsefe, civaknasî, psîkolojî, lêkolîn, mîtolojî, aforîzma, hevpeyvîn, zanist û hwd. hebe û bixwazî ku bi zarê xwe yê şîrîn û zimanekî herikbar haya te ji wan mijaran hebe, pêşniyazeke me heye; ji kerema xwe bibe aboneyê Kovara Felsefevan. Abonetiya ji bo salekê/salewext (çar jimar) 40 TL û ji bo Ewropayê jî 40 € ye.

Bo têkilî: felsefevan@hotmail.com

Buhayê Kovarê: Li Kurdistana Bakur û Turkiyeyê: 10 TL û ji bo Ewropayê jî, 10 € ye.

facebook: https://www.facebook.com/KovaraFelsefevan

twitter: https://twitter.com/KovarFelsefevan

Malper: www.felsefevan.org

Hotmail adres: felsefevan@hotmail.com

**NAVEROK**

02- Şev Min Xewle Dike | Farûq Karabat
04- Tirkî Ji Bo Kurdan Jehr e | Mehmet Sıddık Dilek
07- Fetlaneka Nependî: Mirin | Emre Mûhargînî
10- Li Gorî Zanistê Gumaniya Nebûna Xwedê | Şerîf Çelebî
15- Qelîştekên Edebiyat û Felsefeyê | Çorê Arda
22- Çanda kurdî bi serê xwe felsefeyeke jiyanê ye | Murat Boran
24- 'Derheqê Dewleta Platonî de' | Mahmut Ozçelîk
41- Li Ser Qederê | Jan JAN
46- Afirandêrıya Yekitiya Dijberan | Ali Gurdilî
48- Şaristanî, Kurd û Dewlet | Gul Y. Seven
54- Felsefe, Bişkivîn û Kulîlkvedana Eqlê Însanî ye | Ferzan Yezdanî
57- Matematîk Kilîda Gerdûnê ye | Ali Gurdilî
59- Çima Felsefe? | Tengezar Marînî
60- Vekolerê Pispor: Sokrates | Ali Gurdilî
65- Koleyên Azad: Feylesof | Rêzan Erzirom
66- Platon û Felsefeya wî ya Perwerdehiyê | Ali Gurdilî
74- Arîstotales | Ali Gurdilî
83- Felsefe Du Car Meraq e | Remzî Şener
85- Pêdiviya Felsefeyê | Orhan Agirî
87- Li Ser Peyva Diyalektîkê Çend Gotin | Ali Gurdilî
90- Felsefe, Di Tariyê de Gera Çiruskekê ye | Mîr Qasimlo
94- Li Ser Têgeha Erdemê Çend Gotin | Ali Gurdilî
98- Hişmendî, Kurd û Felsefe | Evîn Berçem
100- Kozmopolîtîzm û Êzdayetî | Ali Gurdilî
107- Felsefe, Sirên Gerdûnê Eşkere Dike | M. Alî Kut
108- Felsefe, Awayekî Hêjayê Ramînê ye | Raif Yaman
109- Kînîzm û Feylesofên Kynîkî | Ali Gurdilî
114- Hevpeyvîn bi Konê Reş re
125- Civaknasî: Bizavdarî, Statû û Rola Civakî
127- Psîkolojî: Ekolên Psîkolojiyê û Taybetmendiyên wan
132- Ji Mîtolojiya Êzdiyan | Menzel
134- Ferhengoka Felsefeyê (05) – Ali Gurdilî

## ŞEV MIN XEWLE DIKE

Çi tiştê hatiye serê min û yên ew ê were serê min giş bela hebûna min e. Ez bedela hebûna xwe bi hezar tonan giraniya xeyalên xwe yên ku li hêviya mexlubuyeta xwe, bi peyvên xwe yên ku zewqek belasebeb dide min û bi êşa tengezariyek metafizîkî didim. Xwezî bedela hebûna min ev tenê ba. Gelo ji ber hebûna xwe ez çi xweliyê lî serê xwe bikim. Tenêtiya min bi tirsên min û kabûsên min nayê gûhertin. Lewre her mirov meytekî firar kiriye. Armanca wî meytî ya sereke ew e ku vê tenêtiyê xera bike û agirê wê bitemirîne û piştre lehengekî qeşmer biafirîne. Qeşmerekî teqez reben û têra xwe rezîl. Berî hertiştî ew deyndarê meytê xwe ye. Ev qeşmer dest bi pêxemberiyê dike û nahêle hesabê hebûna xwe bibîne. Di bin barê dîrokeke barbar de û tije lehengên wekî wî. Di bin qedereke ji zû ve hatiye mexlûpkirin û li hêviya qiyameteke bê çirûsk û kosmoseke tarîtiyê di pejiqîne de.

Hêsirê qehpikekê ji yê melakî û keşîşekî bi qimetir e. Ev civak bi waaz û şiretan li ser linga dimine. Lewre tenê mele û keşîş waaza venade yên ku nebûne mele û keşîş jî, ji xwe li herderê wan bi sixtekarî teqlid dikin û waaza vedidin. Xwezî ji dêvla vê civaka heyî, civakek li gorî şîret û waazên qehpikekê ava biba. Wê çaxê dibe ku haya mirovan ji vê komediyê çêbiba. Ez difikirim ez çi bikim? Divê ez zagonên vê gerdûnê *(an jî yên hebûnê)* fêm bikim. Gelo sirra vê gerdûnê çi ye? Difikirim. Lê mixabin, ev ne pekan e. Lewre bi îxtimaleke mezin afirînêr bi me dilîze. Hem jî bi tilîkan.

Heta tu ji tiştekî dûr nekeve, tu di wî tiştî de tê nagihêje. Gelo ev ji bo 'têgihiştinê' bi xwe jî ne derbasdar e? Ji xwe ji bo ku organên me yên pêheskirinê me nexapîne tu sedem tune ye.
Li gerdûnê nêzîkî du sed û pencî mîlyar galaksî hene, dibe ku hîn jî zêdetir bin. Di galaksiyekê de bi milyaran stêrk hene. Her stêrkek xwedî pergalekê ye û çûk mezin bi hezaran cisim û planet li dora wê dizîvirin. Ew jî li dora navenda galaksiya xwe dizîvirin.

Em ji sibehê heta êvarî li pê wê dizîvirin. Belê hinek jî gav û saet li pê hineka dizîvirin.

Bêgûman tu tiştekî 'bêgûman' tune ye.

Zagona Termodînamik a duyem wiha ye; di gerdûnê de hertişt–belê tiştê 'pîroz' jî ew ê hêdî hêdî xira bibin û birizin. Ên wek me ew ê piştre genî jî bibin. Xweziya min bi yên din.

Kes nizane em ji bo çi hene? Gelo em bi rastî jî hene? Ez bigûman im. Lewre made, mirov, dar, zinar welhasilî hertişt vikî vala ne. Tiştek di naveroka wan de tune ye. Lewre dibingeha made de atom hene. Atom jî ji sedî 99,9999999999999 vala ye. Jiber kû hertişt ji made pêktên ev valahî jibo hertiştî derbasdar e. Çîroka me ya hebûnê ji gîzemekê hatiye û ev gîzem bi xwe tenê ji mirova re gîzem e, ji yê ku bûye sedema vê gîzemê ne xem e.

Ez êdî ji pir tiştî aciz bûme. Ji ber her roj xwarin û vexarinê. Ji ber her roj serşoyê. Ji ber her roj çûyina ser gû.

Eger mirov wek hirça, ji şeş mehan şûnde dev ji hev berdin û bitena serê xwe bi çol û çepela bikevin, wê çaxê belkî dereceyekê êş û elema hebûna wî/ê kêm bibe. Çenekî bitemire. Dibêjim qey yekî ji min re got lê şaristanî. Ax! Ax!

**Farûq Karabat**

27.01.2016

**Tirkî Ji Bo Kurdan Jehr e**

Girîngiya zimên li ser nasnameya neteweyî pirr tê gotin. Lê ne tenê wek kiras ku nasnameya we nîşan bide û biparêze, wekî din li ser nêrîna we ya dinyayê û li ser dinyaya we ya derûniyê çi rola zimên heye? Kurdeke ku bi kurdî nizane û bi tirkî dinyayê bişopîne û binase çi xeter jê re heye?

Kurdekî ku kurdî nizane û ji xwe îngilîzî jî nizanibe taybetî di şert û mercên Tirkiyeyê de, dê dinyayê bi tirkî binase û bixwîne. Ji bo ku bi tirkî dixwîne dê dinyayê bi nêrîna tirkan bibîne. Dê bi dûrbîna tirkan li dinyayê temaşe bike. Ev jî ji bo nasnameya kurdî xetereyeke mezin bi xwe re dertîne. Çumkî, tirk ku mijar kurd be rastiyên dîrokê, jiyanê, çapemeniyê diguherînin û jixwe ji wan were her tiştî diguherînin û ji ti derewan xwe nadin alî. Ku hûn mijara kurdan ji tirkan bipirsin jixwe kurd heta 20 sal berê tunebûn. Ji xwe li gor dîroka tirkan ya fermî hûn derbarê kurdan de tu tiştî nikarin bibînin. Ev nêrîna fermî ya dewletê di her qadên jiyanê derbasî hiş û tevgerên tirkan bûye.

Mînakeke biçûk: Min beriya çend salan pirtûka derbarê Morco Polo de xwendibû lê ez rastî kurdan nehatibûm di pirtûkê de. Piştî çend salan di kovara Zend *(hejmara yekem a sala 2011î)* min xwend ku Morco Polo di pirtûka xwe de nivîsandiya ku wî li Mûsilê kurd naskirine û bi berfirehî qala kurdan dike. Hûn ji çapemeniya tirkan bişopînin hûn rastiya kurdan û Kurdistanê tu caran hîn nabin. Mînakeke din: Di demên Şerê Kobanîyê de kurd li her deverên cîhanê li ser piyan bûn. Li Ewrûpa balafirgeh, stasyonên trenan, avahîya Yekîtiya Ewrûpayê hwd ji aliyê çalakvanên kurd ve bûn qadên çalakiyan û berxwedanê. Lê di çapemeniya Tirk de ev bûyer wek nûçe cî negirtin. Ku hûn bi tenê bi tirkî bijîn hûn ê rastî pergela tirkan a hemberî kurdan bên.

Di vê pergalê de dîroka kurdan tune ye, zimanê kurdan nîn e, heke hebe jî bi kêrî tiştekî nayê. Dîsa li gor vê pergalê wêjeya kurdî tune ye, jixwe welatê kurdan qet tune ye. Ji bilî van jî ku hûn bi kurdî nizanibin hûn çiqas navên Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Baba Tahirê Uryan, Nalî, Hecî Qadirê Koyî, Arjen

Arî, Rojen Barnas hwd. bibihîsin jî hûn tu carî nikarin wan bixwînin û evîna dilê wan nivîskar û ronakbîran hîn bibin, hûn nikarin Hawara Mîr Celadet bibihîsin. Bi kurtasî ku hûn bi kurdî nizanibin, hûn ê wek tirkekî dîrokê bixwînin, wek tirkekî çapemeniya dinyayê bişopînin, hûn ê bi wêjeya tirkî şad bibin û di dawiyê de hûn nebin tirk jî, hişê we dê wek tirkan bifikire û dilê we wek tirkekî lê bide. Ya din jî hûn ê ji wêje, dîrok, çand û hunera kurdî bêpar bimînin. Mixabin ji ber van sedeman dilê we çiqas kurd be jî lê zimanê we û mejiyê we dibe ziman û mejiyê tirkan. Hûn ê ji helbestvanên xwe bêhtir helbestvanên xêrnexwazên xwe nas bikin. Hûn ê ji dîroka xwe bêhtir dîroka wan bixwînin. Hûn ê ji zimanê xwe bêhtir bikarin bi zimanê wan biaxivin. Ev jî tê wê wateyê ku hûn ê ji kurditiyê bêpar bimînin.

Li vir pirseke wisa derdikeve pêşiya me: Êre, em bi kurdî dikarin nasnameya xwe hîn bibin lê gelo em dikarin bi kurdî çapemeniya dinyayê bişopînin, wêjeya dinyayê bixwînin, em dikarin gelo bi kurdî dîroka xwe û ya dinyayê hîn bibin an hînî zanistê bibin? Bi awayekî din bibêjim: Ew derfetên kurdî hene ku em ji dinyayê bi kurdî agahdar bibin û dinyayê bi her awayî bi kurdî bixwînin û binasin. Mixabin ev derfetên zimanê kurdî bi taybetî li Bakurê Kurdistanê tune ne, ji ber nêbûna perwerdehiya bi kurdî. Ji bo em vê valahiya ku ji bê derfetiya kurdî derdikeve pêşiya me dagirin, pêwist e em hînî îngiliziyê bibin. Dema em bi îngilîzî bizanin em ê dinyayê bi îngilizî binasin. Jixwe di vî zemanî de îngilîzî ji bo her kesî pêwist e ji bo ku rewşa kurdî, ji kurdan re hê pêwisttir e. Dema hûn bi îngilîzî bizanin hingî hûn ê cudahiya çapemeniya tirkî û çapemaniya cihanê bibînin. Di çapemeniya tirkî de berxwedana kurdan bi peyvên wek ‘xaîn, terorist’ … cî digire. Mafên kurdan ên xwezayî wek self-determînasyon, perwerdehiya bi zimanê kurdî, mafên çandî pirr kêm dikevin ber çavan. Halbûkî di çapemeniya cîhanê de pirsgirêka kurdan bi perspektîfa ‘gelo dewleta kurdan a serbixwe nêzîk e?’ tê rojevê. Di raya giştî ya navneteweyî de berxwedana kurdan di asteke pirr bilindtir cî digire. Kurd sedsala welatê wan di navbera çar dewletan de hatiye

dabeşkirin û zilm li wan hatiya kirin. Lewre dema mirov çapemeniya cîhanê bişopîne, wê demê asta berxwedana kurdan xuya dibe. Bi vê jî baweriya mirov a doza kurdan pir bilindtir dibe. Mirov ji çapemeniya tirkan a pûç û vala derbasî çapemeniya cîhanê bibe, hişmendiya rastî derdikeve.

Di encamê de, divê kurd bi zimanê kurdî, xwe û nasnameya xwe binasin. Cîhanê jî bi îngilîzî binasin û bişopînin. Bi vî awayî em dikarin ji bandora tirkî rizgar bibin û li hember asîmîlasyonê li ber xwe bidin. Ji bo hûn hiş û dilê xwe ji jahriya tirkî biparêzin an xwe jê pak bikin, divê hûn hînî kurdî û îngilîziyê bibin. Ji bo ku hûn xwe û nasnameya xwe binasin, ji bilî zimanê kurdî çareserî tune. Ji bo hûn cîhanê binasin jî îngilîzî bivênevê ye.

**Mehmet Sıddık Dilek**
27.01.2016

> ‘Di gerdûnê de çawa ku başî û bextewarî heye, wisa jî xirabî heye. Heta ku ji destên meriv bê, divê meriv ji vê dinyayê dûr bibe û bi zanayî û bi erdema xwe, xwe nêzîkê cîhana îdeayan bike. Pêzanîna zanayiya îdeaya başiyê, bi zanîna zagona ehlaqê pêk tê.
>
> Ev zagon jî, tiştên divê em nekin û tiştên ku divê em wan pêk bînin, nîşanê me dide.’
>
> **(Platon| Eflatûn)**

## FETLANEKA NEPENDÎ: MIRIN

Mirin; Qutbûn (tunebûn) an jî ji nû ve vejîn
Dawiya her tiştî an jî destpêka her tiştî.

Awê ku tê zanîn her kesek di çemê xwe da soberî dike. Mirin jî ji bo her kesî tiştekî ifade dike. Nêrîna her kesekî a li hemberî mirinê û bîr û baweriya her kesî a piştî mirinê cuda ye. Lê rastiyek û tiştek mutlaq heye, ku ew jî mirin e. Her candar çi mirov, ajal û nebat dibe bila bibe, wê rojekê mirinê tehm bike. Ji destpêka mirovahiyê heta îro çi mirov dibe bila bibe *(ê/a xwediyê fehm û feraset û mêjî û fik û raman)* bi teqezî li mirinê fikiriye û van pirsa ji xwe pirsiye: * ‘Gelo bi mirinê wê dawî li her tiştî bê û ezê tune bibim, yan jî mirin ji bo jiyanekê nû derfêt û destpêkek e?’ * ‘Gelo ku ez mirim ew ê giyanê min çi pê bê? Ew ê here semayê bigihîje asta xwedayî yan bi kirasguherînê *(reenkarnasyon)* wê ji nû va were ser rûyê erdê û yan jî ew ê qutbibe û bibe tunê heta bi hetayê?’

Wekî van pirsan meriv dikare bi sedan pirsan bijmêre, lê belê pirsa herî girîng ev herdu xuya dikin. Ji hemû dînê xwedayî bigire hetanî dînê dinê xwestine ku bersivê bidine van pirsan û dilê bawermendên xwe bînin cîh û xweş bikin. Bi rastî jî bi hînkirin û baweriya bersiva van herdû pirsan, mirov xwe di ewlehiyê da his dike. Lewre rih şîrîn e û fikra tunebûnê janeka tûj dixe dil û mirov pê dilnerehet dibe. Ji ber vê yekê hema em dikarin bibêjin hemû dîn bersiva van pirsan di çarçoveya xwe da dane. Ez dixwazim li vir çend mînakan bidim, bê ka kîjan dîn di derheqê dema piştî mirinê de çi dibêje?

**Dînê Îslamiyetê:** Awê ku tê zanîn di dînê îslamê da baweriya piştdawiyê *(axret)* heye. Bawermendên dînê îslamê, bawerî bi dojeh û bihuştê tînin. Bihuşt, wekî dilşadiyeka abadîn tê pejirandin. Bi vê baweriyê dilê bawermenda xweş dibe û tê cîh. Ev jî dike ku bawermend hewl bidin ji bo li gor vê yekê bijîn û tevbigerin. Gava ku em lê dinêrin, em dibînin ku di cihûtî û

xristiyaniyê da jî baweriya axretê (piştdawîyê) dibînin. Lêbelê bi çend xalan, ji hev cuda dibin.

**Hindûîzm:** Li gor vî dînî, mirin ne dawî ye. Kesê ku bimre bi rêya kirasguherînê dîsa tê ser rûyê dinyayê. Di vî dînî de baweriya axretê tuneye.

**Olên Çînê:** Di dîtaneyê Konfuçyus û Tao da giyanê kesê ku dimire diçe dinyayeke nediyar û li wê dinyayê wekî giyanê baş û giyanê nebaş jiyana xwe didomîne. Li dinyaya nû, li gor tevger û bizav û başî û nebaşiyê ku li vê dinyayê kirine, dibin xwediyê statuyekî.

**Şîntoîzm:** Di vî dînê japona de jî baweriya piştî mirinê heye. Li gor vî dînê kesê ku dimrin diçin dinyaya di bin erdê de û jiyana xwe li wir berdewam dikin.

Meriv dikare mînakan zêde bike, lê ez naxwazim zêde jî serê we biêşînim. Gava ku mirov dinêre, dibîne ku ne tenê ol di derheqê vê mijarê da xwediyê peyvê ne. Gelek nivîskar, feylesof û kesên xwediyê fikr û ramanan jî, xwestinê ku bersiva van pirsan bidin.

Derbarê vê mijarê de feylesofê yewnan ê bi nav û deng Sokrates wiha dibêje: 'Bi rastî hêjî kes nizane mirin çi ye, dibe ku ji bo benîadem dilşadiyeke herî mezin e, yan jî na. Lê dîsa jî mirov ji mirinê wekî ku bedbûnî û nabaşiya herî mezine ditirsin.'

Ez li vê derê nikarim fikr û ramanên hemû nivîskar û feylesofan yên di derheqê mirinê da bibêjim. Lê ez dixwazim bi taybetî li ser feylesofê alman Friedrich Nietzsche ku damezirînerê nihîlîzmêye bisekinim. Awê ku tê zanîn Nietzsche di warê felsefeyê da wekî hîva çarde şevî dibiriqe û xwediyê fikr û ramanên resen û balkêş e. Ku em li du xwe binêrin û nija jî li ser Nietzsche û fikr û ramanên wî û li ser dîttinên wî gellek gengeşî û munaqeşe hatine kirin û hê jî têne kirin. Pir tişt hatine nivîsandin û gotin. Lê ez dixwazim li vê derê li ser fikra wî ya piştî mirinê bisekinim. Gelo li gor Nietzsche, piştî mirinê wê çi bi me bê?

Gava ku em li pirtûka Nietzsche dinêrin, em pirî caran leqayê têgîna 'amor fatî' dibin. Amor fatî; ji anînivîsa xwe hez kirine. Nietzsche dibêje: 'Pêşî bêgaviyê bixwaze, piştre tiştê ku te xwestiyê hezbike. Ji bo tu bêhêvîtiyê têk bibî 'a wiha bûye' yê biguherîne 'min a wiha xwestiyê.' Bi vê têgînê Nietzsche bingeheke ji twêja ***Dubarekirina Ebedî (Eternal Return)*** re çêdike. Lewre Nietzsche dibêje: 'Gava ku te kirina kiryarekî hilbijart, tu di hemen demê de heta hetayê kirina vê kiryarê jî dubare dikî.' Û dîsa dibêje ku 'piştî mirinê jiyanek nû tuneye. Tiştê nemir ev jiyane û ev kêliye. Wê ev kêlî heta hetayê jî bidome.'

Di pirtûka xwe da ya ku bi navê '***Şen Bilim'*** li tirkî hatiye wergerandin, hin zêdetir vê mijarê ronî dike û pêşkeşî me dike. Dibêje: 'Jiyana ku tu jiyayî û a ku tu niha dijî, tu yê bêgav bimînî ku dîsa ji nû ve û bi awayekî bêhejmar bijî, tu tiştekî nû dê tunebe: hemû êş û kêf û fikr û raman û hemû henaseya te bixwe, her tiştê biçûk û mezin ê ku nayên pênasekirin, dê li dû hev û di heman rêzê da li te vegerin. Ev qenikê ku di nav dara da diçe û tê û ev pîrhevok bixwe, ev kêlî ye û ez bixwe jî. Tu ku di nav seeta qûmê ya bêdawîtiya heyînê de lekeya tozê yî û dê bi te re, ji nû ve serberjêr bêne zivartin.' Em li vir dibînin û awê ku Nietzsche bixwe jî anîye ziman ew e ku baweriya wî bi jiyana, piştî mirinê tune ye. Twêjeka nû avêtiyê holê. Lewre, tunebûn mirovan ditirsîne. Ez bawerim kesên ku baweriya wan bi jiyana piştî mirinê tune, vê pirsê ji xwe dipirsin: 'Gelo piştî ez bimirim ez ê heta bi hetayê tune bibim? Madem ez ê tune bibim, ez çima û ji bo çi hatime vê dinyayê?'

Ez dixwazin vê nivîsa xwe bi gotineke Nietzsche bikedînim: 'Jiyan, di nav du valahiyan de çirûskek e, çirûska di nav tarîtiya pêşiya zayînê û tarîtiya piştî mirinê.' Gelo bi rastî jî ev çirûsk tenê di nav van herdû heyaman de dibiriqe?

**Emre Mûhargînî**
15.03.2016

## GELO LI GORÎ ZANISTÊ GUMANÎYA NEBÛNA XWEDÊ HEYE?

**Tezên Atêistan**

Ji bo bawermend bersiv bidin du pirsên Atêîstan yên sereke, girîng û krîtîk hene.

**Pirsa Yekem: <**Deist dibêjin: ‘*Di xurdegehekî de bahozek çêbibe û bi tesadufî çêbûna balafira Boeing 747ê, werê îddîakirin çawa durî aqil e û ne mîmkun e; bi tesadufî çêbûna jîndarên kompleks jî bêhtir durî aqil e*.’ Em ateîst jî vê mantiqê diparêzin. Em jî qebul dikin ku parastina fikrê ku bi tesadufî çêbûna van jîndarên kompleks û ev huner û nizama di Gerdûnê de, pir zehmet e, durî êqil e gumanîyeke kêm e. Lê belê li gorî vê mantiqê parastina Xwedayekî ku ji her tiştî û ji herkesî komplekstir be û î nuwaze be; hebûna wî ku ji xwe hebe an jî bi tesadufî hebe gumanîyeke hê kêmtir e, bêhtir ji aqil dur e û bêhtir ne mîmkun e. Ji bo ku Xweda î nuwaze ye hebûna Wî a bi tesadufî ne mîmkun e; naxwe divê Kesekî ku berîya Xwedê heyî divê Xwedê afirandibe! Heke Xwedê hatibê afirandin naxwe Xwedê ne Xweda ye! Gelo bawermend ve nakokiya zêde mezin û kûr çawa diparêzin?...>

**Pirsa Duyem: <** Gerdûn bêpêşî û bê destpêk bû, her hebû û dê her hebe. Gerdûn jî, bêdawî û bêsînor e. Di nav van bêdawîyan de hemû gumanîyên *(îhtimal)* tesadufî -a çiqas mezin û zahmet jî bin- mîmkun in. Destpêka jiyanê, çêbûna jîndarên kompleks û her tişt bi tesadufî çêbûna wan mîmkun e. Ji loma hebûna Afrandêr *(Xwedan)* ne pewist e. Gelo delîlên ku gumanîya nebûna Xwedê jî holê rakê bi Deîstan/Bawermandan re hene?...>

***Ji bo bersiva van her du pirsên krîtîk em dê du bersivên zanistî bidin:***

**Bersiva Yekem:** Heke ku di nêrîna bawermendan de Xwedayekî di nava Gerdûnê de be û bi qanunên Gerdûnê ve î girêdayî be, yanî mahkûmê determinizmê be; naxwe Atêîst di îddîayên xwe de mafdar in. Le belê wekî li jêrê di bersiva didoyan de hatîya îspatkirin ku beriya ku bujen *(made),* vejen *(enerjî)* û dem nebû jî Xwedê hebû naxwe divê em Xwedê ji derveyî dîmenên *(boyut)* di

Gerdûnê de bibînin. Yanî Xwedê ji her tişt û ji her qanûnên di Gerdûnê munezzeh e. Piştî em gihiştin vê asta fikir, êdî gumanîya *(îhtîmal)* hebûna Xwedê em dikarin bînin ziman. Lê piştî vê astê Ateîst dikarin bi terzê Agnostîkan bêjin '*hebûna Xwedê jî, nêbûna Wî jî ne qat'î ye. Bi tesadufan jî destpêka jîyanê mîmkun e…'*

*Di vê mînaka li jêrê de zanista matêmatîkê*
*me mecburî bawerîya Xwedê dikê…*

'Laşê hemû jîndaran bi şaneyan *(hucre)* çêbuye. Ji hemû şaneyan re jî proteîn pêwist in. Proteîn jî ji zincîrên amînoasîtan *(Hîstîdîn, Lîzîn, Arjînîn,…)* çêdibin. Gelo ji bo proteînek çêbibe, bi tesadufî rêza amînoasîtan di zîncîrê de mîmkun e ku çêbibe? Em dê li ser proteînekî vê bersivê bidin. Di nav xwîna me de Proteîna Hemoglobînê heye. Ji bo Proteîna Hemoglobînê çêbibe divê 574 amînoasît di rêzeke rast de di zîncîrê de cih bigrin. Heke ji van 574 rêzan yeke tenê jî xelet be Hemoglobîn çênabe. Di laşên mirovan de 20 cureyên amînoasîtan hene. Faraza bila rêza 574 heb amînoasîtan di zîncîrê de wisa be:
HRKKSHYFM……R
- Gumanîya ku di rêza yekem de ji nav 20 cureyan de Hîstîdîn werê = 1/20 e.
- Gumanîya ku di rêza duyem de jî ji nav 20 cureyan de Arjînîn werê = 1/20x1/20 e.
- Gumanîya ku di rêza sêyem de jî ji nav 20 cureyan de Lîzîn werê = 1/20x1/20x1/20 e.
…
- Gumanîya ku di rêza dawî (574.) de jî ji nav 20 cureyan Arjînîn werê = 1/20x1/20x1/20x…x1/20 = $\frac{1}{(20)^{574}}$ e.

Yên ku ji matêmatîkê fam dikin, dê hesanî fam bikin ku watêya vê gumanîyê ($(20)^{574}$) bê îmkanî ye. Çima gelo? Ji bo ku di Gerdunê de hejmara herî mezin $(10)^{98}$ e; gumanîyên ji sînorê $(10)^{98}$ ê derbas bibin ew gumanîyên ne mîmkunîyê ne. Ez dixwazim tespît kirina hejmara $(10)^{98}$ ê şîrove bikim. Di Gerdûnê de texmînî

$(10)^{80}$ heb atom û parçekên atoman hene. Bîg Bang 13.7 mîlyar sal berê çebûye. 13.7 mîlyar sal nêzîkî $(10)^{18}$ sanîye dike. Heke ku parçayên atoman *(proton, elektron,…)* hemû amînoasît bane û ji Bîg Bangêve her sanîye ceribandinek hatibane kirin; heya niha herî zêde$(10)^{80}$x$(10)^{18}$ = $(10)^{98}$ heb ceribandin ê çêbûbane. Hejmara $(10)^{98}$ ne mîmkunî be, hejmara $(20)^{574}$ qet, qet,qet,… qet, bêhtir ne mîmkunî ye. Ji lo ma, rêza zîncîra Proteîna Hemoglobînê bi tesadufî qetîyên ne mîmkun e. Êdî tişta balkêş ev e ku di laşên me de her sanîye bi mîlyaran Proteînên Hemoglobînê çêdibin! Belê, we xelet ne bihîst her sanîye û bi mîlyaran!!!…
Naxwe, ji bo destpêka jiyanê ji %100 derîyê tesadufan î girtîye û bawerîya Hunermendekî/Afrandêr (Xwedan) ji %100 pêwist e û mecburî ye.

**Bersiva Duyem:** *Tu tişt tinebû, dem nebû, gerdûn nebû, bûjen û vejen nebû, ronahî û reşî nebû, xaleke piçûk û valahîyek jî tinebû… Di vê tinebûnê de berîya niha bi 13.7 mîlyar salan, leqînîk, hêjînîk û pêleke zêde piçûk xwîyakir, ev xaleke nêzîkî tinebûnê a piçûk bû…Û ji vê xalê devgirka beroşa kozmîk(xala kozmîk) vebû… Navê vê destpêka mucîzeyî Teqîna Mezin (Big Bang) e. Mucîzeya afirandina/peydebuna her tiştî û her zindîyî ji vê Teqîna Mezin destpêkir…*

Zanyar bi van sê delîlên ku herî girîng in, Ramana Teqîna Mezin îsbat kirine: **1.** Firehbûn, **2.** Radyasyon, **3.** Hîdrojen û helyum.
Di vê nivîsê de ji bo armanca me şîrovekirina encamên Teqîna Mezin e, em teferûatên îspatkirina vê ramanê bi hêvîya meraqdarên lêkolîner ve dihêlin.

Bersivên pirsa duyem û pirsa yekem di êncamên Ramana Teqîna Mezinde veşartîne. Gelo Teqîna Mezin ji bo nêrînên îdeolojîk û olî çi îfade dike? Encamên vê Teqîna Mezin çi ne?

*EncamaYekem:* Berê, hemu mirovan *(yên ne oldar!)* hizir dikirin ku Gerdûn bêpêşî û bê destpêk bû, her hebû û dê her hebe. Ji lo ma hebûna Afrandêr *(Xwedan)* ne pewist bû. Lê piştî hemû zanyar mecbur man ku Ramana Teqîna Mezin biparêzin; famkirin ku Gerdûn ji tinebûnê derketîye holê yanî destpêkeke Gerdûnê heye. Lê di fizîkê de qanunek heye: ‘*ji hebûnê tinebûn, ji tinebûnê jî hebûn*

*çênabê.*' Li gor vê qanunê ne mimkune ku hebûna Gerdunê ji tinebûnê çêbûbê. Li gorî Gerdûn ji Bîg Bangê, ji tinebûnê çêbûye; naxwe divê ev ne tinebûneke mutlaq be, divê ev hebûna Gerdûnê an ji tiştekî an jî ji Kesekî çêbûbê. Li gorî ev Gerdûn nuwaze ye û di her tiştî de huner heye; naxwe divê berîya Gerdûnê ne tişteke bêaqil hebê, divê kesekî ku bi aqil hebê ku ew kes Hunermendekî mezin, xwedî hiş û nuwaze be. Navê vî Hunermendî di gelek çandên Cîhanê de cûda derbas *dibe (Allah, Xwedan, God, Yahova, Ahuramazda, …).* Lê belê qesta van navên cuda hemûyan yek Hunermend e. Piştî van encaman mirovahiyê famkir ku ramanên pirtukên pîroz rast in. Ji nav gelek ayetan de em dixwazin sêye tenê parvebikin:

- *'Ew (Allah) Afrandêrê Erd û Asîmanan e….' - (Qur'âna Pîroz - 2:117)*

- *'Di destpêka demê de Yahova (Xwedê Te'ala) Erd û Asîman afirandin.' (Tevrat-Tekvîn 1:1)*

- *'Hemû tişt bi Wî (Xwedê) re/bi saya Wî çêbû. Tu tişt bê Wî çênebû…' (Mizgînîya Îsa Mesîh- Yuhanna 1:3)*

*Encama Duyem:* Di gelek olên putperestan de bawerîya wan bi pir Xwedayan hebû/heye; Xwedayê Rojê, Xwedayê Heyvê, Xwedayê Bahozê, Xwedayê Deryayê û hwd. Lê belê bi saya Ramana Bîg Bangê em famdikin ku roj, heyv, sterk, derya û her tiştê di Gerdûnê de ji yek xalî çêbûye. Naxwe kî ev xal afirandibe, ew tenê Afrandêrê her tiştî ye. Naxwe di Gerdûnê de Xwedayekî tenê heye, yanî Xweda yek e.

*Encama sîyem:* Xwedê ji hêmû tiştên ku hatine afirandin dur e, munezzeh e. Madem Xwedê Te'ala bujen *(made),* vejen *(enerjî),* dem û her tişt afirandiya, naxwe Ew î ji van tişta munezzeh e, na tijbihê tu tiştî. Ew î hakimî her tiştî ye ne mehkumê mekanan û demê ye, ne mecbur e bi demê ve jî î girêdayî be. Ji ber ku dem jî bi hebûna bujenê *(made)* ve girêdayî ve ye naxwe beriya Teqîna Mezin ku madde nebû, dem jî nebû. Li gorî beriya ku dem nebû jî Xwedê hebû naxwe divê em Xwedê ji derveyî dîmena *(boyut)* demê bifikirin.

*Encama çarem:* Gerdûn pir mezin e û nuwaze ye. Ev gerdûna tê zanîn û temaşekirin ji maddê û enerjîyê %5 tenê ye. Ji %95 'enerjîya tarî û maddêya tarî' ye. Ji bo vê yekê em dikarin bêjin heta Qiyameta kozmîk jî, mirovahî esrarên di gerdûnê de xilas nake û dê tim û daîm bi coş û kelecanî ev esrar yê werîn meraqkirin û lekolînkirin. Yanî em dikarin bêjin Xwedê Te'ala hunermendekî ewqas mezin û bilinda ku hunerên Wî a bê sînor in.
*Encama pêncem:* Li gorî Ramana Îzafî dem li her derî ne wekî hev derbas dibe. Dem bi xwekeşîya maddeyê û hareketa/lezgînîya maddeyê ve girêdayî ye. Yanî dem li gorî van her du guhêrbaran li her derî cûda diherikê. Li gorî Ramana Îzafî; tiştek an jî kesek kû ji tîrêjan lezgîntir be, ev tişt an jî ev kes dikarê di demê de herê paşerojê jî û dikarê herê pêşerojê jî. Ev lezgînîya ji tîrêjan zêdetir ji Xwedayekî bêsînor re ne pirsgirêk e. Ji lo ma Xwedê Te'ala dikarê di gavakê de hemû paşerojê *(ezelîyet)* û hemû pêşerojê *(ebedîyet)* bibînê. Yanî Xwedê bi qedera her tiştî û her kesî zanê.

**Şerîf ÇELEBÎ**
chelebisherif@gmail.com
27.01.2016

***Çavkanî***

***1-*** *Boselî Bedel, Çêbûna Gerdûnê û Peydebûna Jiyanê, Raman, Topkapı-İstanbul, Kewçêr 2013, Çapa yekemîn*
***2-*** *Dawkıns Rıchard, The God Delusion/Tanrı Yanılgısı, Kuzey Yayınları, İstanbul, 2007*
***3-*** *Didin Hâce Ahmet., The Holy Qur'an And Word Of Word Translatıon, Arabıc-Turkısh-Englısh, Rayiha Publıcatıon, Turkey-Ankara 28 August 2007*
***4-*** *(Kuran Hiç Tükenmeyen Mucize), İst .Yayınevi, 2002, 3.Baskı*
***5-*** *(Kutsal Kitap), (Tevrat, Zebur, İncil), Yeni Yaşam Yayınları, Seoul (Republic of KOREA), Kasım 2011*
***6-*** *İNCİL, Yeni Yaşam Yayınları, İstanbul Ekim 2010, 9. Bsk*

## Qelîştekên Edebiyat û Felsefeyê

*Têkiliya edebiyat û felsefeyê, mîna têkiliya behrê û masiya ye.*
***Çorê Arda***

Edebiyat çi ye? Ev pirs bi xwe felsefîk e. Ji ber ku felsefe kana xwe ji pirsê digire, wekî em dizanin ku Sokrates bi vî awayî felsefeya xwe ava kiriye, ango pirsîn-vepirsîn-bersivandin, bi gotineke din rêbaz-metoda Sokratîk, loma jî feylesofên herî mezin jî zarok tên hesibandin. Di edebiyat û di felsefeyê de têkiliyeke kevn ji berê de heye, herçiqas di hin waran de jihevdu cûda bin jî, lê bê hevdu nabin, mîna masî û bahrê ne. Belê felsefe tiştekî zanistî ye û rasyonalîst e, lê edebiyat bêtir kana xwe ji hestan, hiş, binheş, derhişiyan û ji gelek tiştên din digre, ango bêtir gelemperî ye. Edebiyat qahpikek e, carinan realîstîk e, carinan felsefîk e carinan sûrealîstîk e, carinan romantîk e, carinan oryantalîstîk e, carinan mîstîk e, carinan rasyonalîst e, carinan dadîstîk e û carinan jî mîna Derrîda xerakirin û avakirineke nû ye.

Esil li gorî Derrîda, ne xerakirine di navbera felsefe û edebiyatê de cihekî digere, herçiqas Derrîda felsefefanûsek xuya bibe jî talî bi felsefeya xwe ya 'Dekonstruktivîzm'ê de edebiyata wî xwediyê roleke mezin e. Derrîda wekî nivîskarên edebiyata Major; Mallarme, Poe, Melville, Joyce, Celan, Baudelaire, Ponge, Genet, Blanchot, Kafka, Proust û nivîskarên edebiyata Mînor Jos Joliet bi kitekit rexneya xwendina wan kiriye.

Li gor Derrîda van nivîskaran binyada teorîk a edebiyatê û felsefeyê qeydkirine û ava kirine, heke van edebiyatvanan bingeheke avakiribe, hewce nake em bêjin têkiliya edebiyatê bi psîkanalîzmê û mîtolojiyê re heye ji ber ku ev nivîskaran him di metnên xwe de, di nivîsên xwe de psîkanalîzm, mîtolojî û felsefe heta hûn bibêje honandine heta ramyarî jî tê de hatinen hûnandin. Wê çaxê em dikarin bêjin edebiyat welew felsefe him avahiyeke û him neavahiyeke tenê ye, ango stûna avahiyê ji felsefê, mîtolojî, psîkanalîzm, civaknasî û bi ramyariyê ve girêdayî ne.

Heke stûnekî wê kêm be ewçax di edebiyatê de, ango di avahiya edebiyatê de gelek tişt ew ê rijî bimînin, gelek çîrokên mîtolojîk, Oedîpûs, Elektra, Sisyphos û hwd bûne mijara felsefeyê, edebiyatê û psîkanalîzmê. Loma jî bêhevdu avahî bilind nabe, wekî em dizanin Sartre bi romanên xwe û bi şanoyên xwe mohra xwe him li navenda edebiyatê, felsefe û ramyariyê kutaye, heman tişt bo Sartre jî derbasdar e, bi gotineke din edebiyat welew felsefe dareke guliyên wê di navhevdu de ne. Belê bo avahiyê stûn giştik lazim e, belam piştre helbet her yek vediguhere odeyekê, lê dîsa jî ode giştik di hundirê avahiyekê de ne ango ode giştik bi hevdu re têkîldar in. Êdî em werin ser Derrîda. Derrîda berî hertiştî xwe tim wekî feylesofekî dihesiband, bêguman jixwe feylesof e, lê di nivîsên Derrîda de edebiyat li her derê ye, navê wî û felsefeya edebiya wî 'Dekonstruktivîzm' bi hevdu re hatine lehîmkirin, ango bûne du perçeyên ji hevdu.
Ev felsefeya wî di serî de, bi edebiyatê ve têkîldar e. Di nivîsên xwe de gelek têgehên dijberî hevdu mîna Aqil/Xweza, Jin/Mêr, Eynî/Dîtir *(ê-a din),* Gotin/Nivîs, Hundir/Der, Jiyan/Mirin û Rûmet/Îxanet honandiye. Derrîda, Şêwaza ku heta niha rûniştehî a ku jê re dibêjin saziya ecêb edebiyat û a ku asayî tê hesibandin felsefeyê diguherîne, lê Derrîda tim dudilî dimîne, tûcarî ne edebiyatê terikandiye û ne jî felsefeyê terikandiye.
A ku Dekonstruktivîzma Derrîda mijûl dike, tiştê ku derveyî wê/î ye an jî ê/a din e. Derrîda di Dekonstruktivîzmê de yên ku tên derveyîkirin welew dibin yeke din, dixwaze jê re cihokekê veke. Loma jî Derrîda bo ku cihokekê vebike, xwe di qelîştekên an jî di derzên sazîbûna re radike. Lewma felsefeya Dekonstruktivîzmê bi awayekî din dîsa Dekonstruktivîzmê diqerîne. Bi hêsanî jî em dikarin bêjin ev ne helwesteke xerakirinê ye û ne jî li hemberî felsefeyê ye. Berovajî wê rêyekê ji felsefeya din re vedike, welew a ku ne felsefe ye, jê re rêyekê ava dike.
Li gorî Derrîda edebiyat; paradigmaya ewilî weke holeke cûda dibîne, dibêje di destpêkê de, ango di serî de felsefe edebiyatê derdixe derveyî xwe, loma jî derveyî felsefê ê/a din edebiyat, li

hemberî felsefê û têgehên wê Heqîqet/Sewirandin û Lîteral/Fîguratîfê dameziriye, Derrîda him di edebiyatê de têgeheke nû pêktîne, him jî di felsefeyê de 'edeb'ê dixe cihekî bingehîn, ango di hemêza felsefeyê de dihone, bi vî hawî xwe dide tinasekirin, felsefeyê bi Dekonstruktivîzmê xera dike welew binyada wê hildiweşîne, dihejîne. Lê Derrîda dibêje min tucarî edebiyat û felsefeyê, li bin guhê hevdu nexistin, yanê min felsefeyê danexistiye asta edebiyatê.

Heke felsefe vepirsîna ziman û zanyariyê be, heman tişt bo edebiyat û ezmûngeriya zimanê edebiyatê jî derbasdar e. Him edebiyat û him jî felsefe zorê dide a negengazî. Derrîda dibêje ku ji berê ve, aniha û hêna jî xeyaleke min î nivîsê heye, ev xeyala min ji berê bêtir bêhêvî ye, di hundirê cuherê vê xeyala nivîsê de ne edebiyat ne jî felsefe gerek hebe, helbet ez tenê vêya xeyal nakim. Bi gotineke din a Derrîda; saziyeke berî wê tune û neafirî ango–xewneke berî sazîbûna saziyekê- Gerek berî vê sazî tu sazî darneketibin, ango saziyeke wenî gerek tunebe, û wiha axaftina xwe berdewam dike: him di edebiyatê û him jî di felsefeyê de, lêkolîpirsînên xwe li ser têgehên nivîsên pergalîk ên ku heyî *(mevcût)*, mimesîs, teolojî û nimandin hwd vedipirsîne.

Derrîda derveyî felsefe û edebiyatê ango li qiraxa wê, belam ne ji wê dûr û ne jî nêzî wê,yanê ne tam edebiyat, ne tam felsefe bi gotina Derrîda 'performansên performatîf.' Derrîda di cihoka navbera felsefê û edebiyatê de li rêyekê digere, divê him di navbera wan de têkiliyeke cihoka wan hebe, him jî ewqasî cihokê wan jihevdu dûr bin. Ango him saziyeke nû, him jî têkîldarî edebiyatê û felsefeyê be. Wekî Richard Beardsworth dibêje ku Derrîda dixwaze di navbera felsefe û edebiyatê de valahiyekê *(uzameke)* nû veke, di pêvajoya metnan de, di navbera rasteqîniyê û honakan *(badekan)* de, di navbera dirôkê û nîgaş *(hêmayan)* de, asta cudahiyên kevneşopî derbas dike, holeke nû û lêkonerî vedike. Çawa ku Derrida Gotin (Nivîs) bi hêsanî serobino nekiribe, bi heman teknîkê dixwaze di felsefe û edebiyatê de jî wilo pratîze bike. Lê ev nayê mahneya mudaxeleya felsefeyê.

Li gorî Derrîda nivîs him li hemberî metafizîkê xweragirî dike, him jî li ber bayê wê dikeve. Loma jî di bin bandora a heyî *(mevcûta)* îluzyonê dikeve û nivîs vediguhere gotinê: Nivîskarek di kitêbekê de tune ye, encax nivîs vê tunebûnê tim werdigerîne hebûnê, tim bo tevahiyekê diqîre. Jixwe nivîs, koka nivîsê û veşartina kokê ye, dema ku nivîs ji koka xwe vediqete, nivîs li dû şopa vê kokê ye. Wê çaxê Ontolojî û ziman tevlîhevbûneke uzamî ye, ev uzam jî nivîsa uzamê ye. Edebiyat jî vê potansîyela ziman û ontolojiyê derdixe holê, edebiyat zimanekî pirhêlî ye.
Derrîda wenî angaşt dike ku felsefe celebeke nivîsî ye û bi vî hawî guhê Paul Valery diolandîne. Paul Valery dibêje felsefe ji ber ku berhemeke nivîsî ye, loma jî bi awayekî bireser guliyekî edebiyatê ye. Ji ber vê yekê jî felsefe ne pirr dûrî helbestê ye, divê em gengaz dimînin ku bicîbikin. Derrîda jî dibêje felsefe di pêvajoya dîrokê de destpêka fikirandina helbestê ye. Wextê ku Derrîda vî tiştî dibêje qala enerjiyên asê dike, qala enerjiyên edebî ên di bin tehdeya felsefeyê de ye, ango felsefe enerjiyên edebî û enerjiyên asê di bin tehdebûna xwe de dihêle, wê çaxê felsefe dikeve bin tesîra edebiyatê û metaforan bikartîne û di bin bandora estetîka edebiyatê de dimîne ew çax statuya xwe ya edebî jî wenda nake.
Derrîda di derheqê ‘Heqîqetê’ de hêmayeke navdar a Nietzsche deng vedidîne: Heqîqet çi ye? Artêşa etarên metaforan, metanomiyan antropomorfizman e, pişre jî bi awayekî helbestî û retorîk xemilandine, mezinkirine û veguheztin e, heqîqet piştî şixulandinek demeke dirêj vediguhere kanoneke hişk, a ku girêdayî yekitiya têkiliyên însên ên netewî.
Heqîqet jibîrkirina îluzyonên îluzyona ye. Heqîqet metaforên firidî ye û hêzên vehesînên xwe wenda kiriye; êdî wêneyên li ser dirav jê çû ye, êdî ne dirav e, tenê alaveke ku hesinî ye.
Ev jî di felsefeyê de, ji azweriya yekwatebûnê dizê. Belam, metafor di serî de pirhejmar e. Di Derrîda de, metafor bo ku ji hêla felsefeyê ê/a din cihekî veke, ango lêgerîna hêla felsefeyê a din jî edebiyat. Derrîda hela felsefeyê a ku edebiyate derdixe holê, jixwe Derrîda felsefeyê wekî celebeke edebî dixwîne, nivîsên felsefeyê

him zanyarîtî û him jî performatîf e. Têkiliya nivîsên felsefeyê bi metnên din yên heterojen re heye, di avakirina van metnan de xwedîrol e. Derrîda nivîsê, ne tenê pêvajoya mijara felsefeyê yan jî alava fikrê, di heman demê de pragma, pragsîs, çalakî û bi dîtineke têgihiştina şêweyek performansî nederbasdarkiriye. Dijberiya di navbera heqîqet û rastnivîsa edebî binyada wê xerakiriye ango hilweşandiye. Di dîroka metafizîka rojavayê de ji serî de li dijberî sewirandina honakê ye, ango sewirandina heqîqeta felsefeyê, dijberî honakê ye. Li gor vê ferasetê heqîqet û honak hene. Belam Derrîda, wêdetirî heqîqeta felsefeyê, ango wêdetirî rasteqîn *(honak)* û rastî/xeletiyê digere.

Loma jî bi sewirandineke azwerî dijberiya xwerû a di navbera heqîqeta ewilîbûna felsefe û honaka edebî, dekonstruktîze dike, binyada wê hildiweşîne. Derrîda dibêje gerek ezmûna edebiyatê berê me bi heqîqeta sînorên têgehan veke, û derfeteke wilo binasîne: 'Heqîqeteke a heqîqeta din' ewcax çima werê mîsyoneke giranbûha dide ser milê edebiyatê, edebiyat çi ye?

Tucarî bersiveke têrkirî nehate bersivandin, wekî Attridge diyar dike; ev pirs piştî Platon û Arîsto şûnde di dîroka rojava de tim hatiye vepirsîn. Lê berî her tiştî ev ne pirseke edebî ye, pirseke felsefî ye. Loma jî edebiyat çi ye bi pirseke wenî erzan an jî ji rêzê nayê famkirin. Her çiqas edebiyat zaqonên Platon vepirsî be jî û xwestiye ji cî bileqîne, lê heta Malllerme jî ev pêknehatiye. Di xwendinên Derrîda de zagonên leyistikên *(şanoyên)* Mallerme û zagonên Platon û Arîsto tên binpêkirin. Derrîda wateyê, gotinê û navê ku piştgiriyê dide felsefeyê yên ku bi rêzikên retorîk, zimanê şixulandina kevneşopî û ji girêdayînên zagonên nimanî vediqetîne. Metnên Mallerme têmakirin û şêwazekirinê nake, dramatîze dike. Lê ji veqetandina qeware *(qalibên)* metafizîkî nayê wê wateyê ku ji zagonên metafizîkê veqetiyaye.

Nexwe pêkhatinên zagonên nû heman pirsgirêkê di xwe dihewîne, loma jî derrîda wiha dibêje; heke Mallerme nîşaneke qetandinê be, hêna jî neqetandine, dubarekirineke û vê çalakiya duhêlî mentiqek nû bi xwe re tîne, ango keşifkirina mentiqa nû ye.

Ji ber vê yekê jî Derrîda, Mallerme dixwîne metnên wî şîrove dike û vê duhêlîya wî a çalakî berovajî dike, bi gotineke din serobino dike, ji hev dixe, a ku pêvajoya heqîqetê re birêxistî dike, têgeha mîmesîsê bi telmîh *(xirpxîrpandinê)* serobino dike.
Derrîda dibêje ku; dixwaze bila heqîqeta felsefeyê welew hêmayên *(badekên)* edebiyatê be, talî Derrîda berê xwe bi secereya *(nijada)* koka wan vedike. Bi kurtasî Derrîda him edebiyatvanek e û him jî feylesofek e, lê herçiqas wekî feylosof xuya bibejî bêtir edebiyatvanekî qerrase dixuye û meyla wî li ser edebiyatê zêde xuya dibe, jixwe bizava wî ya nû mîna estetika *(spehitiya)* Pablo Pîcasso a ku rûneştehî ango a ku heyî serobino kiriye.
Pablo Pîcasso jî di bizava kubîzma xwe de estetîkê serobino kir, ango hemû estetîk deforme û stîlîze dikir û derdiket derveyî estetîka heyî, demêg edebiyat, huner, mîtos, psîkanalîzm, ramyarî, mîmarî, endezyarî û felsefe, giştik bi hevdu girêdayî ne.
Bi gotineke din vana her yek gulîyekî darê ne, lê talî giştik li ser koka darê hildikişin jor, belam a ku ji giştikî pirtir di dava xwe de xwedî dike, di qeneata min de edebiyat e. Jiber ku edebiyat bêtir pirhêlî ye. Mînak di romanên leystikên û helbestên van nivîskar, şanoger û helbestvanan de: Samul Beckett, Proust, Fernando Pessoa, Shakespeare, Dante, voltaîre, Geothe, Melayê Cizirî, Feqiyê Teyran, Babe Tahirê Uryan û Xanî û hwd de rengên felsefe û edebiyatê di xwede xwedî dikin. Mînak gava em hin gotarên Samuel dixwînin tim feylesofek derdikeve pêşiya me, welew yên Proust de jî wilo ne, ewcax gava ku navê van feylesofan an jî gotinên wan di nava metnê xwe de honandibe, tu bi felsefeyê nizanibî yan jî têkiliya te bi felsefeyê re tunebe, tu dê çawa metnê binirxîne, rexne û şîrove bikî, helbet bi têgihiştinê belkî heta radeyekê meriv xwe bigihêjîne, lê tim ew ê kêm bimîne. Loma jî bo famkirina, rexnekirin, nirxandina û şîrovekirina pirhêl ya edebiyatê, divê em bi felsefeya zanistî û ramanî bizanibin, wekî me got ew jî stûnekî avahiyê ye, şaxekî darê ye. Ez ê piçekî jî qala Feqiyê Teyran, Melayê Cizirî, Xanî û Babe Tahirê Uryan bikim. Helbet di helbestên wan de ez ê li ser têgehên wan yên giring

bisekinim. Jixwe di têgehên wan yên girîng de ango ên taybet de huner, mîtos, felsefe, edebiyat, nûranî û psîkanlîzm jî hene. Belam hema tenê wilo di ser de ez ê qala wan bikim.
Wekî em dizanin ku çawa Thalesê feylesofê grekî li ser xwezayê rawestiyaye, Feqiyê Teyran jî wilo li ser xwezayê rawestiyaye, herdu jî feylesofên xwezayê ne û bi feresata felsefeya xwe, li ser hêmana *(têgaha)* 'av'ê rawestiya ne û dibêjin ku kana *(çavkaniya)* hertiştî av e û ji avê dizên. Lê Feqî helbestvan e jî, helbesta xwe jî li ser bingeha xwezayê diafirîne.
Li cem Melayê Cizîrî jî hêmana 'Agir' gellekî girîng e, ew jî li xwezayê vedikole. Ehmedê Xanî jî wêjekar û feylesofek î pirhêl e. Ji ber ku di berhema wî ya 'Mem û Zîn'ê de kevneşopî, eşq û hwd gelekî cî girtine, helbet ew him helbestvan, edebiyatvan û xwedaparêzên entelektûel in. Babe Tahirê Uryan jî bavê helbestê, bavê helbesta eşqê ye. Helbet meriv dikare gelek tiştên din jî bibêje, lê min xwest bi kurtasî be jî ez qala têkiliya edebiyat û felsefeyê bikim. Heke em têkevin kitekitan, ne dawî tê û ne binî xuya dibe, ango mîna behrê ye.

**Çorê Arda**
20.08.2015

**Sûdegirtin: '**Kirinên Edebiyatê, Nivîskar û Feylesof: Jacques Derrîda, Weşanên Otonom, Werger: Mukadder Erkan û Alî Utku'

## Çanda Kurdî Bi Serê Xwe Felsefeyeke Jiyanê Ye

Pirs ev bû: 'Pêdiviya me, çima bi felsefeyê heye?' lê dibe rasttir be ku em wiha bipirsin 'Pêdivîya me bi kîjan felsefeyê heye?' Anku ji bo vî gelî bindest, bi taybetî di hêla raman û helwestê de çi divê? Gelo rêyên felatê çi ne û ji bo felata vî gelî, me çi divê? Em ê di vê kurtenivîsê de, li bersîvên van pirsan bigerin.

Bi ya min, felsefe zanista lêgerîna heqîqetê ye. Heqîqeta me kurdan jî welatê me ye. Çanda me, dîroka me û zimanê me ye. Şaristanîyek herî kêm 5 hezar salî, bi hemû şaxên xwe ve divê dîsa di warê xwe de bê dîtin. Lewre wekî ku em dizanin, tiştên windabûyî, divê cihê ku li wira hatine wendakirin, wiha jî li wira bên peydakirin. Hêjayî gotinêye ku zimanê kurdî, çand û erdnigarîya Kurdistanê laboratûarên zindî ne û tevî astengî, zordestî, qedexekirin û bişaftinan, dîsa jî weke rojê diberiqin û ji bo avakirina pêşerojê, bingehên gelê me ên sereke ne.

Çanda kurdî, bi gelek şaxan ve ji çandên gelên din yên dinyayê cûda dibe. Mînak; peyv û têgeha 'BEXT'... Kesên ku wateya 'bext'ê baş dizanin, dikarin bi hêsanî bibêjin ku ev têgeh bi sere xwe felsefeyek e. A ku, taybetmendîyeka çanda kurdî ye. Û ji bilî kurdan, di çanda kêm netewan de heye û belkî tine be jî.

Bext peymanek nenivîsandî ye, rûmet e, xwedîderketin û parastina wî, nirxa herî giring e. Dema bext bê dayîn, her tişt betal dibe, neyartî, nexêrxwazî, fesadî û hwd… Ti qanûn tine ye, lê 'bext' heye. Û ti gotin an ferman nikare wê betal bike. Û kesên 'BÊBEXT' jî kesên herî beredayî û bêrêz in. Ev e, felsefeya me a sereke. Me ev divê di serî de…!

Di van rojên dîrokî de, pêdivîya me di serî de bi yekitiyê heye. Wek gel, wek milet, wek netew û wek kesên xwedîrumet. Pêdîvîya me bi 'Bextdayînek' nû heye.

Divê em wek gel berê xwe bidin zimanê xwe, dîroka xwe, çanda xwe û sedemên hebûna xwe. Tiştên ku pêdiviya me bi wan hene, hemû di 'laboratûarên zindî' de veşartî ne.
Mesele ew e ku mirov li eslê xwe vegere, lêbigere û heqîqet li wira bibîne. Dersên dîrokê xweş bixwîne, pêşgotin û zargotinan baş têbigîhîje û û felsefeyek taybet bi navê 'felsefeya kurdî' biafrîne.
A ku heye û li benda me ye. Felat li wira ye.

Ma ne, çiyayê helbesta kurdî mamoste Berken Bereh dibêje:
***Hê ku tu akterekî li vê şanoya derew***
***Em vegerin li rastiya xwe***
***Li sîrîk û soryaz, li govend û kilama***
***Ji nû ve vejînin kelama serdemên kesk***

Serdemên kesk li benda mêrxas û jinxasên xwe ne.

**Murat Boran**
28.02.2016

## ‘Derheqê Dewleta Platonî de’

## Mahmut Ozçelîk

Dema mirov li ser têgeha dewletê dikeve nava lêgerînê berhema herî ewil ya ku tê hişê mirov, ‘Dewlet’ a fîlozofê Yûnanistana Antîk Platonî ye. Platon berî zayînê di navbera salên 427 û 347î de jiyaye. Di dema xwe de mirovekî bi qasî di pêşbaziya olîmpiyadê de bibe yekem çalak bûye. Ji ber firehiya navmilên xwe, jê re gotine ‘milfireh/Platon’. Wekî şagirtê Sokrates tê dîtin, dema Sokrates bi jehrê tê kûştin ji Atînayê dixeyîde û bi qasî dozdeh salan li hin welatên wekî Misir, Anatolî, Îtalya û hwd digere û dû re dîsa vedigere Atînayê, bi felsefeyê re bilî dibe û bi avakirina Akademiya Atînayê tê nasîn. (1)

Ev mirovê li ser zanist û felsefeyê gelek ked xerckiriye bi pirtûka xwe ‘Dewlet’ê xwestiye profîla dewleteke îdeal bide xuyakirin.

Pirtûka Platonî ya bi navê Dewletê ji deh beşan an jî bi navandina wî ji ‘deh pirtûkan’ pêk tê.

Di her beşê de qala mijarên cur bi cur dike. Ji bo fikrên xwe bi zelalî bide xuyakirin şêweyê diyalogê esas girtiye. Diyalog di navbera karakterê sereke Sokratesî û hin hevalên wî yên wekî Glaukon, Adeimantos, Palemarkhos û Trasymakhos de derbas dibe. Cihê sohbet û diyalogê li nêzî Atînayê mala Kephalos e. Nîqaşên di vê malê de bi damezrandina dewleteke xeyalî ya îdeal *(utopîk)* bi dawî dibe. Çimkî ew jî dizanin ku dewletek ewqas bêqisûr tenê dikare di xeyalan de pêk were. Lê dîsa jî hêviya wan ew e ku rojek ev utopya bibe rastiya welatê wan.

**Pirtûka Yekem:**

**‘Edalet; rindî û baqilî ye, bêedaletî jî xerabî û nezanî ye.’**

Di beşa yekem de, em dibînin ku Sokrates û hin mirov derheqê edalet û mirovê adil *(dadmend)* de di nava diyalogê de ne. Bi rastî mirov nizane gelo gotinên ji devê Sokratesî ve tê bilêvkirin fikrên wî yên resen in, an Platon bi gorî xeyalên xwe ew daye qisedandin. Ev rewş bi guman be jî mirov dîsa bi saya van diyalogan derheqê edalet, dewlet, rêveberî, qencî û xerabiyan de

digihêje gelek agahiyan. Di pirtûka yekem de li ser edaletê *(rastiyê)* lêgerînek heye û di dawiya nîqaşê de ev encam dertê holê: 'Edalet ew tişt e ku bi kêrî yê bi hêz tê.' Di civakê de rêveberî di destê kê de be yê bi hêz jî ew e û her rêveberî jî zagonên xwe li gorî bi kêrî xwe were, amade dike. Ev rêveberî hez dike qiraltî be, hez dike bila demokrasî be, rêgez naguhere. Rêveber zagonên ku bi kêrî xwe were, derdixe û bi bindestan jî dide bawerkirin ku ev zagon bi kêrî wan jî tê; ger çîna bindest zagonan nepejirîne jî wan wekî kesên ji edalet û rastiyê dûr ketine dide nasandin û wan bi hin cezayan re rû bir û dihêle.'

*'Edalet; rindî û baqilî ye, bêedaletî jî xerabî û nezanî ye.' Kesên bi edalet tevdigerin, dibe ku hin caran xisarê bibînin û windahiyên wan çêbibe û yên bêedalet tevdigerin jî dibe ku feydeyên demdemî bi dest bixin; lê di dawiyê de yên serkeftî dîsa jî alîgirên edaletê ne. Kesên dadwer bi mirovan re di nava lihevhatinê de ne û bi dostanî dijîn, bextewer in; lê yên bêedalet tevdigerin jî mirovên bêaqûbet in, hêrs û pêvçûnan di navbera mirovan de diafirînin û nahêlin mirov bi hevdu re di nava ahengê de bijîn û bixebitin.*

**Pirtûka Duyem**

**'Gelo bi rastî avzêya edaletê bêhêziya mirovan e?'**

Di vê beşê de nîqaş di navbera Sokratesî û Glaukon de berdewam e. Dîsa raseriya edaletê ya ji bêedaletiyê tê nîqaşkirin. Qala tiştên jixweber qenc û baş yên mîna dilşadî û kêfxweşiyê, tê kirin. Hin tiştên ku encamên qenc bi xwe re tînin; yên wekî dilpakî, baqilî û tenduristî rê vedike ku edalet pêk were.

*Di vê pirtûkê de Glaukon qala çîroka avzêya edaletê dike: 'Ji ber ku mirov hem nikare bi tena serê xwe neheqiyên li hemberî xwe tê kirin asteng bike û hem jî hêza wî ya her tim li mirovên din neheqiyê bike tune ye, rabûne di nava hev de peyman çêkirine, zagon kifş kirine, bi saya van zagonan (peymanan) dê ne tûşî neheqiyan bibe, ne jî li kesî neheqiyan bike, ji ber vê bêhêziya xwe, xwestiye hin zagon hebe da ku wî*

*ji xerabiyan biparêze û ev jî di pêvajoyê de wekî edalet hatiye binavkirin. Bi gotineke din avzêya edaletê bêhêziya mirovan e. Ger hêza mirovan ya herdem neheqîkirinê hebûya dê tu carî ji bo jiholêrakirina neheqiyan bi mirovên din re peyman mohr nekira. Çimkî her mirovê ku fersenda neheqîkirinê bibîne dê neheqiyê bike.'*

*Di vê angaşta Glaukon de birayê wî Adeimmantos jî tevlî nîqaşê dibe û wiha dibêje: 'Mirov ancax ji ber tirsonekî, extiyarîtî an jî kêmasiyeke xwe ya din nikare bêedaletiyê bike, wê wekî tiştek nebaş dibîne. Ger ji bo neheqîkirinê derfetek ji bo van mirovan çêbibe dê wê derfetê hetanî dawiyê bikar bînin.'*

Li gorî vegotina Sokrates civak ji bêhêziya mirovan welidiye. Ji ber ku mirov bi tena serê xwe nikare hemû pêdiviyên ku wî li ser lingan dihêle pêk bîne, pêwîstî bi alîkarîya mirovên din dîtiye û hêza xwe kirine yek û li jiyanê mane. Bi vê pêwîstiya mirovan û hatina wan ya cem hevdu re jî pergala civakê derketiye holê. Her mirovek li gor şarezayî û hunera xwe ji bo civakê di karê ku xêr û bêra wî zêdeye de xebitiye: Pêdiviyên sereke yên wekî xwarin, stargeh, cil û bergan kiriye ku hilberînên ewilîn bi vana re têkildar be. Bi vî awayî di nava mirovan de karbeşî û hevparî çêbûye. Her mirov dê di nava aştî û tenduristiyê de emrê xwe bibihurîne û bimire, piştî mirina wan; zarokên wan jî dê heman jiyanê bidomînin. Ji bo vê civaka di nava boşahiyê de êdî pirsa divê civak çawa bi hev re vê jiyanê bidomîne dertê holê û ev jî 'mekanîzmaya dewlet û edaletê' derdixe pêşberî me. Lê ji ber çavbirçîtiya mirovan, ew civaka di destpêkê de tenê ji bo pêdiviyên xwe yên jêneger dixebitî, ji rê averê dibe û civak her diçe ber bi xerabiyê ve diçe: Pêdiviyên nehewce bi xwe re gelek kar û pîşeyên nû derdixe holê, ax a ku berê têra mirovan dikir dê êdî têr neke û ji bo zevî û erdên nû dê bi cîranan re pevçûn dest pê bike û ev jî bibe egera şerên mezin û bêdawî. Bi mezinbûn û berfırehbûna civakê re hem ji bo parastina wê, hem jî ji bo ax û erdên nû bi dest bixe, pêwîstiya artêşê jî dertê holê.  Artêş jî dê ji mirovên hêç û har, çeleng û bihêz

pêk were. Ev mirovên hêç û har ne tenê li hember dijmin, her weha dê li hember mirovên xwe jî bi xedarî tevbigerin û hevsengiya edaletê her binpê bikin. Encam jî dibe civakeke xerabûyî ya ji bêedaletiyan re rê vekiriye. Û şer wekî tişteke avzêya hemû xerabiyan, ji hêrsa daxwaza ji mirovên din zêdetir bidestxistina mal û milkan diwelide. Û rizîna civaka xwezayî dest pê dike. Li hemberî vê rizînê pêwîstî bi perwerdehiyek baş a ji bo zarok û ciwanan, dertê holê û Sokrates balê dikişîne bi ser vê mijara perwerdehiyê ve. Venêrîna çîrvanokbêjan pêşniyar dike. Ji çîrvanokan re divê tixûbek hebe. Çîrokên ku kîn û nefretê belav dike divê were qedexekirin, ji zarokan re neyê vegotin. Divê gotinên ku zarok ewilîn dibihîsin çîrvanokên xweş yên riya qenciyê ravî wan dike, be. Çîrokên ku xwedayan wekî sedema xerabiyan dide zanîn divê ji zarok û ciwanan dûr be. Çimkî xweda sedema her tiştî nîne, tenê sedema tiştên qenc e.

**Pirtûka Sêyem:**

**'Divê bi tu awayî teqlîda mirovên tirsonek, xerab, dijûnker, serxweş û dînikan neyê kirin.'**

Sokrates qala perwerdehiyek baş dike ku divê di vê perwerdehiyê de rêgeza hurmetê ya ji bo xwedayan, ji bo dê û bavan, hebe. Li bajarekî/welatekî tenê mirovên biçûk û karker ne, rewşenbîr û kesên ku xwedî payeyên berz jî ger serî li hekîm û dadgeran bide, ev tê wê maneyê ku li wî bajarî perwerdehiyek pir xerab heye, divê rê li ber vê yekê were girtin. Ev jî ancax ji biçûkatiyê ve bi destpêkirina perwerdehiyeke baş dikare were bi cih anîn. Derew û bertîl divê di dewletê de tune be. Derewkirin tenê ji bo feydeya dewletê dibe ku carinan çêbibe. Perwerdehî divê riya rindiyê, başiyê ravî mirovan bike. Çîrok û bûyerên reşbîn divê ji zarokan re neyên vegotin. Teqlîdkirina hêlên qenc yên mirovan ên wekî lehengî, baqilî û zanayiyê dibe ku feydedar be, lê divê bi tu awayî teqlîda mirovên tirsonek, xerab, dijûnker, serxweş û dînikan neyê kirin, çimkî teqlîda mirovên xerab û nebaş dê civakê jî ber bi xerabûnê ve dehf bide.

*Platonî rêgeza dewleta xwe wiha tîne ziman:*
*Divê mirovê welatê me tenê yek karî/pîşeyî bike û di wî karî de bibe şareza: Divê di dewleta ku em dê wê damezrînin de solker solker be. Solker li gel solkeriyê nikare kaptaniyê jî bike. Cotkar cotkar e. Li gel cotkariyê nikare dadgeriyê jî bike. Leşker leşker e. Nikare hem leşkeriyê bike û hem jî alûvêrê bike.'*

Bi vê vegotinê Sokrates dixwaze ku her mirov tenê bi karê xwe re bilî be, nekeve cur bi cur dilqan û texlîda her kesî neke, tenê dê tiştên bi kêrî zarok û ciwanan tê bike. Li vir em dibînin ku pirhêliya mirovan tê qedexekirin û tenê karek *(pîşeyek)* jê re tê terxankirin. Di dewleta Platonî de cihek girîng ji hekîm û dadgeran re tê terxankirin. Hekîm bi 'hiş û aqilê' xwe nexweşiyên bedenî pak dike, lê kesê ku bedena wî êdî xerab bûyî, tedawiya wî ne ji bo wî ne jî ji bo civaka wî sûdewer be, bi mirinê re rû bi rû tê hiştin. Ev raman karlêka xwe li ser Hîtlerî jî kiriye ku di pirtûka xwe ya bi navê 'Şerê Min' de ji bo miletekî bi tendurist û bedew dixwest mirovên nexweş û xerab ji civakê were bêjingkirin û arasteyî mirinê bibin.
Platonî derheqê muzîkê de jî hin qedexeyan datîne: Cureyên muzîka ku girîvekirinê, jankêşiyê û xemgîniyê zêde dike, divê neyê pêşkêşkirin. Li hemberî vê rewşa trajîk divê meqamên, mirovan bi jiyanê ve girê dide, li hember mirin û birînan, şer, êriş û zorê hêviyê dide mirovan, were pejirandin. Li hêla din di dema aştiyê de jî divê meqamên nerm yên bi jiyana rojane re lihevkirî hebe. Çimkî hêviya Platonî ew e ku cihê muzîk mirov bibiyê hezkirina bedewiyê ye. Li gor Platonî mirovê xwedîtiyê li bedena xwe bike, hay ji xwarin û vexwarina xwe hebe û bedenparêziyê *(perwerdehiya bedenê)* bike û ruhê xwe bi muzîkê dagire, dê bibe xwedî hezkirina zanist û felsefeyê û bi vê jî dê civakeke pêşketî pêk bê, bi saya perwerdehiya bi aheng ya ji jîmnastîk û muzikê pêk tê dê 'mirovê hem baqil û hem leheng' bigihêjin, ger ne wiha be wê çaxê jî mirovê 'tirsonek û çors' dê bigihêjin. Platon derheqê

desthilatdaran de jî Sokrates dide qisedanê û wesfê rêveberê dewletê tîne ziman: Divê kesê ku dewletê îdare bikin ji zaroktiya xwe hetanî ciwanî û kalitiya xwe di her merheleyê de werin şopandin, di 'ezmûnên tirs û zewqan' re werin derbaskirin û her tiştê wan kirine were zanîn û yên di hemû ezmûn û ceribînên xwe de tenê mifaya xwe û dewletê esas girtine, jê hin bibin notirvan *(leşkerê welat),* jê hin jî bibin desthilatdar.
Kesên dibin desthilatdar divê êdî extiyar û xwedî tecrûbeyên jiyanê bin û dema bûn desthilatdar jî ji bo bi pey mal û milkê dinyayê nekevin, divê xwedîtiya wan ya li mal û milkan were qedexekirin. Xanî û erd û zeviyên wan divê tune be.
Rêveberên dewletê li hemberî xebata xwe ya desthilatdariyê dê pêdivî û xurekên xwe bi dest bixin, bi hevparî jî bixeritînin û hemû lêçûnên wan, xurek û xaniyên wan hevpar be.
Çimkî gava ew jî bibin xwediyê erd, xanî û dirav, zarok û jinan dê dev ji rêveberiya dewletê berdin û di dêvla ku parêzeriya *(koruyuculuk)* dewlet û welatiyan bikin, wê bi welatiyan re ji bo malê dinyayê têkevin qirika hevdu.

**Pirtûka Çarem:**

**Nirxên Dewletê; zanatî, lehengî, dadwerî û pîvanî**

Di vê beşê de armanca dewletê tê vegotin ku ji bo hemû welatiyan dabînkirina bextewariyê ye. Ev armanc jî ancax bi saya pêkanîna hin nirxan pêkan e. Di vê beşê de xala herî balkêş kifşkirina nirxên dewletê ye. Ji bo dewletekê ya pêwîst ev nirx in ku Sokrates wan wiha rêz dike: Zanatî, lehengî, edalet û pîvanî. Divê zanatî bi riya komek biçûk ya ku dewletê bi rê ve dibe, xwe bide der. Ev zanatiya dewletê divê ne ku mîna zanatiya cotkarekî teng be. Ger wisa be dewlet dê tenê bibe cotkarekî baş. Ev zanatiya dewletê divê ji bo parastina berjewendiyên hemû civakê bê bikaranîn û di têkiliyên bi dewletên din re civakê biparêze. Navê vê zanatiyê jî dibe 'zanatiya parêzgerî/koruyucu bilgelik.'
Lehengî jî bi saya perwerdehiya şervanên ku bi muzîk û jîmnastîkê tê bihêzkirin dê pêk were. Leheng dê li gor zagonan

bizanibe ji çi bitirse û ji çi netirse. Lehengî ji bo parastina welat e û divê leheng tirs çiye nizanibe. Pîvan jî tevgerîna endamên civakê ya bi ahengî îfade dike. Rêlibergirtina daxwaz û azweriyên mirovan yên pir zêde ye. Di kesayeta her mirovî de sê hêl hene: Aqil, hêrsbûn û xwestek. Bi saya aqil mirov gemê li xwestekên zêdetir dixe û dixwaze ew bi pîvan tevbigerin. Çawa hêlên qenc û xerab yên mirovan hene, wisa jî di karakterên dewletan de jî hêlên qenc û xerab hene û li gor 'rêgeza pîvanê' divê hêla qenc ya dewlet û civakê tim serweriyê li hêla xerab ya dewlet û civakê bike û ahengek aramiyê pêk bîne. Divê dewlet serweriyê li zewq û azweriyên xwe yên bêteşe bike û nehêle civak ber bi xerabiyan ve here. Dema ku her kes li gorî xulqiyeta xwe karê xwe bike û sparteka xwe bi cih bîne wê çaxê dadwerî/edalet jî jixweber dê pêk were. Kesayet çawa ku karê xwe dike, wisa jî divê mudaxelayî karê kesên din neke. Bi vî hawî edalet, bi xwedîlêderketina li heyînên xwe û bi pêkanîna karê xwe, dê jixweber pêk were.

*Platon bi vebêjiya Sokratesî civakê dike sê beş/tebeqe:*
*- Tebeqeya hunermendan*
*(kesên bi karê xwe re bilî, kesên diravan qezenc dikin, karker),*
*- Tebeqeya şervanan (notirvanên dewletê, leşker),*
*- Tebeqeya rêveberan.*

Li gor Platonî di karakterê her mirovî de jî ji van sê beşan diyarde hene: Aliyê me yê daxwazker ku dixwaze her tiştî bi dest bixe; aliyê me yê hêrsker ku li hember bêedaletî û neheqiyan serî hildide û aliyê me yê van herdu beşan digire bin baskê xwe û erka rêveberiyê werdigire û tevgerîna bi pîvan pêk tîne, aqil. Ev jî tê wê wateyê ku 'mirovê adil' bi saya ahenga van her sê beşên di hundirê mirovî de pêk tê, dertê holê. Li gor Platonî ji bo dewletekê xeteraya herî mezin ya hilweşînê ew e ku hin kes mudaxeleyî karê mirovên ne ji tebeqeya xwe ye dike, ye. Ev jî dê bibe sedema rûdana bêedaletiyan.

Divê ev mirovên ji tebeqeyên cur bi cur mudexeleyî karên hevdu nekin û tenê karê xwe bikin, bi saya vê ahenga her sê beşên civakê dê 'dewleta adil' pêk were. Yan na wê çaxê dê bêedaletî dest pê bike û di dawiyê de jî dê dewlet hilweşe.

**Pirtûka Pêncem:**
**'Ji bo dewletê qenciya herî mezin; hevpariya jin û zarokan e.'**
Di vê beşê de nîqaş li ser pirsgirêkên jin û zarokan heye. Pirsên wekî, piştî welidînê hetanî heyama perwerdehiyê dê zarok çawa werin gihîjtin? Zarok dê çawa werin perwerdekirin? tê kirin. Jin jî divê hem jîmnastikê, hem muzîkê hem jî bikaranîna çekan fêr bibe û siwariya hespan bielime. Lê dîsa li ser pirsa gelo dê jin karibe karê ku mêr pêk tîne bike? nîqaş xwe dide der. Li ser ciyawaziya di afirînê de ya ku di navbera jin û mêrî de rê li ber vedike ku karê li gor afirîna jinê jê re were dîtin. Di vê beşê de mijara herî balkêş di tebeqeya rêveberan de hevpariya jin û zarokan e. Em ji devê Sokratesî van hevokan dibihîsin: 'Jinê notirvanên me *(şervanên me)* di navbera hemûyan de dê hevpar be. Qet yek jî tenê bi mêrekî re dê rûnene. Dê zarok jî hevpar be. Bav lawê xwe, law jî wê bavê xwe nizanibe.'

Vê hevpariyê jî ji bo dewleta xwe wekî qenciya herî mezin dibîne. Jin û mêrên herî bijarte, di temenê ku tixûbê wê hatiye kifşkirin de, di bin venêriya dewletê de tên cem hevdu. Xanî û sifreyên wan jî dê hevpar be. Ji ber ku tu tiştekî taybet yê kesek tune ye, dê bi hevre bijîn. Jin ji bîst saliya xwe hetanî çilî, mêr jî ji bîst û pênc saliya xwe hetanî pêncî û pênc saliya xwe dikarin zarokan çêkin.
Ji bo têkiliya cinsî dewlet venêriyê dike, destûra wan dide ku herin cem hevdu û bi nîşan û bi rêûresma olî ev kirû pêk tê. Ji têkiliyên wan yên cinsî zarokên bijarte dê werin dinyayê. Piştî hatina zarokan ya dinyayê jî zarok ji dayikê tê veqetandin û radestî saziyek taybet ya dewletê tê kirin û li cihê wekî 'wargeha zarokan' de tê mezinkirin, bi şertê ku tu carî dê û bavê xwe nas neke. Ji vê

pê ve yên bê destûr zarokan bînin dê zarokên wan wekî pînc were wesfandin û ji civakê werin vederkirin.
Rêgezên di şeran de jî tê pêşniyazkirin: Divê piştî serkeftina di şerî de mirî neyê şêlandin *(tazîkirin).* Li ser vê mijarê di navbera Sokrates û Glaukon de diyalogek wiha derbas dibe: Li gorî te şêlandina miriyek çavbirçîtiyek kirêt nîn e? Di dijminiya bi cesedekî re alçaxiyeke dêlikî tune ye? Çimkî yê li hember êdî dijmin nîn e, bi xwe firiyaye, tenê qalibê wî yê di cengê de maye li meydana şer. Bi vê kirina xwe çi ciyawaziya wî dimîne ji cewrikê kûçik ku gava yek kevir davêjiyê, xwediyê kevir berdide û li pey kevir direve? Li gel vê divê rê bê dayîn ku dijmin termên miriyên xwe ji meydana şer rakin. Li aliyê din divê bi tu hawî mal, erd û zeviyên dijminan neyê şewitandin, tenê dexlên wê salê ji wan were girtin. Çimkî baş dizanin ku her şer piştî heyamekê bi aştiyek bi dawî dibe. Xweziya ew hovên ku bajêr û navçeyên me didan ber topbaranê, meytên mirovên me yên li meydana şer li dû zerîpoş û akrebên zirxî ve didan kaşkirin û meytê jinan di 'mesaneyê' de didan ber gulleyan hay ji vê rêgeza şerî ya ku Platonî du hezar û çar sed sal berî niha kifş kiriye hebûna û di qada şerî de hinek bi exlaqî tevbigeriyana.

Li gor Platon dewleta herî baş ew dewlete ku dişibe miroveke bi tenduristî dijî. Çawa ku dema tiliya mirovek diêşe beden û serî jî pê re vê janê hîs dike û ji ber êşa parçeyek laş hemû laşê mirov vê rewşê dijî, wisa jî divê dewlet qenc an xerab dema tiştek hat serê yekî ji welatiyên xwe, divê vê rewşê wekî ku li xwe qewimî be bibîne û bi vê re an kêfxweş bibe an jî derdmend bibe.
Di vir de erka dewletê 'tevahîparêzî' ye. Hembêzkirina hemû mirovan e. Di dewletek wiha de rind an xerab çi were serê welatiyan dewlet mîna ku ew hatibe serê wê dê bihesibîne û bi wê re an kêfxweş bibe an jî xemgîn bibe. Ji ber ku welatî rêveberên xwe wekî xelaskaran an jî parêzgeran dibîne.
Di nav ramanên Platon de ya herî balkêş ji bo rêveberiya dewletê pêşniyarkirina wî ya fîlozofan e.  Divê ev fîlozofên ku hêza dewlet

û hêza aqilî di xwe de civandine dewletê bi rê ve bibin û ji hemû pirsgirêkan safî bikin. Li gor wî di xwezayê de xwedê hin mirov ji bo fîlozofî û zilamtiya dewletê, hin mirov jî ji bo tişta ku jê re hatiye gotin bêyî ku bifikire pêkbîne, afirandiye. Ji ber vê yekê divê ji hêz û aqilê fîlozofan sûd were wergirtin.

**Pirtûka Şeşem:**
**'Ya ku zanist û rastiyê diwelidîne 'qencî' ye.'**
Sokrates, wesfê fîlozofan ku Platonî dixwest devletê ew bi rê ve bibin, wiha rêz dike:

*- Divê fîlozof karibe raman û agahiyan li hev bicivîne,*
*- Divê fîlozof xwedî meraqê be û baweriya wî bi zanistê re hebe,*
*- Divê fîlozof ji "tevahiya heyîyê" hez bike,*
*- Divê fîlozof di "dil û dev/gotinê" de guncaniyê û yekbûnê pêk bîne,*
*- Divê di xulqiyeta fîlozofî de hesta hezkirinê hebe,*
*- Divê fîlozof di dilê xwe de rezîlî û alçaxiyê nehewîne,*
*- Divê fîlozof ji bêpîvanî û çavbirçîtiyê dûr be,*
*- Divê fîlozof xwedî hefizeyek bi hêz û tendurist be,*
*- Divê fîlozof miroveke têgihîştî û ranerm/nazik be,*
*- Divê fîlozof di her şert û mercî de, di her cih û demî de girêdana xwe ya bi rastiyê re biparêze.*

Hezkirin û girêdana fîlozofan ya bi welat re divê bêguman be. Di perwerdehiya bedenî û hişî re, bên derbaskirin û di dema talûke û zewqan de helwestên wan were çavdêrîkirin û jê kesên wekî zêr di agir de hatibe ceribandin û li pey ceribandinê jî têrpaqij mabe bibin parêzgerên welat. Lê ev jî rastiyek jiyanê ye ku ev xisletên tê rêzkirin di civakê de dê di kêm kesî de bi tevahî hebin. Ev jî bi gor fikra Sokratesî di civakê de di nava hezar kesî de tenê di yekî de tê xuyakirin. Ji ber vê yekê fîlozof di her civakê de kêmar in. Û hêza wan a desthilatdariyê bi dest bixe jî pir kêm e. Hin fîlozofên heyî jî ji hêla desthilatdaran ve bi cur bi cur lîstikan tên xapandin û

desthilatdar wan dikin bin baskên xwe û ji bo armancên xwe yên kirêt bi kar tînin.

Ji bo kar û barê rêvebirina dewletê bi rêk û pêk bimeşe divê herî kêm fîlozof xwedî van xisletan bin. Çimkî kesê ku ne dostê rastiyê, egîdiyê û çavtêrîbûnê be dê tu kar û xebatê bi serkeftî pêk neyîne. Ger ne wiha be wê çaxê ew ên dewletê bi rê ve dibin ne fîlozof in, belkî 'fîlodoks' bin. Kesên ku rastî û xewn û xeyalan tevlîhev dikin û tenê bi xuyanga heyîyan re bilî dibin. Dê ev jî dewletê ber bi hilweşînê ve bibe.

*Platon girîngiya desthilatdariya fîlozofan wiha tîne ziman:*
*'Hetanî ku fîlozof rêveberiya dewletê bi dest nexin, ne derdên dewletê ne jî derdên welatiyan xelas dibe û ew dewleta ku me tesewir dikir jî tu carî pêk nayê.'*

Ber bi dawiya vê beşê Platon qala 'îdeaya qenciyê' dike: Li gor wî tişta ku rasteqîniyê dide wanekan û hêza zanînê dide hiş/serî îdeaya qenciyê ye. 'Zanist' û 'rastî' du têgehên nêzîkî hev in lê em wan wekî qenciyê bi nav bikin, dibe xeletî. Çimkî cihê qenciyê helbet li ser herduyan, pirr li jor e. Ya ku zanist û rastiyê diwelidîne ev qencî ye. Mijara zanista herî bilind 'qencî' ye, îdeaya qenciyê ye. Rastî, edalet û hemû nirxên din ger mirovan ber bi qenciyê ve bibe feydedar e. Ger mirov negihêje îdeaya qenciyê *(ramana qenciyê)* tiştên din yên fêrbûyî dê hemû bêfeyde be. Û pirsa gelo qencî çi ye pêşgarî mirovan dibe: Qencî gelo zewq e, zanayî ye an tiştek din e. Li gor Platonî hin tişt tên dîtin lê nayên têgihîştin *(fêhmkirin)* lê heçku îdea ne ew tên têgihîştin lê nayên dîtin. Ev raman bi me dide zanîn ku du dinya hene: Dinyaya ku em dibînin, dinyaya ku em têdigihîjin. Di dinyaya ku tê dîtin de her tişt xapînok in, ji ber vê yekê çavê ruh her li jêr e, lê di dinyaya têgihîştî de 'rastiya cewherî' heye, ji ber vê yekê çavê ruh her li jor e. Ev ew bilindahî ye ku qencî lê bicihbûyî. Qencî daxilî vê dinyaya têgihîştî *(ramanî)* ye.

**Pirtûka Heftem: ‘Şikefta bin erdê’**
Di vê beşê de qala perwerdehiyê tê kirin ku çiqas tiştek zor û zehmet e. Ciyawaziya dinyaya tê jiyîn û dinyaya rasteqîn bi çîroka ‘Şikefta Bin Erdê’ tê ravîkirin. Hin mirov di vê şikeftê de hene û ji zaroktiya xwe ve her di vê şikefta tarî de dest û ling girêdayî bi şiklekî ku nikaribin bilivin, rawestiyane. Li pişt wan jî li bilindahiyek ronahiya agirekî diteyîse. Di navbera van mehkûm û agirî de jî riyek tîk heye. Di dirêjahiya vê riyê de jî dîwareke nizm heye. Li pişt vî dîwarî jî hin mirov di dest wan de hin kûklayên ku di şiklên mirov û heywanan de ne, dibin û tînin. Ji ber ku ev mehkûmanan tenê bi alîkariya roniya agir siyên wan kûklayan dibînin, vê rewşê wekî rastiyê têdigihêjin. Lê dema ji van mehkûman yek ji nav wan tê derxistin û ewilîn ber bi agir ve diçerixe fikrên wî hinek biguhere, bi çavek qemişîn li wanekên ku berê tenê siyên wan wekî rastî dizanîbû, dinihêre û hişê wî tevlihev dibe, lê herî dawî dema ji riya tîk a westîner xelas dibe û xwe digihîne tîrêjên rojê, wê çaxê pêrgî rastiyek din tê ku cardin çavê wî diqemişe. Û di dawiyê de digihêje wê fikrê ku ew tiştên di şikeftê de wekî rastî dizanîbû hemû çewt in.
Ji vê çîrokê pê ve perwerdehî ji bo dewleta Platonî cihek girîng digire: Di her ruhî de hêza hînbûnê û organeke ji bo vî karî xizmetê bike, heye. Û perwerdehî ew huner e ku vê hêza ruhî ber bi qenciyê ve diçerixîne. Ger dewlet dixebite ku welatiyên bijarte bigihîne, divê ji nav welatiyan yên herî berxwedêr, qehreman û yên bedew hilbijêre û wan di çend merheleyên perwerdehiyê re derbas bike: Jîmnastîk, muzîk, hunera şer, hesap û arîtmetîk, geomêtrî, stêrnasî, diyalektîk û hwd. Divê perwerdehî ne bi darê zorê be. Çimkî mirovê azad divê tu tiştî wekî koleyek neelime, ji xwe tiştê bi zorê bikeve hiş dê di hişî de nemîne. Perwerdehî divê ji bo zarokan wekî lîstikê be. Merheleyên perwerdeyê gelek in. Armanca wê jî zivirandina ruh ji tarîtiyê ber bi ronahiyê ve ye, berhêlîkirina ruh ya ber bi cihê ‘heyîya herî bextewer’ lê ye. Ger perwerdehiyek baş nebe rewşa mirovê nezan wê wekî rewşa xinzîrê ku di nava heriyê de digevize û jê kêfê werdigire, dê ji

nezaniya xwe kêfê werbigire. Ji ber vê yekê divê kesên jîr û zana di bîst saliya xwe de di seridandinê re derbas bibe, di sî saliya xwe de cardin di ezmûnan re bê ceribandin û piştî perwerdehiya gelek salan, di pêncî saliya xwe de êdî bi xurtî dipije, dikare bibe notirvan, parêzger/rêveberê dewletê. Di pêvajoya vê fêrbûnê de divê zarok û ciwan bi her hêlê ve were çavdêrîkirin û di pêncî saliyê de êdî yên ji her astengiyê xelas bûyî dê bibe rêveberê dewletê. Û ev ên bûne rêveber dewlemendên herî bijarte ne, lê ev dewlemendî ne dewlemendiya zêr û zîvan e, ev dewlemendiya aqil û erdemê *(dilpakiyê)* ye. Bi saya vê dewlemendiya aqil û erdemê jî dê dewlet bi 'felsefe'yê re lihevhatinek pêk bîne û fîlozofên dewletê bi rê ve dibin vê desthilatiya xwe wekî spartekekê bibînin. Yên kar û barê dewletê werdigirin divê bi tu awayî li pey şeref û şuhreta derewîn nekevin û tenê ji bo rindî û qenciya gel vê berpirsiyariyê wekî spartekekê bibînin. Bidestxistina desthilatiyê wekî azweriyekê nebîne, ger wisa be dê di dewletê de tu carî pevçûn û çavnebarî kêm nebe. Bi fêrbûna van unsûr û zanistan re mirovên bijarte yên dê dewletê bi rê ve bibin, bigihêjin heyîya rasteqîn ku wekî 'îdeaya qenciyê' tê zanîn. Bi vê fêrbûna van zanistan re dê ruh riya xwe ber bi 'heyîya herî bextewer' ve beralî bike û ber bi 'rastiya cewherî' ve bilind bibe û ya bibîne jî wê ne tiştek dişibe qenciyê, lê ew ê qencî bi xwe be.

**Pirtûka Heştem:**
**'Her cureyê dewletê mirovê dişibe xwe jî afirandiye'**

Ev beş dîsa bi bîrxistina ku divê ji bo bidestxistina dewleta herî qenc jin û zarok hevpar bin berdewam e. Pê re jî hevpariya perwerdehiyê tê xwestin û bi cureyê dewletên ne qenc berdewam dike. Di vir de ya balkêş ew e ku Platon dibêje çawa ku pênc cure dewlet heye her wisa jî pênc cure mirov heye. Her mirovek karakterê dewletekê temsîl dike. Her cureyê dewletê li gel xwe bi heman karakterî mirovê dişibe xwe jî afirandiye:

**Tîmokrasî/Dewleta Şerefê:** Di vê rêveberiyê de mirov li pey şan û şuhretê ye, çavên wî li meqamên bilind e, hêza xwe ji şer û

leşkeriyê digire. Mirov di vê rêveberiyê de bi pey zêr û zîvan, dewlemendî û diravberhevkirinê ketiye, ji hişê bi muzîkê hatiye bihêzkirin dûr e.

**Olîgarşî:** Di vê rêveberiyê de dewlemendî diyarker e. Dirav û saman berî her tiştî tê. Dewlemend ji bo hêj dewlemendtir bibe dixebite, kesên dewlemend welatiyan bi rê ve dibe û xizan ji rêveberiyê dûr e û şerê dewlemend û xizanan li dar e. Mal û milk kirîn an firotinê dike ku hin pir dewlemend bibin, hin jî pir feqîr bikevin. Mubtelatiya şan û şuhretê cihê xwe dide mubtelatiya pere û malê dinê. Û pê re jî parsekî, dizî, şêlandin û kujerên dest bi xwîn her derî dorpêç dike.

**Demokrasî:** Di vê rêveberiyê de rêbaya azadiyê heye, di xuyangê de pergala herî bedew e, cudahiyên cur bi cur hene, merdî û xweşbînî heye, wekhevî heye. Lê azadiya bê ser û ber dike ku mirov ji nirxên ku civakê li ser piyan digire, ji nirxên exlaqî dûr bikeve û civakê ber bi hilweşîneke xedar ve dehf bide ku navê wê zorbetî ye.

**Zorbetî/Zordestî:** Ev rêveberî ji demokrasiya pirole/pir zêde dertê. Ji ber ku welatiyê fêrî her cure azadiyê bûye gava pêrgî pêkutî an jî astengiyek herî biçûk jî tê hêrs dibe, serî hildide ev rewş jî demokrasiyê ber bi rêveberiya zorbetiyê ve dehf dide. Ji demokrasiyê pergalek koletiyê dertê. Zorbeyê ku dibîne her kes jê re bûye kole, êdî xwîna wan jî dimije. Zorbe, rojên ewil rûyê xwe yê zalim vedişêre, hêviyan belav dike, wekî mirovê herî merd û nerm dixuye, bi dijminê derve re şer dike, dû re vedigere her mirovê dilsoz, wêrek, baqil û xwedî hêz, ji holê radike. Tam berovajiyê paqijiya ku hekîm dike, pêk tîne: Hemû qencan bê bandor dike û xeraban li dora xwe dicivîne. Çiqas diravên di gencîneya dewletê de heye xerc dike û vedigere hebûn û dewlemendiya gel û xwînê di dev û pozê gel re tîne.

**Pirtûka Nehem: 'Dewleta herî neşad 'dewleta zorbetiyê' ye'**

Cureyê dewletan bi xwe re li gor taybetiyên xwe, ji civakê re an rindî, edalet û bextewariyê, an jî bêedaletî, xerabî û neşadiyê tîne.

Di tesewira dewleta Platonî de em dibînin ku dewleta herî guncan qiraliyet e ku ji civakê re jiyanek ji neheqî, xerabî û azweriyên têrnebûyî dûr waed dike û mirovê girêdayî xwe, di nava qencî û edaletê de bi bextewariyê xelat dike. Lê dewleta herî neşad û di nava xerabî, xizanî, birçîbûnî û neşadiyê de dijî jî 'pergala dewleta zorbetiyê' ye. Çimkî di vir de mirovê ji nirxên exlaqê dûr, mirovê nikare gemê li azweriyên di hundirê xwe de harbûyî bixe, dibe sedem ku mirovê vê civakê her di nava neheqî, bêedaletî û neşadiyê de bijî. Di vê beşê de jî qala cureyên xwestekên mirovan tê kirin ku jê hinek mecbûrîne -wekî xwarinê- jê hinek kêyfîne -mîna vexwarinên serxweşker, şahiyên ji tixûban der- hin jê jî xwestekên xerabûyînê ne - wekî evînên sexte- û bandora wan ya li ser civakê. Ji rê averêbûna mirovê ku bi pey xwestekên xwe yên têrbûnê nasnake ketiye, mirovê ku di bin bandora xwestekên xwe yên xerabûyî de maye ber bi zorbetiyê ve dihere. Di dawiyê de ne dê, ne bav ne jî welatê ku berê pîroz dihesiband ji bo wî êdî nayê tu wateyê. Her tişt ji bo xwestek û azweriyên wî yên têrbûnê nasnake tê xerckirin û di dawiyê de şêlandina gel dimîne û ji bo vê jî çi zilma pêwîst be dê li ser gel were meşandin.
Mirovê zorbe êdî ew xerabiyên berê tenê di xewnan de didît, pêkdianî aniha bênavber di dema şiyarbûna xwe de pêk tîne. Ji tu tawanbariyê, ji tu bênamûsiyê xwe nade paş. Dibe cinawirê gelê xwe. Bi pêkhatina rêveberiya zorbetiyê dewleta herî bedbext *(neşad)* derdikeve holê; dewleta koleyan. Li hember komikek biçûk ya di nava kêf û xweşiyê de tevdigere, piraniya gel ya ku di bin nîrê feqîriyê de dijî, heye. Tirs, birçîtiya bedenî û ruhî, girîvebûn, gotegot û gazindkirin li piraniya civakê serwer e.

*Platon li pey taybetiyên zorbetiyê vêca li ser sê cureyên mirovan agahiyên balkêş derpêşî me dike:*

**1-** *Mirovê li pey bidestxistina 'zanayiyan' e:*
*Zanayîperwer/hêla me ya li pey bidestxistina rastiyê ye. Ev hêla me ew hêl e ku nirxa hêrî kêm dide dirav û şeref û şuhretê. Mirov dikare wekî hêla me ya hezkirê zanist û ramanê bi nav bike.*

***2-** Mirovê ku li pey bidestxistina şan û şerefê ye:*
*Hezkirê nav û dengdayinê ye.*
***3-** Mirovê ku li pey bidestxistina dirav û qezenca zêde ye:*
*Hezkirê pereyan.*

Ji van her sê cureyê mirovan jê her yek riya xwe û armanca xwe ji yên din rasertir û rastir dibîne û li gor xwe ji jiyana xwe memnûn dixuye. Encamên van her sê cure xebatan jî zewqên cur bi cur bi mirovî dide tehmijandin. Lê ji vana tenê yek zewqa rasteqîn bi mirovî dide jiyandin, ew jî xebata li ser zanayiyan e: Zewqa zanatiyê. Çimkî tenê hezkirê raman û zanistê *(fîlozof)* dikare riya herî rast ya ramîn û fikirînê nîşanî mirovan bide. Û bi vê jî dê bigihêje bextewarî û qenciyê.  Heçku ên din in ew ne rasteqîn in, ne jî zelal in; ew ancax dikarin bibin siyên zewqa zanayiyê. Lewre ew zewqên derbasdar û xapînok in. Ya herî rast bi rêberiya hêla me ya xwedî zanayî û ramanan, têrkirina hêlên me yên din in ku di nava ahengek bi pîvan de bijîn.

**Pirtûka Dehem: Hunera Şibandinê**

Di vê beşê de qala hunera şibandinê tê kirin. Li gor Platonî karê ku hunermend dike ne karekî heqîqî ye, ew ancax dikare bibe karekî şibandinî. Bi mînakên şair û wênesazan vê angaşta xwe dide peyitandin. Mînak çawa ku wênesaz wêneyê objeyek çêdike, bi me wisa tê dîtin ku wî rastiyek xêz kiriye lê di esasê xwe de wî tenê karê şibandina objeyek kiriye ku ev jî ji rastiyê gelek dûr e. Wênesaz li vir tenê dikare bibe teşbîhvan. Homeros jî di nav de helbestvan û çîrokbêjên mezin tê rexnekirin ku hemû tiştên ku kirine ji rastiyê dûr in û bi van kirinên xwe yên sexte û texlîdî jî tu carî negihîjtine rastiyê. Mirov dikare ji bo wan bibêje teşbîhvan. Çimkî ew beyî ku derheqê tiştek esasî de xwedî agahiyan bin tişta ‘dişibe wê’ çêdikin û bi vê kiryara xwe jî rewşek xapînok diafirînin. Wekî wênesazek ku derheqê solkeriyê de tu tiştî nizane lê bi xêzkirina solên rengîn û xweşik rewşek xapînok diafirîne û dide bawerkirin ku ew derheqê solkeriyê de bi qasî solkerekî xwedî agahiyan e. Rastî û afirînerê gerdûnê tekane ye û ew jî

xweda bi xwe ye. Ji vê rastiya esasî wêdetir her karê tê kirin tenê kopiya vê rewşê ye, şibandina tiştên tê dîtin e, ne ku rastî bi xwe ye. Ber bi dawiya pirtûkê ve qala bêmiriniya ruh tê kirin. Platonî wisa difikire ku kesê xerabî dîtiye dê di welatê Hadesê/dojehê de cezayê xwe bikêşe. Her wiha kesê qencî kiriye û bi edalet tevgeriyaye jî dê xelata xwe bigire, cihê wî li bilindahiya ye û li bihuştê li nêzî xwedayan e.

**Mahmut Ozçelîk**
14.02.2016

**Çavkanî:**


**1.** https://tr.wikipedia.org/wiki/Platon
**2.** Platon; Devlet, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 1999

## LI SER QEDERÊ

Çawa ku tê salixkirin, ‘Zanîn’ *(Zanyarî)* encama kiryarên di navbera ‘Zana’ û ‘Zanbar’ *(Aşîkar, Diyar, Melûm)* de tê hesibandin. Di vê peywendiyê de pêşaneya ‘Zanîn’, ‘Zanbar’ e ne ‘Zana’ ye. ‘Zanîn’ hewceye ‘Zanbar’ e ne a ‘Zana’ ye. Ji bo ‘Zanîn’ derkeve holê pêwist e ‘Zanbar’ hebe. Dema kû ‘Zanbar’ hebe em dikarin bibêjin potansiyeleke ‘Zanînê’ dê hebe. ‘Zana’ tûnebejî ‘Zanbar’ herdem li cihê xwe amade ye. Lê dema kû ‘Zanbar’ tûnebe ne pêkan e ku ‘Zana’ tu carî bizanibe. Ku ‘Tu’ hebî dê ‘Ez’ê bizanibim. Hebûna ‘Te’ bi zanebûna ‘Min’ dibe ‘Zanîn’.

Dema em bi vê awayê nêzbibin Xwedê, Xwedê Zana ye, zanayê her tiştî ye, lê ne ‘Zanbar’ e. Lê em ê çawa bizanibin ku Xwedê çawa dizane? Du rêbaz hene. Yek ji wan hîpotetîk *(hîpotez/saw)* e, a dîn jî pêvajoyekê hermonotîk *(şîrove)* e. Rêbaza yekem, saw, fikrekê klasîk e. Xwedê pêşîya ‘Fikrê’ qebûl dike û dibêje ku her ‘Zanîn’ berê de ji alî Xwedê ve tê zanîn. Rêbaza duyem pêvajoya hermonotîk ango pêvajoya şîroveyê ye ku em bixwazin Xwedê bibînin, pêwist e em ji ‘Zanbar’ê ango ji ‘tişt’ dest pê bikin. Ku em tarîfkirina ‘Zanîn’ê qebûl bikin em mecburin ku rêbaza duyem bişopînin.

‘Tişt’, ‘Zanbar’ di zimanê erebî de piştî Xwedê hebûna hertiştî ye. **(1)** Pêşiya ku Xwedê bizanibe pêwiste ku ‘Tişt’ hebe ji ber ku ‘tişt’an Xwedê afirandiye. Şert û mercê ‘Zanîn’ê tişt e lê belê Xwedê ne ‘tişt’ e, ‘Zana’ ye. Ji ber vê yekê ji bo ku agahiya ‘Zanîn’ derkeve hole ango ku Xwedê bizanibe, pêwiste ‘Tişt’ hebe. Ev ne meseleya zanîbûn ango nezanîbûna Xwedê ye, ev meseleya ‘Tiştê’ ye. Em dibêjin ku Xwedê her ‘Tişt’î dizane. Belê rast e. di vê hevokê de ji aliyê zanebûna Xwedê ve tu pirsgirêk tune. Lê belê pirsgirêk ‘tişt’ e. niha em dê tehlîla vî ‘tiştî’ bikin.

‘Xwedê bi pêşerojê dizane.’ Ji aliyê rêzimanê ve hevok ji lêker, kirde û bireserê ve pêk tê. Kirde Xwedê ye, birêser jî pêşeroj e. Xwedê ‘Zana’ ye pêşeroj jî ‘Tîşt’ e. Li gor vê hevokê pêşeroj heye,

diyare û 'Zanbar' e. Dema ku em bibêjin pêşeroj heye û diyar e, wê demê ne hewceye em nîqaş bikin. Ev teoriya Determînîstiyê ye. Li gor teoriya Determînîst her tişt ji aliyê sedemekê pêk te û her sedemek encamek derdixe hole. Mînakek gelemperî dibêje ku li Amerîkayê belgekê darê hilweşê dibe ku bibe sedemeke tofanê li Rojhilata Navîn. Dema ku em vê sedemê bizanibin em ê pêşerojê jî bizanibin. Lê belê ji aloziya xwezayî û dîrokiya gerdûnê ev ne pêkan e, lêbelê ji hêla vê teoriyê ve wiha tê qebulkirin. Ku em teoriya determînîst qebûlbikin, wê demê em ê çawa qala vîyana azad, ango îradeya azad bikin û li kû derê biraxînin. Em dizanin Xwedê bi afirandina me re îradeyeka azad jî daye me. Her kes berpirsyarê kirara xwe ye. Ji ber vê yekê îradeya azad li gor teoriya determînîst paradoksek e. Ku em teoriya determînîstî qebulbikin, em nikarin behsa îradeya azad ango berpirsyariyê bikin. Lê ku em behsa îradeya azad bikin pêşeroj ji bo determînistiyê dibe paradoksek. Ji ber vê yekê, her du kirû li heman cihê nikarin xwe biparêzin.

Ku em îradeya azad qebul bikin em dikarin bi awayekî teqez bêjin ku pêşeroj tune. Hêj derneketiye holê û ne 'Tişt'ek e ango ne 'Zanbar' e. ji ber vê yekê 'Zana' niha nizane ji ber ku 'Zanbar' tune ye, bireser tune ye. Pêşeroj hêj nebûye 'Tişt'. Em niha nîkarin behsa 'Zanîna' pêşerojê bikin ji ber ku tune ye lê herdem nehêniyek heye.

Gelo Xwedê bi pêşerojê dizane? Ku bersiva me erê be wê demê çend pirsgirek dertêne pêşiya me. Bi rastî li gor baweriya klasîk a qederê jî wuhaye. Em dikarin vê hevokê li gor baweriya klasîk wuha tehlîl bikin: Dema kû gerdûn ango kaînat tunebû her tişt ji aliyê Xwedê ve hatibû nivisandin û di pêşerojê de her Zanbar î û tişt diyar bûn. Li gor vê baweriye em dikarin bêjin gelo ku qeder ev be Xwedê di vê nivîsê de Xwe jî naxe çarçoveyeke ango rolek ji xwe re jî hilnade? Ango Xwedê jî xwe bixwe nanivîsîne? Tiştên ku wê di pêşerojê de bibin qey Xwedê mudaxale nake? Dema ku em bêjin Xwedê pêşerojê nivisandiye *(qeder)* em dikarin bibêjin ku

Xwe jî nivisandiye û Xwedê Xwe jî kiriye pêşeroj ango qeder, Ango zanbar. Û ku pêşeroj 'Tişt' be wê demê Xwedê jî dibe 'Tişt'. Ji ber vê yekê pêwist e em bi wateya Qederê baş bizanibin.

Gelo qeder çiye?

Qeder di zimanê Erebî de wuha tê tarîfkirin: maneya koka qederê qdr ye ew jî wateya wî pîv, zerengî, qasi, piç, nirx, qîmet hwd. Qadîr jî maneya wê, wateya peyva Qadîrê jî, muktedîr, desthilat, teqdîr hwd. **(2)** Em dikarin ji bo qederê çend ayetên Qurana pîroz rêz bikin:

- *Xwedê afirand, Pîştî ku afirand pîv (qeder) teqdîr kir. (Furkan 2.)*

- *Emrê Xwedê Qeder e û ew qeder bi cîh bûye. (Ehzap 38.)*

- *Bêguman me her tiştî bi qederekê teqdîr kiriye. (kemer 49)*

- *Ji dilopekî afirand û pîvand teşeyek dayê (qederek daye). (ebese 19. )*

Em di ayetên jor de dibînin ku Xwedê qederê tekdîr dike, ango şikil, têşe hikmet dike. Ev qeder ne tenê jibo însan e bê guman ji bo gerdûn û ên din av gerdûnê tevde ye. Ev qeder *(şêwe, şikil, pîv)* jibo gerdunê, xweza, însan, nebat hwd tevde ye. lê ev qeder ne ji bo tîştên pêşerojê ye ji ber ku pêşeroj hêj nehatiye afirandin û hêj ne tîşteke ku Xwedê qederek ango şêweyek lê bi xemlîne.

Lê belê ev nayê wê wateyê ku Xwedê gerdûnê afirandiyê û wuha hiştiye, ango qey têkiliya Xwedê pê nema ye. Berevajî Xwedê gerdûnê û tiştên di nav gerdunê de dem bi dem, a niha diafirîne û nûh dike. Her tişt herdem ji teqdîra Xwedê ve nav afirênderêde ye. Xwedê encamên îradeya azad jî diafirîne, lê belê mudaxale nake. Îradeya azad biryara başî ango nebaşiyê dikare bide. Başî ango nebaşî, eva nîqaşek cuda ye. Encam li gor îradeya azad çi be bila bibe Xwedê mudaxalê nake, lê belê encama îradeya azad jî diafirîne.

Ji fikrên qederê yek ji wan ew e ku dibêje Xwedê dema ku me û gerdûnê neafirandibû jî, dizanibû ku emê çi bikin û wê çi were

serê me û wê demê Xwedê dikaribû me neafiranda û me bişanda dojehê yan bihuştê. Lêbelê Xwedê me afirand ji ber ku em li gerdûnê ango li jiyanê tevger û biryara rêya xwe diyar bikin û em bibin govanê xwe da ku em îtiraz nekin.

*Em jî li hemberê vê pirsê dikarin bersivek wuha bidin: gelo dema ku Xwedê me neafirandibû qey me baweriya hikmet û ilma Xwedê nedikir? Heya ewlebûna hikmet û ilma Xwedê hebe, hewceye ku em bibin govanê kiryarên xwe?*

Li gor ola îslamê, Xweda xwediye hikmet û qudret û ilma bê sînor e. Me di nivîsa xwe de qala pêşerojê kir û me got ku pêşeroj ne tiştek e û ne pêkane were zanîn. Gelo em nikarin bêjin qey Xwedê nikare texmîn jî bike? Gelo Xwedê nikare bizanibe ku tevgera îradeya azad dê çi biryarê bide? Niha mijarekê din derdikeve hole: Texmîn. Li gor termînolojiyê peyva texmînê ew e kû derheqa tiştekê neeşkere de encama bikaranîna agahiya rasthatî ango nediyari ye. **(3)** Em ji bo agahiyê rojane bûyera texmînê gelek bi kar tînin em dikarin ji bo sibehê, dusibeh, salek ango pêncî sal pêş de texmîn bikin. Lê bele ne pêkane ku em sed hezar salî pêş de texmîn bikin, ji ber ku hêza ilm û ma'rîfeta me ewkas tune ye. Lê Xwedê… Ew Xwedê ye ku heman demê her tiştî diafirîne û ilma xwezayî, derûnî, erdnîgarî hwd. hemuçkan dizane.

Li gor vê ilma Xwedê em dikarin bibêjin her awayê ve Xwedê dikarê heya qiyametê jî pêşerojê texmîn bike. Navbera texmînkirinê û zanînê de xalekê girîng û xeterdar heye. Me li jor salixa herdu peyvan jî kiribû û herdû peyv ji hev gelek cûda ne. Şert û mercê zanînê hene, li milê din texmîn peywendiya wî bi tu tiştê re tune û hîpotetîke ango şîrove ye. Em dikarin bibêjin, Xwedê pêşerojê texmîn dike û texmîna wî teqez e. Lêbelê em nikarîn behsa zanînê bikin. Niha di vir de derdikeve hole ku texmîn bawerî ye, bawermendiya însan e.

Ji bo mijara qederê ji dîrokê heya vê gavê gelek salix, ragihandin û nîqaş hatine dayîn û gelek pirtûk û ansîklopedî hatine nivisandin

û tomarkirin. Me jî qederê bi ecziyeta xwe li gor nêrîna xwe bi rêya felsefe û mentiqê anî ziman. Ji xwe felsefe bi xwe jêpirsîn e. hezkirina zanînê ye. Ma felsefe tunebûya, zanîn û zanistî dê çawa derbiketa holê.

**Jan JAN**

**29.03.2016**

***1-*** *er-Ragıp el-Isfahâni, El-Müfredat fi Ğaribil Kur'an, Beyrut, syf. 251.*

***2-*** *http://www.etimolojiturkce.com/kelime/kader*

***3-*** *https://en.wikipedia.org/wiki/Guess_(disambiguation)*

## AFIRANDÊRIYA YEKITIYA DIJBERAN

*'Riya serejor, riya serejêr e.'*
***(Herakleîtos)***

Fîlozof Herakleîtos ***(B.Z.530-475)***, îro ji piraniya fîlozofên ***Mîletî*** zêdetir tê naskirin û zanîn. Herakleîtos, li bajarê ***Ephesosê*** hatiye dinyayê û *B.Z.* di qirna *(sedsala)* 6an de jiyaye. Bi taybetî jî, bi du ramanên xwe girîng navdar e. Ramana yekemîn, ramana wî ya '***yekîtiya dijberan'*** e. Riya serejor, riya serejêr e û herdû jî heman rê ne. ***Li gor felsefeya wî:*** *Herakleîtosê ciwan û ê kal ne du kesên cihê ne, heman Herakleîtos in. Dema ku dosteke we, ji we re bibêje ku nîvê şûşeya meyê vala ye û hûn jî bibêjin ku nîvê wê jî tiji ye, dê ev gotina we ne gotineke nakok be. Ev yek tê wê maneyê, ku hûn mîna hev difikirin.*
Hasilê, mirov dikare bibêje ku di ramana Herakleîtos de, hemû tişt xwe digihînin ***yekitiya dijberiyê.***
Herakleîtos du gotinên gelek watedar gotiye, ku ew îro jî li ser kar in. Ya yekemîn, gotiye ku '*girêdaniya nexwiya, ji ya xwiyakirî bihêztir e.'* Gotina wî ya duyemîn jî, gotiye ku <*em du caran, nikarin bikevîn çemekî.*> Gotineke wî ya din jî gelek balkêş e, ku gotiye <*têkoşîna li dijî mengiyan, gelek dijwar e û bedela wê, bi rih tê dayîn.*>
**Maneya vê yekê ev e:** Reva ji şer û nakokiyan, bêîmkan *(bêderfet)* e. Di rastiyê de tiştên ku dinyayê pêk tînin, yekitiya tiştan ya dijber e. Heke nakokî ji holê rabe, dê wê demê rasteqînî jî jo holê rabe. Maneya vê yekê jî ew e ku rasteqînî, ne tiştekê sekinî *(rawestî)* ye û herdem, livdar e. Hemû tişt, herdem di nav herikanekê de ne û diherikin. Ev ramana wî ya duyemîn jî, wisa dike ku ew herdem tê bîra mirovan: ***'hemû tişt, diherikin'.*** Li vê dinyayê, ti tişt mîna xwe namînin. Her tişt, herdem diguherin. Tişt, ji rêyên cihêreng têne heyînê *(holê)* û di dawiyê de, ti caran wekê xwe namînin. Em bi xwe jî, wiha ne. Hemû tiştên li gerdûnê hene jî wiha ne, dibe ku gerdûn bi xwe jî wiha be.

Herakleîtosî dîsa gotiye, ku '*xeysiyeta (xisleta) mirovekê, qedera wî/wê ye.'* Ev dûrbiniya wî ya balkêş, du hezar salan piştî wî; ji aliyê ***Sigmund Freudî*** ve hatiye bikaranîn.
Tiştên ku em wan wekê '*tişt'* dinavînin, ti caran ew ne nesneyên *(bireserên)* sekinî ne û herdem, vediguherin tiştekê din. Ji ber vê yekê ye ku Herakleîtos, wan dişibîne agir.
Agir, di lewnê nesneyê de xwe dide der; lê ji nesneyê zêdetir, pêvajoyek e. Ev ramana Herakleîtos ligel kûrahiya xwe, ramaneka hilweşîner bû jî. Çimku mirovan herdem xwestine ku baweriya xwe bi tiştên sekinî, berbiçav, ewle û mayende bînin. Heçku, Herakleîtos dibêje ku tiştekê wiha tune. Guherîn, zagona jiyan û gerdûnê ye. Tiştê ku hemû tiştan dikargerîne *(bi rê ve dibe)* jî, guherîn bi xwe ye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
15.10.2014

**Jêder**

**1-** Antolojiya Feylesofan. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015
**2-** Profesor Bryan Magee. Kurteçîroka Felsefeyê. Weş. Dost.
**3-** Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015.
**4-** www.felsefevan.org

## **Şaristanî, Kurd û Dewlet**

Beşdarên Ezîz, xweşik û birayên hêja. Di destpêkê de ez silavê li we dikim û xêrhatina we dikim. Hûn bi xêr û xweşî hatine vê civîna zor girîng û watedar. Ez gelekî spasiya rêveberên Wezareta Rewşenbîrî jî dikim, ku îmkana vê semînera watedar dane me. Malî ava. Bêguman, Kurdistan cih û warê avakirina şaristaniyê ya herî kevnare ye. Li gor delîlên di dest de, bi rihetî meriv dikare bibêje ku Mezopotamya, Misir, Filîstîn, Hindîstan û Yewnanistana Antîk, çend cihên herî kevnare yên şaristaniyê ne. Heta çend salên dawî jî arkeolog û dîrokzanan digotin ku Misir û Filîstîn, şaristaniyên herî kevnare ne. Lê belê wekî zanîna we ye, şûnewarên gundê Çermo ***(Jarmo, li Başûrê Kurdistanê)*** ku nêzîkî çiyayê Zagrosê ye, nîşan didin ku ev gundê Çermo 6.700 sal Berîya Îsa *(B.Z.)* hatiye avakirin. Êdî hatiye destnîşankirin ku gundê Çermo, gundê herî pêşîn e ku li li cîhanê ava bûye û dîsa li vî gundî, mirov ji asta nêçîrvaniyê derbasî çandinî û xwedikirina heywanan bûne. Ev yek, di dîroka mirovahiyê de şoreşeke mezin û bingehîn e, ku li welatê bav û kalên me pêkhatiye. Dîsa arkeologên Amerîkî, Alman û Tirk di sala 1985an de li Diyarbekirê, li dorhêla navçeya Erxeniyê malek ji bin erdê derxistine, ku ev mala ha jî 9.000 sal kevn e.

Axa bav û kalên me, ji hêla ramanî ve jî ji bo temamiya mirovahiyê herdem bûye kanîyeka xurt û di pêşveçûna zanyariya teorîk de, rolekê mezin leyîstiye. Ramana dualîzmê *(dualîtiyê)* ji erdnîgeriya me dest pê kiriye, xwe berdaya xaka erdnîgeriya Yewnana Kevnare, û bûye yek ji wan hêz û vîna pêşveçûna ramanî.

Bêguman miletê kurd, di cîhanê de yek ji wan miletên herî medenî ye û di avakirina medeniyetê de jî, rolekê mezin leyîstiye. Lêbelê, ji ber zengîniya axa me û çavkaniyên xwezayî, Kurdistan herdem rastî êrîş û talanan bûye û ji aliyê miletên cînar ve hatiye dagirkirin. Lewma jî, em dibînin ku dîroka kurdan bi pirranî bûye dîroka berxwedanê, dîroka man û nemanê û dîroka daxwaza azadiyê. Daxwaza azadiyê, ji roja ewil ve hebû û ta niha jî

berdewam dike û li hemberî tu tehde û zordestiyan jî, serî natewîne. Girêdayî vê mijarê, meriv dikare bibêje ku kurdan, daxwaza xwe ya serbestiyê bi avakirina gelek dewletan nîşan dane û gelek dewletên heremî, bajarî û netewî jî ava kirine. Ev dewlet, bi temamî neşibin dewletên me yên îroyîn jî, li gor şert û mercên wê demê xwediyê wesfên dewletê ne û di seranserê dîrokê de hatine avakirin.

*Di seranserê dîrokê de meriv dikare behsa qasî 25 dewletên kurdan bike ku jiyana xwe demekê dirêj berdewam kirine. Ev dewlet jî dewletên wekî: Bajar Dewletên Hurrî, Dewleta Gutî, Dewleta Sûbarû, Dewleta Lûlû, Dewleta Mîtannî, Dewleta Kassîd, Dewleta Ûrartû, Dewleta Medyayê, Dewleta Komaganê, Dewleta Bûweyhî, Dewleta Bawendî, Dewleta Ziyarî, Dewleta Kengarî, Dewleta Kekûyî, Dewleta Eyûbî, Dewleta Şedadî, Dewleta Rewadî, Dewleta Hesenweyhî, Dewleta Zend, Dewleta Gor, Dewleta Merwanî, Dewleta Dostikî û Komara Kurdistana Mehabadê, ne.*

Helbet li vir xwiya ye ku fikra dewletê û kevneşopiya avakirina wê, di nav kurdan de ne nû ye. Lêbelê, fikra dewleta netewî ya kurdî, yekem car ji aliyê feylesof û wêjekarê nemir Ehmedê Xanî ve, beriya Şoreşa Fransî ku Şoreşa Fransî wekî destpêka fikra dewleta netewî tê pejirandin, bi eşkerayî û hostetî hatiye derbirrîn. Gorbihuştê Xanî, nerazîbûna xwe ya li dijî Peymana Qesra Şîrîn wuha aniye zimên:

*Tasek ji vê ava zelal*

*Nadim bi hewza Kewserê*

*Levhatina Qesra Şîrîn*

*Jê nabînim tu meferê*

*Piştî roja me bû tarî*

*Mirin xweş e ji emberê.*

Li ser vê mijarê dîsa dixwazim wekî nimûneyekê behsa fikra Evdirehîm Rehmî, nivîskar û hozanê Kurd bikim. Evdirehîm Rehmî di 26ê Rêbendana sala 1919an de, di Kovara 'Jîn' de weha gotiye: 'Îroke di qelbê me hemîyan evînîyek heye, agirek heye ku em daîma bi wê eşqê, bi wê evînê disojin, diqelin û ji ber wî agirî em ne xwedanmal in, ne xwedankur in, ne xwedanheyat in. Welhasil hemî tiştê xwe em hazir in di wê rêda bidin. Ew çi eşq e, çi evînî ye? Elbet ew evînîya welat e.'

Belê, agirê eviniya welatê me hê jî gur e û netemiriye û xwiya ye ku dê her geştir jî bibe.

Li vir divê were gotin ku saziya dewletê wuha di her qonaxa civakî de nehatiye dîtin yan jî avakirin. Dewlet, piştî ku mirov li ser axê bi cîh bûne û di navbera wan de têkilîyeka rêveberiyê dest pê kiriye, derketiye holê. Di civakên hoveber de, ji ber ku navendeka hêza rêveberiyê û desthilatdariyeka sîyasî tunebûye, dewlet derneketîye holê. Di eşîretan de ku yekemîn civaka bicîhbûyî ne, prototîpa dewletê derketiye holê.

Li bajaran jî, bi hemû sazîyên xwe yên bingehîn û erkên xwe re, em dibînin ku dewlet derketine holê û navê dewletên bajarî li wan hatiye kirin. Dewlet, saziya herî mezin û çalak ya civakî ye. Ji alîyê mirovên ku girêdayê desthilatdarîyeka raser in ve, li ser axaka ku sînorên wê diyar in hatiye avakirin. Dewlet, sazûman û serwerîya civakê, li hember civakên din diparêze û xwediyê yekîtîyek hiqûqî û sîyasî ye jî. Şertên avakirina dewletê yên sereke jî, hebûna gelekî ku xwediyê nirxên hevpar in û li hawirdora desthilatdariyeke top bûne, welat û serwerî ne.

*Ê baş e, wesf û wezifeyên dewletê çi ne yan dewlet bi kêrî çi tê?*

Dewlet saziya herî mezin, birêxistî û çalak ya civakî ye, ku berdewamî û sazûmana civakê diparêze. Serwerîya xwe, bi rêya bikaranîna sê wezîfeyan pêk tîne. Ev wezîfe jî rêvebirin, zagonçêkirin û darazdanî ye. Dewlet li hemberî xeteriyên ji hindûr û der, dikare hêzeka ku xwe dispêre darêzorê bikar bîne. Dîsa bi

nêzîkayîtêdaneka sazgêr; ji hêla sosyo-kulturî, sîyasî, edalet, perwerdehî, pirsgirêkên hawirdorî û hwd. ve, jiyana civakî qontrol dike. Dewlet, têkilîyên sazîyan sererast dike. Endametiya şexsan ya dewletê, tiştekî bivênevê ye û ev endametî bi rêya gurza hemwelatîbûnê pêk tê. Mafê hemwelatîbûnê dema ku rewş rê didin, bi biryara rêvebirinê tê bidestxistin, an jî windakirin.

Li gor daxwaz, wesf û xwebirêxistîkirina civakê jî texlîdên dewletê yên wekî dewleta Unîter, Federal, Teokratîk, Laîq, Otokratîk û Demokratîk hatine damezrandin. Lêbelê di roja me ya îroyîn de, weke dewleta nûjen bêguman dewleta demokratîk tê dîtin ku di dewleta demokratîk de hêza zagonçêkirin, rêvebirin û darazdanînê, di destên livokên cuda de ne. Ji vê yekê re, 'Cudahîya Hêzan- Güçler Ayrılığı' tê gotin. Gel, bi îradeya xwe ya azad nûneran hildibijêre û dişeyne parlamentoyê. Di dewleta demokratîk de, hêza darazdanînê serbixwe ye û mafê hemû kesayetiyan di bin parastina dewletê de ye. Dewleta demokratîk, li gor prensîba 'wekhevîyê' rê ji bikaranîna maf û azadîyên şexsî re vedike û wan diparêze. Bêguman dewleta demokratîk, di heman demê de dewleta sosyal e jî. Dewleta sosyal ew dewlet e ku li hember zagonan, wekheviya hemwelatîyên xwe diparêze û maf û azadiyên wan yên bingehîn, di bin parastina dewletê de ne.

Dewleta demokratîk, li gor prensîbên bingehîn yên demokrasiyê şekil digre û bi vî awayî, erka xwe bidest dixe.

*Baş e, dewlet çawa derketiye holê?*

*Ew saziyeke xwezayî yan çêkirî (qelp) e?*

Feylesofên mîna Platon û Arîstotales yên yewman, dibêjin ku dewlet saziyeka xwezayî ye û wuha derketiye holê. Platon dewletê weke organîzmeyeke makro *(herî mezin)* dibîne û bingeha dewletê jî, di xwezayê de û di tebîeta mirovî de dibîne. Platon dibêje ku, tu kes nikare bi serê xwe tenê hemû pêdiviyên xwe pêk bîne û lewma jî, pêdivî bi alîkariya hinekên din heye, ku ev jî encax bi rêya dewletê dikare pêk were. Şagirdê wî Arîstotales jî vê ramana

Platon dipejirîne û dibêje ku, 'mirov xwediyê taybetmendiya jiyana civakî ye û li cem wan, meyla 'jiyanekê bi hevdu re' jî heye. Çimku taybetmendiyên ku xwezayê daye mirovan, ew ancax di civakekê de dikarin vê yekê pêk bînin. Ji ber vê yekê ye ku dewlet, li cem mirov digihêje bingehekê û dibe berdewama xwezayê. Arîstotales dîsa gotiye ku damezranerê dewletê, 'mirovê herî qencîxwaz e. Çimku qanûn tunebe, heywanê herî xirab bêguman mirov in.'

Ramangir û feylesofên mîna Rouseau, Hobbes û Locke jî, dewlet saziyeke çêkirî ye û ne xwezayî ye. Li gor T. Hobbes, mirov ji tebîetê xwe ve jixwerexwaz 'egoîst' e. Bi tenê, ji bo berjewendiyên xwe kar dike. Ji bo ku bi tenê ji bo berjewendiyên xwe têdikoşe 'mirov, gurê mirov e.' Ev yek jî di nav mirovan de rê li şer, pêvçûn û nerazîbûnan vedike. Lewma ji bo rêlibergirtina pirsgirêkan, mirov têne cem hevdu û sitûyê xwe ji otoriteyek raser re ditewînin. Bi vî awayî organîzasyona siyasî, ango dewlet dertê holê.

Rouseau jî, di berhema xwe ya bi navê 'Peymana Civakî' de dibêje: 'Dewlet, di encama peymaneka ku mirovan di navbera xwe de çêkirine û ku dixwazin bi saya vê peymanê serbest bijîn, derketiye holê.' Armanca vê peymanê ew e ku, mirov bi awayekî misoger bigihêjin wekhevîyê. Ev peyman, bi saya îradeya şexsan ya serbest, pêk tê.

Belê beşdarên ezîz. Mijara me berfireh e, kûr e û sînorên vê gotarê jî hene. Em kurd in, navê welatê me Kurdistan e, ku kevintirîn şaristanî ye û xwediyê nirxên netewî yên hevpar in jî. Lêbelê ya ku divê bêtir were xurtkirin yekîtiya siyasî ya hemû hêzên kurda ye, ku meriv dikare vê yekê jî wekî xurtkirina serweriyê binav bike.

Hêviya me ya ku ji bav û kalên me weke mîrate maye, hêviya me ya azadiya welatê me û avakirina dewleta xwe ya netewî û serbixwe, hê jî zindî ye û di dilê me de dijî. Wekî ku serokê bizava

rizgarîxwaza Kurdistanê nemir Mele Mistefa Barzanî jî gotiye 'di dilê her kurdeke de Kurdistaneke azad û serbixwe heye.' di dilê min de jî Kurdistaneke azad û serbixwe heye û ez jê bawer im ku dê em ê rojekê li welatê xwe azad û serbixwe bijîn. Ev yek mafê me ê herî xwezayî ye, ku ji bo vê yekê me bedelên mezin jî dane.

**Gul Y. Seven**

17.11.2015

***Jêder***

***1-*** *http://www.felsefevan.org/xweza-u-dewlet-2.html*

***2-*** *http://rudaw.net/NewsDetails.aspx?pageid=135692*

***3-*** *http://www.felsefevan.org/dewlet-u-kurd.html*

***4-*** *http://www.felsefevan.org/ismail-besikci-3.html*

***5-*** *http://www.felsefevan.org/penas-unsur-u-taybetmendiyen-dewlete.html*

***6-*** *http://www.felsefevan.org/dewlet-cawa-derketiye-hole.html*

***7-*** *http://www.felsefevan.org/di-diroke-de-gotina-kurd.html*

***8-*** *Felsefeya Dewletê ya Hegel. Prof. Macit Gokberk. pdf.*

***9-*** *Dîroka F. Serdema Pêşîn û Navîn. Prof. Dr. Ernst von Aster.pdf.*

***10-*** *Derheqê Dewletê de Ramanên Hinek feylesofên Navdar. Cengîz Çuhadar. pdf.*

***Têbinî:*** *Ev gotar, ji bo semînera Dezgeya Rewşenbîrî ya Duhokê hatiye amadekirin. Lê mixabin, ji ber pirsgirekekê taybet Gul Y. Seven bêgav maye ku Kurdistana Başûr şûnde bihêle û vegere Tirkiyeyê. Lewma jî, ew semîner pêknehatiye. Baweriya me ew e ku dê ji bo xwînerên kurdî sûdewer be.*

## Felsefe, Bişkivîn û Kulîlkvedana Eqlê Însanî Ye

**Ferzan Yezdanî**

Felsefe ji agirê zanahîyê yê ku li Mezepotamyê û li Kurdistanê hewîrdor ronî dikir wek tîskekê vepekîya Yûnanîstanê û Yûnanîyan bi keda xwe û bi kurika xwe ew tîsk wusa gur û geş kirin ku him jiyana xwe pê ronî kirin û xwe pê germ kirin û him jî şaristanîyeke bêhemta pê ava kirin ku di dîroka şarisîtanîyan de hatanî îro mîna stêrkeke bedev diçirise û hîna jî şewqa xwe dide her derê. Dema împeretorê Romayê ola filetîyê pejirand li dijî felsefeyê derket û ferma girtina medreseyên ku têde felsefe dihat hînkirin derxist û felsefe tev hat qedexe kirin. Felsefeyê jî xwe da hev û ji wir derket hat li rojalatê û li nava misilmanan bi cî bû. Li vir jî bû sedema xêr û bereketê û bandûreke xurt û dîyarker li şaristanîya misilmanan kir. Lê yên ku xêra mirovatîyê nadixwastin û aktîf bûna eqlê mirovî li dijî berjevendîyên xwe didîtin dest bi tekfîr kirin û kafir hejmartina feylesof û felsefevanan kirin û fêr bûn û fêr kirina felsefeyê qedexe kirin û gotin: *<Men tementeqe tezendeqe>* yanê: Her kî bibe mentiqzan dê bibe zindîq.

Dema li vir jî derî li felsefeyê hat girtin û jê re derfeta mayînê nehîştin xwe da hev û wek têrê talihê firî çû li ser serê misilmanên Endilûsê venîşt. Li vir jî hilberînên xwe di her warî de dane der û bû sedema peşketin û ava bûna şaristanîyê. Piştî demekê şûn ve, bere bere şewqa xwe da ser Fransa û Îtalyayê; welatê ku serek û zanayên dêra Qostantînê ji ber fetha wê ya ji alîyê Osmanîyan ve revîbûn wir û kumê xwe danî bûn ber xwe û êşa têkçûnê ewe xistibûn nav fikarên dûr û dirêj û kûr û kûr li ya hatî serê xwe difikirîn.

Êşa wunda kirina Qostantînê û şewqa felsefeyê ya ku ji hêla şaristanîya Endilûsê ve belav dibû di serê van mirovên têkçûyî de gihîştibûn hev û yekemîn çirûskên serdema ronesansê li vir yanê li Îtalyayê peyda bûn. Li Fransayê jî felsefeya Îbnî Ruşd bandûrek mezin li dûyî xwe hiştibû û li wir ji xwe re bibû tevgerek felsefî.

Ew çirûskên ku di serê van têkçûyan de û li Fransayê hatibûn holê hêdî hedî gurtir û geştir bûn; bûn rewşenbîr, bûn zanyar, bûn zanist, bûn şoriş, bûn teknolojî, bûn fabrîqe, bûn teyare,bûn top, bûn tank û bûne gule û hatin li qesra Osmanîyan ketin û ewe ji xewa quretî û xwe raser dîtinê şîyar kirin. Lê êdî dereng mabûn, di heyameke kurt de tijî kirina qelşa ku di navberê de pêk hatibû ji bo Osmanîyan ne mumkîn bû.

Li geşta felsefeyê ya dirokî binêrin, ku çûye kuderê li wira bingehên şaristanîyê avitine, cumbûcoşa fikrî û çandî bi rê xistîye, zihn û eqlê mirovî avdaye û tûjtir û tûjtir kiriye, wêrekîya zanabûnê daye mirovan, rêya li ser lingên xwe sekinînê û xweserî û xweberî û wek xwe bûyîn û wek xwe mayînê nîşanî mirovan daye, serên hişk nerm kirine, dilên tarî ronî kirine, zihnên şêlo zelal kirine, çavên şaş derman kirine, canên mirî careke din zindî kirine, destên aciz bihêz kirine, rê li ber pirsên nû û besivên nû vekirine, ji peyda kirina çareserîyên çêtir û rêbazên însanîtir û pêngavên mezintir re şert û merç amede kirine, hewl daya ku însan bikanibe xwe berde kûrahîya çewtî û şaşîtîyan û ji herî binê ve koka wan biqeline daku sibê dîsa (hi)şîn nebin, alîkarî kiriye ku însan berî her tiştî xwe nasbike, xwe ronî bike, bi xwe bihese, tê wîne derê ku ji dema hatiye dinyayê haya niha ji alîyê civakê ve, ji alîyê dêûbavê ve, ji hêla medresê ve, ji a memoste ve, ji a otorîteyê ve, ji a çandî ve û ji hêla hemû ew diyardeyên ku di nav de dijî ve bi tiştên rast an çewt, qenc an qirêj hatiye dagirtin, hatiye pîlan kirin û hatiye qalip girtin û ew ne bi emrê xwe, belkî bi emr û fermana bernameya ku lê hatiye bar kirin û ew jê haydar nîne, tevdigere û wek qirşqalekî li ser lehî, bêyî îradeya xwe vir de wê de diteriqe û pê re bi rode diçe; lewra yarmetî daye ku heyîna xwe ya hatî pîlan kirin di bêjinga eqlê xwe re derbas bike daku ji nû ve dest bi hilbijartinê bike; yên rast û bidelîl û bibingeh têde bile û yên çewt û bêdelîl û bêbingeh jê bavêje; wê pîlan ve bernamê ji nû de saz bike daku bibe ya wî û xwe bispêre agahî û zanahî û fehm û

têgîştin û têanînderka wî û ji rastî û çewtîyên xwe bi awayekî heqîqî û ji dil perpirsyar be.

Erê, ku felsefe çûye kuderê li wir şopên mayende li dûyî xwe hiştîne. Civakên ji felsefeyê hezkirine û derîyê xwe jê re vekirine di her warî de berz bûne û pêşve çûne; yên ku li dijî wê derketine û ji cem xwe qewirandine paşve ketine, tûşî fehmkorîyan û korerêyan hatine, xwe ji çêş û tema bextewerîyê bêpar kirine û herî dawîyê poşman bûne.

Hemû zanistên ku nika xweser in, berê di zikê felsefeyê de bûn û xwe bi xwîna felsefeyê xwedî dikirin. Lewra ji her alî de muhtacê felsefeyê bûn. Niha jî, herçiqas xweserîya xwe ava kirine û wekî berê ne muhtacê wê bin jî lê dîsa pêdivîya wan ya bi felsefeyê bi temamî kut nebûye û di hin waran de berdewam dike.

Felsefe him wekî hilberîneke eqlê mirovî û him jî wekî pêvajoya felsefînê û felsefe verzînê (*kirinê)* ji me re pêdivîyeke jêneveger e. Felsefîn, felsefî bûyîn û felsefî kirina xwe û jiyanê xwe ji elimîna felsefeyê wek hilberîneke eqlê morivî zerûrîtir û girîngtir e.

Canê/a rastîn *(çê)*, hizra rastîn *(çê)*, gotina rastîn *(çê)*, kirina rastîn û ava kirina cîhaneke ji a heyî çêtir armanca felsefê ye.

Felsefe, bişkivîn û kulîlkvedana eqlê însanî ye, bêhna xweş û mestker ya ji wê bişkivînê belav dibe ye. Felsefe, hizr û fikr e û saetekê bi awayekî ciddî fikrîn ji îbadeta heftê salî ewlatir û kêrhatîtir e. Rastîya însên tev ji fikrê pêk tê.

Her wekî Mevlana dibêje:

Hê birayo! Tu tev hizr û fikr î / ji pê ve tu hestî û qirş û qal î

**Yezdan Yezdanî**

**03.03.2016**

# MATEMATÎK KILÎDA GERDÛNÊ YE

*'Di nav fîlozofên beriya dema Sokrates de ê herî navdar, mirov dikare bibêje ku Pythagoras e. Heta ji Herakleîtos jî, zêdetir hatiye naskirin. Pythagoras jî li keviyên Egeyê B.Z. di navbera salên 570-497an de, li Samosê (Sîsamê) hatiye dinyayê.'*

Pythagoras, dahîyek pirralî û xwediyê behreyeke matematikê a xwezayî bû. Kesên ku çûne dibistanê, bêguman haya wan ji ***Teorema Pythagorasî*** heye û pê dizanin. Fîlozofê ku cara yekemîn ramanên ***<kare/çarçik>*** û ***<kûp/hêza sêyemîn a hejmarekê>*** dîtiye û wan têgehan di arîtmatîkê de bi kar aniye, Pythagoras e. Peyva <***teoriyê>*** bi saya xebatên wî, gihîjtiye wateya xwe ya îroyîn. Herweha wiha tê bawerkirin ku peyvên ***<felsefe>*** û ***<kosmos>*** ê jî, ji aliyê wî ve hatiye vedîtin û bikaranîn. Bandûra wî, demekê gelek dirêj berdewam kiriye. Kesê ku yekem car têkiliya matematîkê bi felsefeyê re daniye, dîsa Pythagos e.

***Pythagorasê fîlozofê yewnanî, ew kes e ku gotiye*** *<xebitîna gerdûna madî, bi têgînên matematîkî dikare were vegotin.>*

Ev ramana wî, di destê mirovan de bû yek ji wan ramanên herî berhemdar. Ji dema Pythagoras ve matematîk, ligel felsefe û zanistê berfireh bû û bi pêş ket. Hinek fîlozofên mezin, di heman demê de matematîkzanên mezin bûn jî. Mesela ***Descartes*** weke qadekî, geometriya analîtîk dîtiye *(kifş kiriye)* û ***Leîbniz*** jî hesabê dîtiye.

Di nav fîlozofên beriya ***Platon*** dê kesê ku herî zêde bandûrê li ramana felsefeya rovavayê kiriye, bêguman Pythagoras e. Ya rast gelek ramanên ku weke ramanên Platon têne zanîn, bingeha wan ramanên ***Pythagos*** in û lê ji layê ***Platon*** ve hatine bikaranîn û vejandin. *Mesela ramana <zanayiyên me, zanayiyên jiyana me ya berê*

*ne.> û ramana <sazûmana matematîkî, xwe li hemû dorhêla cîhana fizîkî rapêçaye.> ramanên berbiçav in.*

Di roja me ya îroyîn de, di têgihiştin û naskirina gerdûnê de, bêguman rola matematîkê gelekî mezin û girîng e. Gerdûn, ji xala xwe ya herî dûr bigrin ta xala xwe ya herî nêzîk; bi têgehên matematîkî têne binavkirin *(vegotin)* û xwediyê, avahiyeka bi vî rengî ye. Ramana ku ***Einstein*** û gelek zanyarên din ber bi baweriya xwedayekî ku li pişt gerdûnê ye ve ajotiye, dîsa ev raman e. Ev ramana <*hemû tiştên ku di gerdûnê de hene, dikarin bi hejmaran werin vegotin*> piştre, ji aliyê ***Platon*** ve jî, bi awayekî berfireh hatiye bikaranîn.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
15.10.2014

**Jêder**

**1-** Antolojiya Feylesofan. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015.
**2-** Profesor Bryan Magee. Kurteçîroka Felsefeyê. Weş. Dost.
**3-** Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015.
**4-** www.felsefevan.org

**Çima Felsefe?**

*Em di jiyaneke lezgîn û civateke take de dijîn. Ji bo em bibin xwedan pîşeyên nû fêr bibin û xwe bi zanebûnê biçek bin, pêdiviya me bi felsefeyê heye. Felsefe bo babetên hizra pilandanîna jiyaneke nû û guncayî. Felsefe, evîna berbi cindîtiyê ve ye. Ev her kes dizane, her kes dike, lê her kes nizane ku dike. Pirs ên li dûv felsefeyê tên, bêsinor in, lê sinorê hişmeniyê têper nake. Gelek caran dema pirs destnîşan dibe, mirov bawer dike, ko bersiv jê re tune: Bo nimûne, çima mirin heye?, Çawa Evîn peyda dibe? Çima mirov karê xerab dike?*

*Pêdiviya me bi felsefeyê heye, dako xebat bo peydakirina bersivdana van pirsan bibe û di lêpirsînê de berdewam bibe, çiko geriyan li bersivê û rêya wê armanc e, ne bersiv, ji ber bersiv di veguherîneke berdewam de ye. Felsefe, wate, afirandina berdewam bo pirsan û geriyana berdewam li bersivan. Di navbera pisporiya zanistê û hişkirina sinoran di navbera wan de, Mirovayetî heye, ko li çareseriyekê ji kêşeyên xwe re dixwaze, li rêyekê digere. Felsefe, pêkolê dike, ku paşindeya zanistê binase, loma jî faktorekî kartêker e, li ser disiplîna jiyanê û ji disiplînên heyî jî tête hingavtin. Platon û Aristotalis, dema li ser Genetîkê û berhemên wê rawestiyan, wan xwest pirs ên sincî, rewiştî û exlaqî, destnîşan bikin.*

*Eger nojdarî, li ser pirsa peydakirina Embryo yan, an jî rêbazên kartêker kar dike, felsefe, pirsa watedariya jiyanê têne arayê û dixwaze bizanibe, ji kû destpê dike. Eger zanist, xwe bi şiroveyan, bizavê dike di rêkên çavdêrî an jî hişmendiyek mentîqane li kar e, felsefe dipirse: Rastî çi ye? Em ji metodên çadêriyên xwe piştrast in. Felsefe pirs ên mîna: Mirov çi ye? Çi ye ya dikarim bizanibim? Ez çi bikim? Biyava xewnên min çendî dirêj û pehin in? Ez çawan dikarim, mirovekî bextewer bim? Mirin çi ye? Giyan dimire? Azadî çi ye? Çi sinorê wê, ne pirsa felsefeyê ye. Hebûn û heyîn çi ne? Xwedê heye yan na? Ev pirs yên felsefeyê ne. Jiber ku pêdiviya mirovan bi bersivadana van pirsan heye, mirov pêdivî bi felsefeyê jî heye.*

**Tengezar Marînî**

**28.02.2016**

## <u>VEKOLERÊ PISPOR: SOKRATES</u>

*(Sokrates, damezrînerê felsefeya ehlaqê ye û di heman demê de kesê ku rêbaza <bi awayekî sereqet û bi riya pirsîna pirsan, gihêjtina heqîqetê> ava kiriye, dîsa ew e.)*

Sokrates, ji xelkê Atînayê ye û li Atînayê hatiye dinyayê. Di dema qirna zêrîn a Atînayê de jiyaye. B.Z. di sala 470an de hatiye dinyayê, bûye bavê sê zarokan û B.Z. di sala 399an de çûye ser heqiya xwe. Di ciwaniya xwe de bala xwe daye fîlozofên beriya dema xwe û li berhemên wan baş hûr bûye. Fîlozofên beriya Sokrates, ew fîlozobûn ku dixwestin bi rê û rêbazên cihêreng bi dinyaya xwezayî bizanibin. Sokrates, di bin bandûra du taybetmendiyên girîng yên wan fîlozofan de maye û ku li gor baweriya wî, ev du xal *(taybetmendî)* du aliyê qels yên teoriyên wan fîlozofan bû. Xala qels ya yekemîn, lihevnekirina wan bû. Teoriyên wan, gelekî tevlîhev bibûn û mîna teoriyên dijber xwiya dikirin. Di nav xwe de jî, lihevhatineke wan a hevpar qet tunebû. Herçuqasî derheqê dinyayê de ramanên balkêş û sergerm raber kiribin jî, bala xwe zêde nedane rexneyan. Ji ber vê yekê jî, bêguman mirov nikare bi rastî yan çewtiya wan teoriyan bizanibe. Belam, lidijderketina Sokratesî ya duyemîn jî ev yek bû: Mirov bi rastiya wan teoriyan bizanibe jî, ti feydeyeka sepandina *(cibîcîanîna)* wan teoriyan tunebû. Ango di pratîkê de, feydeyeka wan tunebû. Zanîna dûrahiya Rojê, dê çi li jiyana me ya rojanê zêde bikira û dê bandûreke wê a çawa hebûya gelo? Bêguman tu bandûra zanayiyên bi vî rengî, li ser tevgerên me tunebû.

***Ê baş e, divabû me bi çi bizaniba?***

***Kîjan zanayî, bêtir bi kêrî me dihatin?***

Belê, beriya her tiştî divabû me bizaniba ka em ê çawa bijîn û em ê çawa bikaribin jiyana xwe berdewam bikin. Tiştê ku pêdiviya mirovan bi wan hebû, bêtir ev cure zanayî bûn. Lewma jî pirsên ku ji bo me girîng bûn, pirsên bi vî rengî bûn:

*- Baş çi ye?*

*- Rast çi ye?*

*- Edalet (dad) çi ye?*

Heke em bi bersivên pirsên navborî bizanibin, bêguman dê bandûreka wan ya erênî li ser jiyana me hebe. Sokrates, ti caran ne gotiye ku ez bersivên wan pirsan dizanim. Belam, li kesekê ku bi wan pirsan bizanibe jî rast nehatiye.

Wekî tê zanîn, zanyarê ***Delhoiyê*** berê ji bo Sokratesî gotibû ku ew mirovê herî zanyar e. Belam Sokrates, beriya wî ji xwe gotibû ku <*ez bi tiştekê nizanim û tekane tiştê ez pê dizanim jî, ev yek e.*> û lewma jî, wê gotina zanyarê ***Delphoiyê*** bi vê yekê ve girê dida.

Di wê demê de, mirov hê derheqê dinyayê de jî ne xwediyê zanayiyên rastbûn û zanayiyên *(teoriyên)* ku derheqê tevgerên mirovan de bûn jî, hema hema mirov dikare bibêje ku tunebûn. Lewma jî Sokrates li kuçe û kolanên Atînayê digeriya, bi xelkê re li ser siyaset û ehlaqê diaxiviya û pirsan ji wan dikir. Pirsên Sokrates gelekî balkêş bûn û ji ber vê yekê jî, xelk li hawirdora wî diciviyan û hewl didan ku bikaribin ligel wî bikevin guftegoyê. Bi taybetî jî, pirsên wî gelekî bala ciwanan dikşand.

Rêbaza Sokrates herdem heman rêbaz bû; ji têgeheke ku di jiyana me de xwediyê roleka girîng e dest pê dikir û pirsên wiha dikir: <*Dostanî çi ye?*>, <*Wêrekî çi ye?*>, yan jî <*Oldarî çi ye?*> û gelek pirsên bi vî rengî. Ji kesên ku bersivên pirsên wî didan re jî, digo hodre meydan û wiha dikir ku ew carekê din li ser bersivên xwe bifikirin û wan baştir dahûrînin.

Mesela yekê bigota ku <*wêrekî, liberxwedan e.*>, wê demê Sokrates jî digo <*wê demê rikdarî çi ye? Mirovên rikdar jî, bi sebreka mezin dikarin li dijî zordariyên jiyanê yên pirtexlîd li ber xwe bidin. Ma wêrekî ev e gelo? Ma tiştê ku hûn wê diecibinîn, ev yek e?*> Piştî gotinên Sokrates, mirovên ku bersiva wî didan, bivênevê diketin gumanê û carekê din, li ser fikrên xwe diponijiyan.

Ev awayê *(rêbaza)* pirsyarîkirina Sokratesî, gelekî navdar bû û bi riya vê rêbazê, bi derbekî du derfet derdiketin holê. Piştî pirsyarîkirinê kesên ku digotin em bi bersivan dizanin yan jî wiha zendikirin, têdigihiştinê ku ew bi bersivan nizanin. Derfeta duyemîn jî ew bû ku piştî pirsyarîkirinên Sokrates, meyl û bala xelkê bêtir diçû ser wan pirsên felsefîk. Di dawiya pirsyarîkirinan

de jî, Sokrates ti caran gotina xwe ya dawî nedigo û wiha dikir ku temaşevanên wan nîqaşan, bêtir li ser pirs û bersivan bifikirin.

**Tiştê ku li pişt hevokan veşartiye çi ye?**

Dema ku Sokrates pirsa **<*edalet çi ye?*>** pirs kiriye, bêguman bersiva ku wî dixwest bibihise ne tenê danasîna *(pênaseya)* wê bûye. Li gor bîr û baweriya Sokrates, peyva <*dadmend/edaletperwer*> ê, ji layê gelek mirovan ve ji bo biryar, yasa û peymanê jî tê bikaranîn. Lê taybetmendiyeke hevpar ya wan peyvan heye, ku ew jî edalet e. Tiştê ku Sokrates dixwest pê bizanibe û wê derxe holê jî, çawaniya wê xala *(taybetmendiya)* hevpar bû. Ango Sokrates dixwest ku bi wê hilika edaletê bizanibe, ku mirov dikare wê weke rasteqîniyeke razber *(nedîtbar)* jî biwesfîne.

Ev ramana wî di berhemên şagirtê wî ***Platon*** de, dê bibûya baweriyeka ***îdeayên nedîtbar***. Di felsefeya heyînê ya Platon de, heyînên rasteqîn îdea ne û hemû heyînên ku li cîhanê hene jî, texlîdên *(qopiyên îdeaya)* ne. Ango heyînên esîl, îdea ne. Di vê xalê de mirov dikare bibêje ku ramanên Sokrates, bandûreka hilweşîner afirandine û rê li aloziyan vekirine. Sokrates, pirsyarîkirinê fêrî mirovan dikir û nezaniya desthilatdar û rêveberan radixiste holê. Ji ber vê çendê jî ligel hezkarên wî, gelek kesên ku qet jê heznedikirin jî hebûn.

Di şahiyên bajarên Atînayê di şanoya **<*Ewr*>** ê *(B.Z.423)* ya ***Aristophanesî*** de, tinazên xwe bi Sokrates kirine. Di dawiyê de rêveberên wê demê, bi tawana ku ciwanan ji rê derdixe û baweriya xwe bi xwedayên Atînayê nayne, biryara girtina wî didin. Sokrates tê girtin û darezandin. Di dawiyê de, biryar tê girtin ku bi jehriyê were kuştin. Darezandin û kuştina Sokrates, di dîroka ramanî de ji bo ***tragedyayan*** bûye çavkaniyeke mezin.

Di dîroka ramanî de fîlozofê herî navdar, bêguman Sokrates e. Sebebê vê yekê ê herî mezin jî, helwesta wî ya şikber e. Sokrates, bi şik nêzîkî têgehên felsefî bûye û wan bi awayekî şikber dahûrandiye. Ev helwest û sekna wî, ji wê rojê ve bûye teybetmendiyeke girîng ya felsefeyê. Ji xwe wî jî berê gotiye, ku ez

ne xwediyê dazanîneke erênî me û bi tenê, pirsên min hene. Belam em baş pê dizanin ku li pişt wan pirsên wî, bawerî û ramanên wî yên bingehîn hene û ew bi vî hawî hatine veşartin.

***Yek ji wan baweriyên wî ev bû:*** *<Mirovek dema ku rastgo be, kesek nikare zererekî rasteqîn û mezin bidê. Di jiyana me de, gelek bûyerên pîsadî hene û dibe ku mirov, rojekê hemû mal û milkên xwe wenda bike, yan jî rastî neheqiyekî bibe û bikeve hepsê. Belam piştî demekê, dê ev teşkele biqedin. Bûyerên bi vî rengî, girêdayî qismeta mirov in û rojekê, nema têne serê mirovan. Lê a girîng, pakijiya giyana mirov e û tiştên mayî jî, hewqasî jî ne girîng in. Ji bo mirovekê bextreşiya herî mezin, rizîna (pûçbûna) giyan e. Ji ber vê yekê ye ku berxwedana li hemberî bêedaletiyê, ji bêedaletiyê çêtir e. Çimku tevgerek bêedalet, bêtir zererê dide mirovan. Lewma jî divê em gunehê xwe ne bi mezlûman, lê bi yên ku niheq in û bêedaletiyê dikin, bînin.>*

Ji ber vê bawerî û dazanîna Sokrates, Stoaperest rêz û qîmeteka mezin didin Sokrates û sed salan piştî mirina wî, li ber çavê wan Sokrates dibe xoşewîstekî laîk û lehengekî mezin.

Dîsa Sokrates wiha bawer dikir ku tu kes, bi hemdê xwe û zanetî, çewtiyan *(xirabiyan)* nake. Heke însanek bizanibe ku tevgera wî tevgerek xirab e û têbigihêjê, bêguman dê wiha tevnegere. Na heke însanek bi xirabî tevgeriyabe, ev yek tê wê maneyê ku ji xwe ew tênegihêjtiye tiştê ku dike.

Di encama vê nêrîna Sokrates de, pirs û ramanên wî bûne mijara zanayiyê. Ji ber vê qeneeta xwe ye ku Sokrates bi awayekî bêrawest daye dû bersiva pirsa ***<Edalet çi ye?>*** û gelek pirsên din yên bi vî rengî. Çimku li gor baweriya wî; heke me bi bersiva tiştekê bizaniba, wê demê bivênevê dê em ê bi edalet tevbigeriyan. Di felsefeya Sokrates de, lewma jî mirov dikare bibêje ku lêgerîna zanayiyê û xwesteka erdemîtiyê, heman tişt in.

### Li hemberî xwe rastgo be

Fîlozofekî ji Sokrates navdartir heye yan tune, bi rastî jî mirov baş nizane. Lê fîlozofê ku gotiye divê mirov beriya her tiştî ji bo xwe rastgo be û vê yekê wekî erkekî şexsî nirxandiye, bêguman

Sokrates e. Bandûra vê ramanê, di gelek serdeman de berdewam kiriye û xwe gihandiye roja me jî. Sokrates ji bo gotina rastiyên xwe, mirinê jî daye ber çavê xwe, ji ber tirsa zilimkarên wê demê nereviyaye û bi jehriyê hatiye kuştin. Bêguman, mirov dikare bibêje ku di vî warî de Sokrates pêşengek e. Mesela ***Hz. Îsa*** wiha dibêje: <*Piştî ku te xwe wenda kir, tu bibî xwediyê cîhanê jî feyde nake.*>

Dîsa ***Shekespeare*** jî wiha gotiye: <*Beriya hemû tiştan, li hemberî xwe rastgo be.*> Dîsa mirov dikare bibêje ku di cibicîkirina prensîpa pirsyarîkirina hemû tiştan de, rolê Sokrates ji hemû mirovan zêdetir e. Ji ber ku bersiv jî diketin ber pirsyarîkirinê, bersivên ku ne guncan in jî nayên pejirandin.

Sokrates ji vê yekê dest pê kiriye û bi riya pirs û bersivan, rêbaza diyalektîkê di navenda felsefeyê de bi cih kiriye. Ev rêbaz, ji wê rojê ve li cihê xwe maye û tê bikaranîn. Helbet mirov dikare bibêje ku ji bo hemû cure fêrkirinan ne guncan e. Mesela heke mexseda we derheqê mijarekî de agahdarkirin be, ev rêbaz ne guncan e. Lê ji bo pirsyarîkirinên zanyariyên mirovan, rêbazek bêhempa ye. Dîsa mirov dikare bibêje ku ji bo xurtkirin û geşkirina têkiliyên mamoste û xwendekaran, rêbazek xwedîbandûr e. Bi riya vê rêbazê, mamoste bêtir têdigihêjin astengî *(dijwariyên)* xwendekaran û mamoste berê wan dijwariyan, dide aliyê xwe. Ji vê rêbazê re **<*Rêbaza Sokrates*>** hatiye gotin û îro jî, bi heman navî tê naskirin.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
28.10.2014

**Jêder**

**1-** Antolojiya Feylesofan. Ali Gurdilî. Weşanên Soran.2015
**2-** Profesor Bryan Magee. Kurteçîroka Felsefeyê. Weş. Dost.
**3-** Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015.
**4-** www.felsefevan.org
**5-** Dîroka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Xebateke Çapnebûyî. PDF.

## **Koleyên Azad: Feylesof**
## **Rêzan Erzirom**

Însan weke ajalan bi têrkirinê, bi parastinê nasekine. Dixwaze were hezkirin, dixwaze were berçavan, dixwaze her tiştî fehm bike, derdora xwe bi nav bike. Ev hewla hînbûn û zanebûnê jî helbet bi felsefeyê pêkan e, feylesof dildarê pirsan in, feylesof dîlgirtiyên pirsan in, dîlketineke bi dil e. Felsefe, koletiya fikr û ramana ye, lê ew kole bi dilê xwe dîlketine, koleyên bi dilê xwe şer dikin, koleyên herî şanaz û bextewar in. Feylesof koleyên azad in, cihê ku mirovên azad (!) naçinê feylesofên bi dil diçinê, wek mînak îdeaya Platon, feylesof koleyên wêrek in li hember mirinê jî dev ji rastiya xwe bernadin wek mînak: Sokratê li ber sêdarê jî li ser rastiya xwe maye, feylesof dîn in, dînê biaqilan biaqiltir wek mînak; Nietzsche.

Baş e çima pêdiviya me bi felsefeyê heye?

Ji bo azadiyeke wek koletiya feylesofan, pêdîviya me bi felsefeyê heye. Ji bo em qalikê tirsa fikirînê bişkînin, pêdiviya me bi felsefeyê heye. Felsefe berpirsiyarî ye, ji kulîlkeke nû bişkivî bigre heta rêya kadizê, her tiştî evîndarê xwe bardike; lê evîndar ji vî barî narevin bêhtir dixwazin ev bar giran be, ji bo vî barî, ji bo vê berpirsiyariyê, pêdiviya me bi felsefeyê heye. Em bê felsefeyê wekî teyrekî bêbask, wek şêrekî bêqîl in, ji bo bask û qîlan pêdiviya me bi felsefeyê heye.

**Rêzan Erzirom**
**03.03.2016**

# PLATON Û FELSEFEYA WÎ YA PERWERDEHIYÊ

*'Heke feylesof neyên ser kar yan jî bi felsefeyê nizanibin,*
*êşên me ti caran xilas nabin.'*
***(Platon-Dewlet)***

**Platon kî ye?**

Platon, Berê Zayînê di navbera salên (*427-347)* an de jiyaye û ew bi xwe, şagirtekî Sokrates bû. Ev fîlozof, di cîhana îslamî de bi navê Eflatûn tê zanîn û naskirin. Platon hemû berhemên xwe, wek diyalogên tiyatroyê nivîsandiye û hemû berhemên wî beyî ku winda bibin, gihêjtine dema me. Endamê malbateke esîlzade bûye û baş hatibû perwerde kirin. Di bîst *(20)* saliya xwe de bi naskirina mamosteyê xwe ***Sokrates*** re hewl dide felsefeyê û heta mirina Sokrates, heşt *(8)* salan dibe şagirtê wî. Li ser kuştina Sokrates, bi dilekî şikestî welatê xwe terk dike û piştî donzdeh *(12)* salan, di çil *(40)* saliya xwe de vedigere welatê xwe. Di wan donzdeh *(12)* salan de li ***Megara**, **Misir**, **Sicîlya*** û li ***Îtalya Başûr***, geriya ye. Piştî hatina Atînayê, akademîayekî ava dike, li wir ders dide şagirtan û dest bi nivîsandina berhemên xwe dike.

Di dersan de rêbaza guftegoya dîyalektîkî bikar tîne û hewl dide da ku, eşqa zanayiyê fêrî şagirtan bike û wan mîna fîlozof û desthilatdaran, bigihîne. Ji ber vê çendê jî; di dersên xwe de giraniyê dide rewişt (*ehlaq, sinc, akar)* û siyasetê. Ti caran, danasînên naguher nedaye şagirtên xwe û şagirtên wî li hemberê wî xwediyê yek berpirsiyariyekî bûne, ku ew jî lêgerîna rastiyê bûye. Di çêbûn û xurtbûna ramanên wî de ji bilî bandûra mamosteyê wî Sokrates, bandûra fîlozofên berê jî xwiya dike.

Mîsal: Ji dazanîna Pythagoras, regezên Orpheosiyan girtiye. Baweriya nemirinê, baweriya dinya din, hewl dana zilamên olî ên şîretkar, allegoriya şikeftê û rûmeta Matematîkê, mirov dikare di nava wan regezan de bihejmêre. Herweha bi alîkariya ramanên Parmanîdes bawer dike, ku rasteqînî bêdestpêk û bêwext e û divê ku, hemû guhartin, ji hêla mantîqê ve, wek xapînok werin

pejirandin. Bi felsefeya ***Herakleîtos*** re jî, wiha bawer dike ku her tişt diguherin. Dîsa meriv dikare bibêje ku, di nava fîlozofan de yê ku herî zêde li ser têgeha ***baş*** an ***başiyê*** *(rind, qenc)* rawestiya ye Platon e.

***Berhemên wî yên sereke ev in:***

***1-*** *Dewlet*

***2-*** *Gotûbêj (Diyalog)*

***3-*** *Yasa (Nomoî, Zagon)*

***4-*** *Parastina Sokratesî.*

**Şibandina (Efsaneya) Şikeftê ya Platon Behsa çi dike?**

Di nav nivîsên Platon de beşa herî naskirî ya ku di ***<Dewletê>*** de hatiye nivîsandin, bêguman beşa ***<Şibandina Şikeftê>*** ye. Platon di vê şibandina xwe de rewşa mirovan, nêrîna xwe ya derheqê zanayiya mirovî de û têkiliya wan ya bi rasteqîniyê re bi awayekî giştî û lewnî nivîsandiye.

Li şikefteka tarî, a ku derbaseyeka wê ya gelek dirêj heye bifikirin. Bila qasî hejmareke girtî; ji dest, ling û stûyên xwe, bi qeydan hatibin girêdan. Bila ew girtî, pişta xwe dabin derbaseya şikeftê û bi tenê dîwarê li pêşiya xwe bibinîn. Tiştê ku dibînin, bi tenê dîwarê şikeftê ye û bila temamiya jiyana xwe jî, bi vî hawî derbas kiribin. Û bila haya wan, ji tiştekê din jî tunebe.

Bila li dawiya şikeftê jî, agireke giş û ronak, hatibe vexistin. Di navbera wan û êgir de, bila dîwarekî ku qasî bejna miroveke bilind e, hebe û bila ew bi vê yekê jî nizanibin. Li pişt dîwêr, hejmarek mirovên ku hinek tişt li ser sêrê wan in û wî alî vî alî diçin û tên, hebin. Dengê wan jî, bila bi saya dîwêr olan bibe û bi vî rengî here guhê wan. Platon dibêje girtiyên ku di şikeftê de ne, ew bi tenê sî û dengvedana wan mirovan dibînin. Di vê rewşê de, girtî wiha difikirin ku hemû rasteqînî ew sî û dengvedan in û dê hemû xeberdanên wan jî, li ser wê *<rasteqînî>* û serboriyên wan yên şikeftê bin. Heke yek ji wan girtiyan bikaribe xwe ji qeydên xwe rizgar bike û berê xwe bide aliyê din jî, dê çavên wî ji ronahiya êgir biqemişin, dest û lingên wî bitewizin û dê hiş di serê wî de nemîne. Herweha, dê zû bi zû nikaribe têbigihêje gelek tiştan jî.

Heke zor bide xwe, xwe kaş bike û ji şikeftê derkeve jî, dê kor bibe. Heke demekê li derveyê şikeftê bimîne û piştra bizivire şikeftê, ji ber tariya şikeftê dê dîsa bi awayekî demdemî kor bibe.
Girtiyê ku ziviriye şikeftê, heke ji girtiyan re behsa jiyana derve bike jî dê kesêk tiştekê jê fam neke. Ji bo têgihiştina vê şibandina şikeftê, divê mirov dev ji pêşdaraz û nirxandinên xwe yên rûkalkî û banegehî berdin. Rasteqînî ne serboriyên me ne, lê fikrên di mejî de rasteqînî bi xwe ne.

**Felsefeya Zanayiyê ya Platon**

Platon di serdema pêşîn de yek ji wan fîlozofên girîng e û bi rêya diyalogên xwe, xwestiye ku sistemeka zexim ava bike.

***Felsefeya Platon ya Zanayiyê***

***1-*** *Platon wiha bawer dike ku zanayî, ji zayînê ve tê. Ango wiha bawer dike ku mirov ji zayîna xwe ve xwediyê zanayiyê ne. Di vê baweriya xwe de nemaze ji nêrîna Sokrates ya reenkarnasyona rih ketumet bûye û vê nêrîna wî ji bo ramanên xwe weke bingeh hilbijartiye.*

***2-*** *Platon wiha bawer dike ku giyan (rih) berê cîhana îdeayan dîtiye û carekê din zivirîye dinyayê. Tiştên ku ji bîr kiriye jî, di dema jiyana wî de têne bîra wî.*

***3-*** *Teoriya wî ya bîranînê, xwe disperê teoriya wî ya du cîhanan. Cîhana fizîkî ya ku em têde dijîn, di esasê xwe de cîhaneka qelp (qopî) e û texlîdê cîhana forma (îdea) ye. Form, şeklê herî baş (îdeal) ya heyînê ye. Heta ku afirander jî, vê dinyayê li gor van forman afirandi ye. Hemû heyînên li vê dinyayê, qopiyên dinyaya îdeaya (forma) ne.*

***4-*** *Forma her heyîneke heye. Heta forma heyînên razber (soyut) jî heye. Çawa ku îdeaya darê, pelê û ya rengê sor heye, ya başî û edaletê jî heye. Hemû zindiyên vê dinyayê, para xwe ji îdeayê werdigrin û ji bo ku bikaribin bigihêjine wê, di nav hewl danê de ne.*

***5****- Cîhana îdeayan ji bo ku bi sehekan nayê têgihiştin, bi aqil têne zanîn. Çimku sehekên me bi texlîdên wan re rûbirû dibin û texlîdê wan dibînin. Ji ber vê yekê jî sehekên me, nikarin bigihêjin cîhana îdeayan. Lê dikarin hindek delîlan bidin me û ji ber vê yekê jî sûdmend in. Bi tenê bi saya aqil mirov dikare xwe ji cîhana sehekî rizgar bike û bigihêje cîhana îdeayan.*

***6****- Platon zanayiyê dike sê beş:*

*1- Zanayiya rast*
*2- Zanayiya çewt*
*3- Bawerî.*
*Bawerî di navbera zanayiya rast û zanayiya çewt de ye. Zanayiya rast, zanayiya heyînên rasteqîn (zanayiya îdeayan, zanayiya forman) e û zanayiya çewt jî, zanayiya ku bi rastî tune nin, ne.*
***7-** Li gor bîr û baweriya Platon tegihîna sehekî, zanayiyên çewt didin me. Cîhana sehekî, her dem di nav têkiliyekê de tê têgihiştin û zanîn. Em dikarin bo nesneyeke bibêjin ku ew zer e, sor e, bêhna wê xweş e yan jî hişk e. Belam ew yek, wesfên wê nesneyê ne û bi serê xwe wan nesneyan ranaxin holê. Ji ber vê yekê jî zanayiya rast, ji têgîhînê dernayê.*
***8**- Nexwe, zanayî ew daraz e ku bi rêya aqil û delîlên wê tê hilberandin. Darazên bi vî rengî, zanayiyên forman (îdeayan) diguncînin. Herweha zanayî ne zanayiya yeko yeko ya nesneya ye, ya qada wan a tevahî ye.*
***Çend taybetmendiyên îdeayên Platon:***
***1-** Bêdestpek û bêdawî (ezelî û ebedî) ne.*
***2-** Mitleq in.*
***3**- Raserî sehekên me ne.*
***4**- Nayên guherîn.*
***5**- Ne girêdayê demê ne.*
***6-** Bi çavan nayên dîtin.*
***7**- Bi aqil têne têgihiştin.*

**Felsefeya Heyînê ya Platon**

Li gorî Platon, du dinya hene. Dinya îdeayan û dinya sehekan. Îdea, heyînên esîl in; ezelî, ebedî, bêliv û naguher in. Ev heyîn, ***<îdea>*** bi tenê bi aqil têne têgihiştin. Îdea nimûneyên pêşîn, yên hemû tiştên ku li dinya sehekan hene, ne. Hemû tiştên ku li dinya sehekan in, girêdayê îdeaya ne. Li dinya sehekan, hemû tişt dimirin, bi mirin in. Mesela, mirov dimrin û ji holê radibin. Lê, îdeaya mirov; ti caran namire, ji holê ranabe û nayê guhertin. Hemû tiştên li hawirdor yên ku em wan dibînin, texlîdên *<qopîyên>* îdeayan in. Îdea, nayên guherîn. Lê texlîdên wan, herdem têne guhertin, ji holê radibin û ji celebên cismî ne.

**Platon û Dilêrîna wî ya Perwerdehiyê**

Bandêr û sazûmana sîteyê ya Platonî xwe dispêre xwezayê, bi taybetî jî xwezaya cihana mirovî. Sofîstên yewnana kevnare jî, li ser vê mîjarê mîna Platon fikirîne û lihevhatin û guncaniya sazûmana *(pergala)* siteyê û xwezayê parastine. Herweha gotine ku sazûmana sîteyê, divê li gor sazûmana xwezayê were verastkirin. Çimku li gor dîtin û dinyabiniya Sofîstan xweza, xwediyê sîstemeke taybet e û di vê sîstemê de hêzdar serwer in, xwediyê mafê hikumraniyê ne û herdem, zordestiyê li yên jar dikin. Lewma jî, heqî *(dirustî)* û edalet, li xwezayê peyda nabin û vedîtinên niştecihên sîteyê ne. Belam di vê xalê de, Platon mîna Sofîstan nafikire. Çimku dema Platon dibêje xweza, mexseda wî ne ew xwezaya ku Sofîst behsa wê dikin, e. Xwezaya ku Platon qala wê dike, xwezaya xwiyakirî nîne. Mebesta wî, ***îdea*** bi xwe ne. Lew re ji bo Platon, cîhana girîng ya îdeaya ye û cîhana rasteqîn jî, ew cîhan e. Çavkaniya *(binyada)* wê ramana fîlozofên Sofîst, ku dixwestin ji bo sîteyê bikarbînin, sazûman *(pergala)* xwezayê ya tekoşer bi xwe bû. Heçî Platon e, xwezayê ne weke tiştekê xwiyakirî, belam weke tiştekê ramanî *(îdea)* fikirî ye û edaletê, mîna îdeaya herî gewremend *(raser)* dîtiye.
Bi vê dîtina xwe re jî, edaletê kiriye perçeyekê avahiya *(pergala)* xwezayê. Herweha gotiye ku mînakeke baş ya bandêra *(sazûmana)* îdeal li asîmanan heye û sazûmana asîmanî, ji bo sererastkirina pergala sîteyê jî, dikare were bikaranîn. *(Dewlet, The republic)*
Li gor nêrîna Platon, zanyariya îdeayan ya sazûmana rast û dirist, ji zayinê ve li cem mirov heye û lewma jî, berê mirovan beravajiya gotinên Sofîstan; ku digotin têkoşînek xedar li ser kar e; ber bi rastî, edalet û erdemê ve ye. Zanyariya prensîpên sîteya dadwer û rastgo, ji xwe li cem mirovan ji zayînê ve heye. Lêbelê, zanyariyên ku li cem mirovan ji roja zayînê ve hene, encax bi rêbaza diyalektîkê dikarin werin bikaranîn yan jî têgihiştin.
Em dibînin ku di vê xalê de pirsgirêka sazûmana sîteyê, vediguhere pirsgirêka perwerdekirina rihê mirovî û fêrkirina rêbaza gihêjtina heqîqeta raser *(bilind)*, ku ew jî ancax bi riya mirovên têgihiştî û kamil dikare pêk were. Ew jî ew mirov in ku

têgihiştine zanyariya îdeayan. Ji ber vê yekê ye ku dilêrîna dewleta Platonî, xwediyê saziyeka mezin ya perwerdehiyê ye, ku hemwelatiyên xwe ji hêla ehlaqê ve dixwaze gelekî baş perwerde bike. Di nav fîlozofan de kesê ku yekem car perwerdekirina ciwan û navsereyan parastiye, bêguman Platon e. *(Ebenstein, 1996)*

Li gor dîtina Platon, di her tiştî de a girîng destpêk e. Ji bo rêveberiya sîteyê jî, destpêka herî baş perwerdehî ye. Ji astên hêsan ber bi astên dijwar ve perwerdekirina mirovan, mîna yasayên xwezayê dê riya rêveberiyeke baş ya sîteyê vebikin.

Mînakên bi vî rengî jî nîşanî me didin ku di dilêrîna sazûmana sîteyê ya Platon de, rola perwerdehiyê gelekî mezin û girîng e. Li gor baweriya Platon tiştên li cîhana xwakirî heta ji destê wan tê, îdeayên xwe bi awayekî xwazayî pêktînin û li gor rewşa xwe, vê yekê pêktînin. Darek, nikare îdeaya xwe ji îdeayan çêtir pêkbîne. Tiştekê wiha, derêaqila ye. Belam li cem şexsan û civakan, pêkhatina îdeayan, naşibe pêkhatina îdeayên di xwezayê de. Lewma jî, ji bo ku îdea bikaribe li cem şexsan û li civakê xwe bide der û pêk were, pêdivî bi perwerdehiyeke baş û jidyayî heye. Encax wê demê, îdea dikare derkeve ortê.

Mirovek, heke ji zayîna xwe fîlozof û mirovekê baş be jî, divê bi awayekî şidyayî were perwerdekirin. Heke perwerde nebe, ev yek dikare ji bo sîteyê xeteriyên mezin jî derxe holê. Armanca perwerdehiyê, fêrkirina başî, rindî û jiholêrakirina xirabiya ye. Di encama vê proseyê de jî, ew dibine xwediyê aqilekî kêrdar, ku dê ew aqil jî parastkariya sîteyê bike. Platon, aqil weke sebebê hemû sazûman *(pergalên)* mirovî dibîne û li gor nêrîna wî armanca perwerdehiyê jî, fêrkirina bikaranîna rast ya aqilê mirovî ye.

Di berhema Plaron ya ***<Dewletê>*** de, bernameyeke berfireh ya perwerdehiyê hatiye destnîşankirin, ku li gor wê bernameyê perwerdehiya zarokan di malzarokê de dest pê dike û heta ku mirov navsere dibin bi awayekî şidyayî perwerdehî berdewam dike. Hê di temeneke gelek biçûk de, xelk zarokên xwe teslîmê saziyên dewletê yên perwerdehiyê dikin. Li wan saziyan ji çîrokan dest bi perwerdehiyê dikin û zarok, fêrî bedenparêziyê dibin.

Piştra, mijarên fêrkirina ***<îdeaya başiyê>*** dest pê dike û demekê dirêj, wisa berdewam dike. Di nav zarokan de, hejmareke gelek kêm xwe digihînin asta zanayiyên pirtexlîd û lewma jî, zarokên ku derbasî asta *(dereceya/pola)* perwerdehiya diyalektîk dibin gelekî kêm in, ku ew jî ji zayîna xwe ve xwediyê behremendiya fîlozofiyê ne. Di ***<Dewleta>*** xwe de Platon dîsa gotiye ku divê hemwelatî, bi awayekî teqez xwe baş fêrî sê texlîd zanayiyan bikin. Ew jî ***hesab*** û ***zanayiyên arîtmetîkî, geometrî*** û ***stêrnasî*** ne. Ev sê texlîdên zanayiyê, dê mirovan ji zanyariyên demdemî rizgar bikin û berê wan bidin zanayiyên heyînên xwedayî. Ji ber vê yekê jî ji bo çalakiyên diyalektîkî, ev sê texlîdên zanayiyê weke bernameyekê pêşîn hatine qebûlkirin.

Çawa ku perwerdehî ji bo ewlehiya sîteyê destpêkeke rast be, ***mûzîk*** jî bo perwerdehiyê destpêkeke rast e. Platon dibêje beden bi bêdenparêzî û bi reqsê, rih jî encax bi mûzîkê dikare were perwerdekirin. Armanca perwerdehiya mûzîkê jî, lihevanîna *(guncaniya)* aqil û rih e. Platon bi vî awayî di navbera bandêra sîteyê û mûzîkê de, têkiliyeka xurt ava kiriye. Armanca perwerdehiya mûzîkê ya hemwelatiyan, lihevanîna aqil û rihê mirovî ye. Perwerdehiya mûzîkê, dê yasa û sazûmanê bike taybetmendiyek xweser ya hemwelatiyan. Lew re li gor Platon ti tişt bi qasî mûzîkê li ser giyana mirovî ne bandorkar e, ji ber ku di mûzîkê e aheng û guncanî heye. Herweha, mûzîk temînata sazûmana *(rêkûpêkiya)* sîteyê ye jî. Û divê nobedarên sîteyê, bala xwe baş bidin mûzîkê. Lew re, bêrûmetiya li hemberî yasayan, bi mûzîkê dest pê dike û ji wir jî, xwe berdide nava kevneşopiyên civakê. Ji wir jî, bandûrê li têkiliyên mirovî dike û ya herî dawî jî, di yasayan de xwiya dike.

Binyada girîngiya mûzîkê, felsefeya ***Pythagorasperest*** e. Lew re Pythagorasiyan wiha parastine ku li gerdûnê ahengeka harmonîk heye, yasayên harmoniya mûzîkê bi yasayên xwezayê re di nav têkiliyeke xurt de ne û mûzîk, rê li lihevkirina sazûmana gerdûnê û mirovan vedike. Û mûzîkê, mîna hêzeka mezin hesibandine. Platon jî di bin bandûra wan de maye û guncaniyeke *(harmoniyeke)*

mezin di mûzîkê de dîtiye û xwestiye ku bi riya mûzîkê, rihê mirovî û sazûmana sîteyê, lihev bîne.

Axirê, di felsefeya perwerdehiyê ya Platon de, ji bo sîteyê destpêka *(gava)* herî baş perwerdehî û ji bo perwerdehiyê jî, gava ewilî a herî baş, mûzîk e. Bi qasî mûzîkê, tu tişt bandûreke baş li rihê mirovî nake û mûzîk, ji bo bandêra *(sazûmana)* sîteyê û parastina wê, alaveke *(amûreke)* herî baş û girîng e.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**07.12.2014**

***Jêder***

**1-** *Platon, (Dewlet, The republic)*
**2-** *Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî.*
**3-** *Platon û Perwedehî. Omer Yildirim*
**4-** *Felsefe û Aforîzmayên Platon. Ali Gurdilî*
**5-** *http://www.felsefevan.org/platon-pira-di-navbera-cihana-mirov-u-cihana-neditbar-de.html*

***Têbinî:*** *Ev gotar di hejmara 72an ya Kovara Tîrojê de jî weşiyaye.*

## <u>ARÎSTOTALES</u>
## <u>(FÎLOZOFÊ KU MANTIQÊ FORMÎLE KIRIYE Û NEXŞEYA HEMÛ ZANISTAN ÇÊKIRIYE)</u>

(Arîstotales beriya ramana nedîtbar, nêzîkayîtêdaneke felsefî a ku ji çavdêrî û ezmûnê dest pê dike, damezrandiye.)

Çawa ku *Platon* şagirdê ***Sokrates*** e, ***Arîstotales*** jî şagirdê ***Platon*** e û mamosteyê ***Îskenderê Duquloç*** *(Îskenderê Mezin, Îskenderê Zulqarneyn)* bû. Ji ber vê yekê jî, di ramanên Arîstotales de em ê rastê li yekîtiya çar nifşên ku bi awayekî bênavber berdewam kirine, werin. Bavê Arîstotales doktorê sarayê yê qralê Makedonyayê bû û piştra, kurê wî Arîstotales, dê bibe mamosteyê Îskenderê kurê Phillipposiyê qralê Makedonyayê. Arîstotales, *B.Z.* di sala 384an de, li ***Stageirasê*** hatiye dinyayê. Dema zaro bû, bavê wî çûye rehmetê. Xulamekî, li ma wan wî mezin kiriye û dema dibe 17 salî, ji bo ku perwerde bibe wî dişeynin akademiya Platonî. Arîstotales, qasî 20 salan li akademiya Platon perwerde dibe. Piştra, B.Z. di sala 335an de, li Atînayê dibistana xwe vedike û navê **<*Lykeion*>** ê lê dike. Xirbeyên *(jêmayên)* dibistana ***Lykeionê,*** di sala 1996an de, di dema lêkolaneke arkeolojîk de têne dîtin û ev yek dibe sebebê kelecaneke mezin a navneteweyî. Arîstotales, B.Z. di sala 322an de, di 62 saliya xwe de çûye ser heqiya xwe. Arîstotales, herdem rêz û hurmeteka mezin daye mamosteyê xwe Platon û bandûra wî jî, qebûl kiriye. Ligel vê yekê teoriya mamosteyê xwe ya **<*du cîhanan/îdeayan*>** qebûl nekiriye û li dijî wê teoriyê rabûye. Li gor bîr û baweriya Platon, zanayiyeke ewledar ya vê dinyaya ku em bi sehekên xwe ew dinasin tune, çimku herdem diguhere û nema weke xwe dimîne. Platon gotibû ku zanayiya rast *(ewledar),* zanayiya cîhana îdeaya ye û ku ew cîhan jî, cîhaneke ***eternal*** e. Ango ji dem û war, serbixwe ye. Lêbelê li gor baweriya Arîstotalesî, bi tenê yek dinyayek heye ku ew jî a ku em têde dijîn e û em encax dikarin felsefeya vê dinyayê bikin.

Li gor Arîstoteles dinyaya me dinyayek bandorkar e, herdem balê dikşîne ser xwe û rê, li meraqa mirovî vedike.

*Arîstoteles jî wekî mamosteyê xwe Platon, zanistan kiriye sê beş:*

***1-** Matematîk.*

***2-** Fizîk*

***3-** Metafizîk.*

Zêdetir, giraniyê daye arîtmetîk, geometrî, ezmannasî *(astronomî)* û muzîkê. Nêrînên xwe yên li ser ezmannasiyê, di berhemên xwe; ***Fizîk*** û ***Metafizîkê*** de şirove kiriye.

***Ji bilî van berheman, berhemên wî yên din jî ev in.***

***1-** Organon*

***2-** Li Ser Ezmên*

***3-** Fizîk û Hatina Heyînê*

***4-** Li Ser Windabûnê, ne.*

Di warê felsefeya siyasetê de xwediyê berhema ***Polîtîka*** û di warê estetîkê de jî xwediyê berhemên ***Poetîka*** û ***Retorîkê*** û di warê ehlaqê de jî, xwediyê berhema ***Nîkkomakhos*** ê ye.

**Felsefeya Ehlaqê ya Arîstoteles**

Mirov dikare felsefeya ehlaqê ya Arîstoteles, ji berhema wî <*Ethika Nikkomakheia–Ehlaqa Nikkomakhos*> fêr bibe. Etîka Arîstoteles, etîkeke mebestî ye. Ew wiha difikire ku, hemû tişt ber bi baş ve diqesidin. Ango, <*baş*> ew armance ku hemû tişt, ber bi wê ve diqesidin. Sincdarî *(rewişdarî, exlaqdarî ),* ne ew tevgerên me yên ku ji xwe baş in. Sincdarî, ew tişt e ku mirov nêzîkê <tiştên ji bo başiya mirov in> dike, ye. Arîstoteles, di ehlaqê de başiyê; bi <*tiştên ku ji bo mirovan baş in*> re, bi sînor dike. Tiştê ku ji bo mirov baş e; çalakiya biaheng a ku di navbera rih û başiyê de ye.

Li gor baweriya Arîstoteles jî, mebesta jiyanê bextyewarî ye. Belam, li gorî wî berxwidarî ne tiştekî têgihanî ye. Ew tiştekî wiha ye ku, mirov encax di hemû jiyanê de dikare xwe bigihînê. Ew cûre çalakiyek e û xweş, bi awayekî xwezayî beşdarê wê dibe. Çawa ku bi yek kulîlkekî û bi yek rojekê bitav, havîn neyê; bi demxweşiyekê kurt re jî, berxwidarî nayê.

Arîstoteles, lêdikole da ku fêr bibe ew kîjan jiyan e ku berxwidarîyê ava dike. Di vê xalê de Arîstoteles, behsa çar (4) hêmanan dike, ku ew jî:

***1-*** *Xweşî*

***2-*** *Şanazî*

***3-*** *Dewlemendî*

***4-*** *Jiyana teorîk in.*

Li cem Arîstoteles, jiyana teorîk ango daketina fikirînê, armanca herî bilind e. Arîstoteles wiha dibêje: <*Armanca hemû çalakiyên mirovan baş in û her çalakî, ber bi başiyê ve diçe.*>

Bi vî awayî, pirraniya nirxan *(hêjahiyan)* dertê pêşiya me. Lê, her asta *(derenceka)* heyînê, <*Baş*> ekê bilind a xweser e. Erka *(wezîfeya)* felsefeya ehlaqê jî, di vê xalê de; destnîşankirina a <*baş*> e.

Berxwidariya mirov ya xas jî, tevgera xwedîerdem e.

Di jiyanê de ew kesên ku xwediyê pisporiyeke diyar in, encax ew dikarin bigihêjin bextewariyê. Bextewarî, çalakiya giyana bierdem e ku jiyaneka pispor didomîne. Xweşî *(haz)* jî, temamker û encama hemû çalakiya ye. Xweşiya herî bilind jî, bi raman û tevgerên ehlaqî pêk tên. Daxwaza bidestxistina xweşiyê, mîna weke navajoya *(dozîneya)* jiyanê; tiştekî bêgav e. Belam, bi tenê xweşiya mirovê bierdem, xweşiyekê rasteqîn e. Ji zêdetirê tevgera pratîk, tevgera teorîk êdî mirovî ye. Wekî Platon, Arîstoteles jî nirxên *(hêjahiyên)* giyanê wek nirxên rasteqîn dibîne û wisa jî, wan dipejirîne. Di dawîyê de Arîsto dibêje ku: <*Bextewarî, ancax di wan tevgerên li gor aqil û xwedîerdem de peyda dibe.*>

**Felsefeya Zanayiyê ya Arîstotales**

Arîstoteles damezranerê felsefeya sîstematîk e û bingehên zanista mentîq, metafîzîk û gelek şaxên din yên felsefî ji aliyê wî ve hatiye damezrandin. Di cîhana îslamê de wek *mamosteyê pêşîn* tê nasîn û li cîhana rojava jî, jêre *ustad* tê gotin.

***Mirov dikare felsefeya wî ya zanayiyê wiha şirove bike:***

***1-*** *Wekî mamosteyê xwe Platon, li cem Arîstoteles jî zanayî, encax zanayiya ya tevayî (ya tumelî) ye û zanayiya yên tekane (yekhejmar, tekîl) jî tune. Ew encax dikarin bibin mînakên tevayiyê.*

***2-*** *Arîstoteles cûdahiya cîhana forman û sehekan, napejirîne. Li gor bîr û baweriya wî; form di nav madeyê de veşartî ye û bi awayekî potansiyelî, di naveroka wê de heye. Mesela em bibêjin forma dareka hejîrê, di toximê xwe de ye û pêvojoya heta ku ew toxim bibe dareka qirase û hejîan bide, di toximê hejîrê de bi awayekî potansîyelî heye.*

***3-*** *Li gor Arîstoteles, em bi livokên xwe yên sehekî nêzîkê heyînan dibin. Her livokeka me, xwediyê nesneyeka sehekî ye. Dema ku bi van livokên xwe, xwe nêzîkê nesneyan dikin; ango dema ku em wan dibînin, seh dikin, dest didin wan û hwd. nesneyên me yên sehekî ku bi awayekî potansîyelî li cem me hene, xwe aqtîv dikin û têgihînên me yên ku ji wan tên, dikarin rast an jî çewt bin.*

***4-*** *Têgihiştin, herdem bi ber bi formên zêhnî ve ye û bi formên zêhnî re têkildar e. Têgeh, di darazekî de têne civandin. Belam, ji ber ku têgihiştin xwe disperê têgehên li jêrên xwe û wiha didarizîne, çewtîyekî jî derdixe holê. Lewra têgihîn, herçiqas xwediyê nîrxeka bilindtir e jî, bi rêya têgehan didarizîne.*

***5-*** *Li gor nêrîna Arîstoteles zanayî, zanayiya tevayî ye, zanayiya a gerdûnî ye. Ji bo bidestxistina zanayiyeke bi vî rengî, di destpêkê de divê ciyewaziya cins û cudahiya wê were destnîşankirin. Ji ber vê yekê jî li cem Arîstoteles zanayî, di wesfê zanayiya zanistî de ye.*

***6-*** *Di zanayiya zanistî de şertê pêşîn ew e ku divê mirov bi hilika wî tiştî bizanibe/derxe holê. Dayîna hilika tiştekî jî, bi eşkerekirina sedemê wê pêk tê. Pêzanîna sedemê tiştekî jî, encax bi awayekî rasteqîn bi pêzanîna wî tiştî dibe.*

***7-*** *Arîstoteles teoriya xwe ya çar (4) sedaman pêşkêş kiriye û gotiye ku bi rêya ceribandina van çar (4) sedeman, mirov dikare xwe bigihîne zanayîyê.*

*Ev çar (4) sedem jî ev in:*

***1-*** *Sedemê maddî*

***2-*** *Form*

***3-*** *Sedemê çalak*

***4-*** *Sedemê teleolojîk (sedemê mebestî) ne.*

*Em dikarin van çar sedeman bi mînakeke şirove bikin: Mesela dema ku em peykerekî çêkin, me ew peyker jî çî çêkiribe (ji herîyê, ji mermerê, an jî*

*em bibêjin ji bronzê) ev yek sedemê madî ye. Peykera ku bi şeklekî dertê holê, form e. Peykertraşê ku vê heykelê çêkiriye, sedemê çalak e. Ya dawî jî, me bi çî armancê ew peyker çêkiribe (ji bo firatanê, ji bo xwe, ji bo pêşandanekê taybet û hwd.) ev yek jî, sedemê teleolojîk e. Ango, sedemê mebestî ye.*
***8-** Zanayiya van çar (4) sedeman, ji bo têgihiştina cinsê nesneyê, wê bi kêrî me were. Û piştra, wê em ê bikaribin cudahiya vê cinsê ji yên din destnîşan bikin û danasîneka wê bidin. Mesela pirsa <Mirov çi ye?> wê li gor çar (4) sedeman were şirovekirin, ferqa wî ya ji heywanan wê were destnîşankirin û wê mirov xwe bigihîne encameka/danasîneka wek <Mirov, ew heywan e ku difikire.>*

**Teoriya Made û Formê ya Arîstotales**

Di dîroka felsefeyê de teoriya <*made û formê*> teoriya Arîstoteles e. Teoriya îdeayan ya Platon wek navenda felsefeya wî dihate dîtin. Wekî vê yekê, teoriya *Made û Formê* ya Arîstoteles jî, weke navenda *(xala herî bingehîn)* felsefeya wî tê dîtin. Arîstoteles wiha xwestiye ku sîstemeka mantiqî, zanistî û ku bi temamî xwe dispêre aqil, ava bike.
Ji bo vê yekê jî di serdema xwe de hemû zanayiyên ku mirovan wê demê wan bidest xistibûn, top kiriye û xwestiye ku wan rave bike. Arîstoteles beravajiya Platon, giraniyê zêdetir daye cîhana sehekî ya ku em dibînin, dibihisin û dest didinê. Bi vî awayî jî, Arîstoteles xwestiye ku dinyaya me şirove bike. Platon *(Eflatûn)* jî, wek tê zanîn bala xwe zêdetir daye cîhana ne madî *(îdea/ramanî)*.
Li gor bîr û baweriya Arîstoteles, îdeayên Platon ji cîhana madî cuda ne û dûr in û di warê şirovekirina cîhana madî de jî bêhez in û nikarin cîhana madî şirove bikin. Arîstoteles ji ber van sedeman, teoriya Platon rexne kiriye. Li gor baweriya Arîstoteles îdea weke ku Platon dibêje ne li derveyê nesneyan, war û demê ne. Îdea <*hilika*> hemû heyîna ye û di naveroka wan de ye. Ew wanekên *(nesneyên)* ku em wan bi saya sehekên xwe dinasin, xwediyê hilikeka hevpar in *(formek-lewneka wan heye)* û ev xala hevpar, di nav piranîtiya heyînan de, nûnerê yekîtiyê ye. Ango, yekîtiyê

temsîl dike. Form, di heman demê de şekil dide madeyê û form ew şekl e ku em wê yeko yeko di heyînan de dibînin. Ya ku şekil dide madeyê, ev form e. Di vê xalê de tê dîtin ku Arîstoteles ji bo pirsgirêkên yekîtî, pirranî, naguhêrbarî û çêbûnê, rêyeka nû ya çareseriyê tîne. Made, derfetek *(îmkanek)* e, dibetîyek e, ya ku wek hêz e û ya ku wê bigihêje şeklekî ye. Form jî, vê madeyê digihêjîne şeklekî *(şeklekî dide madeyê)* û wiha dike ku ew dibe tiştekî li holê a bilewn û rasteqîn. Made di destpêkê de ne nesneyeka diyar *(kifşkirî)* e, hê ne bûye <*ew*> an jî <*ev*> nesne. Bi sînor e û hê ne bûye heyîneke misoger.

Mesela perçeyeka ji mermerê, li gor peykereka ku ji mermerê hatibe çêkirin; hê ne hatiye destnîşankirin, hê şekil ne girtiye. Ev bi tenê derfetek e, ku hê ne bûye heyînek misoger. Dema ku li gor forma xwe ew mermer wek peykerekî derkeve holê, wê demê weke heyînek destnîşankirî *(kifş),* ango wekî peykerekî dertê holê. Wek vê yekê, di bingeha hemû heyînan de madeyeka yekemîn *(an jî sereke)* heye û ya ku li gor formên cihêreng şekil digre û dibe heyînên destnîşankirî jî, ev madeya yekemîn e.

Bi vê teoriya xwe, Arîstoteles xwestiye ku guherîn û çêbûna ku di heyînê de pêk tê, ne bi awayekî mekanîk û bi hêzeka ji der; lê ji bandûreka hindurîn û bi awayekî dînamîk *(organîk)* şirove bike. Xwepêkanîna formê ya di madeyê de, tevger *(liv-hereket)* e. Bi vî awayî form, made û tevger, bi hevdu re têne hizirkirin û çêbûna di gerdûnê de, bi vê yekê tê şirovekirin.

Li gor Arîsto *(Arîstotales),* di derketina çêbûnê de çar (4) sedem xwedî bandûr in:

***1-*** *Sedemê madî*

***2-*** *Sedemê forme/lewnî*

***3-*** *Sedemê tevgerîn*

***4-*** *Sedemê mebestî*

Heke em mînaka peykerê bidin: Mermer, sedemê madî ye. Şeklê mermerê, sedemê formel e. Peykersazê ku peykerê çêkiriye, sedemê tevgerîn *(aktîv/çalak)* e. Armanca peykersaz jî, sedemê mebestî ye. Ji bo derketina holê ya peykerê, ev çar sedem peywist

in. Ji bo hemû heyînên di gerdûnê de jî, em dikarin vê yekê bibêjin. Arîstoteles gerdûnê, ji hêla made û formê ve wek giştek qedemebûyî dibîne. Heyîna ku dereceyeka jêrîn e, ji bo heyîneka ku li jora wê ye *(raserê wê ye)*, <*made*> ye. Lê ji bona heyîna ku di binê *(jêra)* wê de ye, form e.

Mesela keresteyên înşaatê li gor xanîyekî, made ne û xanî, forma wa ne. Lê li gor darê, form e. Di binê herî kûr ya vê qedemebûnê de, madeya yekemîn ya ku bi temamî bêform e, heye. Di cîhê herî bilind ya vê qedemebûnê de jî, <*forma zelal*> heye. <*Forma zelal*> ne hewcedarê madeyê ye. Ev bi xwe nalive *(tevnagere)*, lê ya ku madeyê dilivîne, ew e. Têgeha forma zelal ya Arîstoteles, dişibe <*nous*>  yan jî <*qencê herî gewre*> ya Platon.

Bi gotineka din forma zelal, ji bilî xwedê ne tu tişt e. Ew bi xwe nalive, lê ji ber ku gerdûn ber bi wî ve diqeside û berîya wî dike; yeko yeko heyîn dertêne holê, guherîn û çêbûn pêk tên. Ango, xweza û gerdûn, ber bi xwedê ve diqesidin û dixwazin ku bigihêjin xwedê. Xwedê, armanca gerdûnê ya ku dixwaze bigihêjê ye. Felsefeya Arîstoteles ya xwezayê, girêdayî teoriya wî ya ***Made û Formê*** ye. Formên ku di xwezayê de hene, çiqasî nêzîkê xwedê bibin, nirx û qedrê wan jî, hewqas bilind dibe û digihêjin rasteqîniya xwe. Hilkişîna fenomenan ya ber bi xwedê *(bi jor)* ve, bi du awayan pêk tê. Ji bûyerên serberdayî yên li ser rûyê erdê, ber bi esmanan ve bilindbûneka rêkûpêk heye. Wek vê yekê, dîsa rih jî ji cihveguhastineka mekanîk dest pê dike û heta ku zanayiya aqil bidest dixe, hildikişe. Li gor vê nêrîna Arîstoteles heyînên ku di gerdûnê de hene, li cîhê diyar û li qedemeyan *(pêling-ast)* cîh digrin. Li ser rûyê erdê formên herî jêr ax, av, hewa û agir e.

Ev hêman ber bi navendê ve yan jî wek ku ji navendê dûr dibin, tevdigerin. Ax û av, ber bi navendê ve diqesidin. Agir û hewa jî, ji navendê dûr dibin. Li gor vê nêrînê her hêmanek berbiçûneka xwe ya xweser heye, cîhekî wê ya diyar heye û ber bi wê derê ve diqeside. Di vê xalê de mirov dikare bibêje ku di felsefeya Arîstoteles de ji zêdetirê çendanîtiya wê, çawaniya *(wesf)* wê girîng e. Tiştê ku taybetmendiya heyîneke pêktîne û heyînê ji heyînên din

cihêreng dike jî ev taybetmendiya wê ye ku hilik û forma heyînê pêk tîne, ye.

Arîstoteles têkiliya giyan *(rih)* û madeyê jî, li gor teoriya *Made û Formê* dinirxîne. Li gor baweriya fîlozof; laş, made û rih jî, form e.

Guherînên ku di laş de têne dîtin, ji bo derketina holê ya formê ye. Ji ber vê yekê jî destnîşankarê guherînan yên ku di laş de pêk tên, rih e. Ango, form e. Dîsa Arîstoteles dibêje ku armanca jiyaneka bi erdem û ehlaqî, jiyaneka bextewar e. Lê ji bo ku mirovek bikaribe jiyanek bextewar bijî, divê ew hilika ku di nava xwe de ye û forma xwe baş pêk bîne. Lê tiştê ku ji bo mirov taybet e û hilika wî ya resen û armanca wî pêk tîne, aqil e. Nexwe, wê demê em dikarin bibêjin bextewarî rewşeka wisa ye ku encax yên ku aqlê xwe bikartînin û li gor aqilê xwe tevdigerin, e.

Di babeta felsefeya wî ya dewlet û civakê de jî, em dikarin bibêjin ku Arîstoteles li gor Platon, jê realîsttir e. Arîstoteles civakeka îdeal pêşnûma nekiriye, lê li ser dewlet û şeklên rêveberî yên ku hene, bi awayekî kûr rawestiya ye û wan rexne kiriye. Li gor nêrîna fîlozof dewleta herî baş, ew dewlet e ku hemwelatiyên xwe ji hêla ehlaqê ve baş û dirist perwerde dike û wan digihîne, ye. Ji bo vê yekê jî divê dewlet karê perwerdehîyê bixe destê xwe û ew bi xwe vê yekê bi rê ve bibe.

Teoriya Arîstoteles ya zanayiyê jî, dîsa girêdayê teoriya wî ya made û formê ye. Rasteqîniya ku hilik, form û xala hevpar ya heyberan *(nesneyan)* pêk tîne, di heman demê de têgeha wan e. Ev têgeh, têgehek berfireh *(bergehdar)* û tevayî *(giştî)* ye. Ya ku yeko yeko bingeha hemû nesneya ye, ew taybetmendiye ku li cem hemûyan heye, ye. Nesne, yeko yeko ji wê têgeha <*tevayî*> têne holê û peyîtandina/îsbatkirina vê pêvajoyê jî, *karê-erka* zanistê ye. Lê armanca sereke divê ne têgihîştina <*tevayiyê*> be. <*Tevayî*> ji bo ku yeko yeko zanayiya yên tekane/yekhejmar didine me, ew girîng in. Tê dîtin ku Arîstoteles, li gor Platon; di cîhana sehekan de zêdetir girîngiyê dide nesneyên yeko yeko. Ango, nesneyên tekane. Wekî ku me berê jî gotibû, Arîstotelesî di vê xalê de gotiye ku divê zanist derketina nesneyên yeko yeko ya ji tevahiyê, şirove

bike û ev yek, divê armanca zanistê be. Rênîşandarê vê pêkanînê jî, zanista mantiqê ye.

**Li Gor Fîlozof Huner, Teqlîd (Qopî) ye.**

Huner jî li gor bikaranîna tiştên ku teqlîd dikin an jî li gor alavên *(haletên)* ku di dema pêkanîna hunerê de bikar tînin, ji hevdu cihê dibin. Mesela wêje, jiyanê û mirovan teqlîd dike. Ango, bi rêya qopîkirinê ji nû ve dide jiyandin. Di dema pêkanîna vê yekê de jî alavên bikaranîna wêjeyê; peyv, aheng û teql *(rîtm)* in.

**Armanca hunerê, ehlaqî ye.**

Huner wê bi awayekî, hestên mirovan bilind bike û bi vê yekê jî wê mirovan ji tirs û îhtîrasan *(dildariyan)* rizgar bike. Di dawiyê de jî wê rih were pakijkirin û zelalkirin.

Filozof bersiva pirsa <*delal çi ye?*> jî daye û wiha gotiye: <*Tiştekî ku em bikaribin jêre bibêjin ew delal/spehî ye, divê ku ew xwediyê sê taybetmendiyan be: rêkûpêkî, rêje û sîmetrî…*>

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
18.02.2015

***Jêder***

***1-*** *Dewlet. Eflatun. Weş. Akvaryum. Sala 2007 an.*
***2-*** *Arîstoteles. Polîtîka. Mete Tunçay. Weş. P. Remzî. 1983.*
***3-*** *Dîroka Felsefeyê. Prof. M. Gokberk. Weş. P. Remzi. 1985.*
***4-*** *Platon. Ahmet Cevizcî. Sala 2014. Weşanên Say.*
***5-*** *Profesor Bryan Magee. Kurteçîroka Felsefeyê. Weş. Dost.*
***6-*** *http://www.felsefevan.org/*
***7-*** *Dengê felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Dozê. Rêbendan 2006.*
***8-*** *Rêwîtiyeke Zanistî. Ali Gurdilî. Weş. Doz. Sala 1997an.*
***9-*** *Felsefeya Antîk. Weş. Dost. Jean Paul Dumont.*

***Têbinî:*** *Ev gotar di hejmara 73an ya Kovara Tîrojê de jî weşiyaye.*

## Felsefe Du Car Meraq e

**Remzi Şener**

Di dinê de bersiva her tiştî heye (di çarçoveyên vacê de), bawerî ji pirsa bê bersiv re tu car nayê. Di hebûna mirovan heya aniha, mirov her tim di meraqek de û di nav çemê gumanan de xwe dîtiye. Lewra mirov dema li derdora xwe mêze dike, tiştên pêkhatî bala wî dikşîne, dixwaze ji derdora xwe fêhm bike. Ji ber wî jî mirov her tim ti tatêl û gumanan de bûye. Pişt re di hişê mirov de jêpirsîn hatin holê: çima, çawa, ji ber çi… û hwd. Di bingeha felsefeyê de meraq û jêpirs heye û watedar kirina pirs û gumanan heye. Felsefe; zanîna tiştên kesnezanî, bersiva meraq û tatêlên ku di hişê mirovan de û çavkaniya zanîstê ye.

Her mirov dikeve meraqa tiştekî, lê her meraq ne felsefeye, her jêpirsîn ne felsefe ye. Tenê bi çima û çawayê felsefe nayê kirin. Mînak: Dîwarek pirr bilind û bi têlên strî derket hemberê mirovek. Mirovek ji rêzê, tenê pirsa "ev çi ye û çima ev dîwar li vir e" dike. Ev ne felsefeye û ne pirsek watedar e. Mirovê felsefevan, van pirsa dike: "Gelo ev dîwar çima li vir e, kî danî vir, gelo sedema çêkirina vê dîwarê çi ye, pişt vê dîwarê çi heye, gelo çêkirina vê dîwarê bo parastina mirovan e an jî ji bo astengiyê ye." Felsefevan piştî van pirsan riya çareseriyê digere. Ne tenê carek meraq dike, meraqa meraqan dike.

*Pêdiviya me bi felsefeyê heye. Lewra;*

*– Jiyana mirovan watedar dike.*

*– Tiştên keznezanî, di çarçoveya aqil û vacê de çareser dike.*

*– Çavkaniya zanîstê ye.*

*– Mirovan pêş ve dibe.*

*– Ji aliyê kar anîna aqil ve dibe alîkar.*

*– Mirovan jirêzêtiyê derdixe û mirovan dike mirovek aqilmend.*

*– Çavek rexneyî dide.*

Pêdiviya me her tim bi felsefeyê heye, lewra felsefe wateya jiyanê ye, jiyan bixwe ye. Çawa ku di gerdûnê de bi mîlyonan hesare hene û ji bilî dinyayê de jiyan nîne; di dinyayê de jî bi milyonan mirov hene, lê dibe ku felsefe di her mirov de tune be. Ev jî tê wateyê ku her mirov difikire, lê fikra her mirov ji hev cuda ye; çi watedar, çi bêwate… Di nav van mirovan de, mirovên jirêzê jî heye, mirovên ku wateya jiyanê bi felsefeyê watedar dike jî heye. Ji bo paşeroja mirovan û mirovatiyê, pêwîst e ku mirovên aqilmend û gumanker hebin. Ew kes jî ji felsefeyê fêhm dikin. Pêdiviya jiyana mirovatiyê encax bi felsefe û felsefevanan çêdibe , ji ber ku riya rast dizanin û dizanin pirsgirikan çareser bikin. Dizanin biramînin.

**Remzi Şener**

**Wan / 05.03.2016**

***Têbinî:*** *Tehm û lezeta jiyanê di felsefeyê de ye. Pêdiviya mirovan wek nan û avê bi felsefeyê heye. Felsefe; ne gotina peyvên vala ye, ne jî tevlihevkirina hiş e.*

**Pêdiviya Felsefeyê**

**Orhan Agirî**

Mirov bi têgihîştinek pêşîvekirî dihêt nava ve cîhanê ya ku xwe wek giloka sirr û razan radixe ber vê têgihîştin-ramana ku çawa û çimatiya peydabûna wê bixwe jî herî kêm qasî vê cîhanê nepenî û nenas e. Bi gotina Christian de Duve : «Di nav Gerdûnê de, ji bilî Gerdûnê bixwe, sirreke ji ya (peydabûna) ramanê mezintir be tine ye.» Le ev têgihiştin-raman her çi be jî têde vîn û şayişek serwextbûnê heye ku ji xwe û ji Hebûnê pirsa çibûna wateya «Heyîbûn»ê dike him wek qonaxek herî dawî ya rêhildana xwe ya di nava vê Gerdûnê de him jî wek hewlek dîtin û bicîkirina wan nirxên ku divê bi hawayekî herî rûmetdar pêşengiya vê rêwîtiyê bikin.

Ev şayiş di qurmê hemû melekeyên hizirînê de wek êşek ne fizîkî diqilqile, tevdigere. Razîbûna bi hebûna vê êşê û berxwedana li hemberî wê girêdayî pileya hêza iradeyê ya kişandina êşê ye. Reva ji ber vê êşê bi xwe re hewcetiya xwe-spartina bal stargehek aram, amin û statîk diafirîne; ev stargeha aram û statîk jî bi gelemperî dîn , hin caran jî ideolojî ye. Li vir meriv dikare bibêje ku zanist, ol, îdeolôjî û felsefe di nava jiyana mirovan de çar navendên sereke ne, ji pirsyara çibûna wateya Hebûnê re bersiv dihilberînin.

Belam her yek ji van xwediyê erkek taybet e.

Bo nimûne, Niels Bohr dibêje : 'Zanist xebatek e li ser zanayiyê, ne li ser 'heqîqet'ê.'

Zanist hebûnê di nav hemû hîkarî, peyd, lib, dane û objeyên wê de dişopîne heta wî tixûbê ku ev hêman li wir tev li tinebûne dibin. Zanist, ji bo ziyanê nebide aqilê mirovî, xwe kerr dike di wî cihî de ku objeyên wê êdî li wir ji qada têgihîştinê derdikevin derve. Felsefe sekin, hewl û dengek mirovî ye li wî cihî ku zanist têde xwe kerr dike; ol û îdeolojî jî jê dogmatîzm û despotîzma heqîqetên pîroz û sabît diafirînin.

Bi pîvanên rasyonel, bi helwestek rexnegir, bi têgehên razber ve pêkhanîna dahûrandina xwezaya obje û mijarên li ber hizirînê, pê re jî berfirehkirin û pêşvêxistina zanayiyê rêbaza sereke ya felsefeyê ye. Felsefe çalakiyek zihnî ye ku di nava çerxa xwe ya bi zanayiyê digere de hizirinê hînî hînbûnê, hinbûnê hinî hizirînê dike daku hiş di lêgerîna têgihîştina rastiyan de xwe bigihîne ast û pileyên xwe yên herî jor û raser û, wek hêvî û amancekê jî, ji wir jî derbikeve bal wê merheleya ku Hegel jê re dibêje: «wek mutlaqiyeta bûna temamiya rastiyê hilkişîn û bilindbûna bal heqîqetê.»

Felsefe wate û pênaseyên wê ne sabît bin jî kar û peywirek wê ya diyar û neliv heye: şkandin û rûxandina çeper û dîwarên hemû dozên ku jiyan di nav wan de digermixe û dirize…

Çimku ti dozê nekaribûye jiyanê bifetisîne û bilewitîne qasî wê doza ku dibêje hemû rastî û heqîqetên pêwîst li cem min û di bin desteseriya min de ne. Bêguman di bin banê vê Gerdûna bêdawî de hemû cûre axaftinên li ser vê çarenûsa kozmîk watedar in û hêjayî guhdarîkirinê ne, lê bi mercê ku ne xwediyê wê dozê bin ku gotinên xwe wek heqîqetên pîroz bisepînin ser guhdaran.

**Orhan Agirî**

**29.02.2016**

## LI SER PEYVA DIYALEKTÎKÊ ÇEND GOTIN

Di vê nivîsê de min xwest ku ez hinekî bi berfirehî li ser peyva diyalektîkê rawestim û hinekî jî wateya guherîna peyvê, şirove bikim. Çimku ev têgeh ji bo felsefeyê û şiroveyên *(raveyên)* aqlî gellek girîng e û gellek zêde tê bikaranîn. Wekî tê zanîn, di cîhana rojavayê de Herakleîtos wekî damezranerê *(bavê)* ramana diyalektîk tê zanîn û naskirin. Lê eşkere ye ku çavkaniya vê ramanê erdnîgeriya kurda ye û Herakleîtosî, vê ramana xwe ji Mezopotamyayê girtiye û berfireh kiriye.

Peyva diyalektîkê di destpêkê de ji bo hunera guftego û nîqaşê yan jî ji bo, bi rê û rêbazên nakok, hunera qanîkirinê hatiye bikaranîn. Diyalektîk, rê û rêbazeke aqlî ye û şeklekî sepandin û birêveberina aqil e. Dîsa meriv dikare bibêje ku rêbaza diyalektîk û rêbaza Sokratesî, mîna hunerên fikirînê, di Serdema Antîk de rewşên herî çalak yên diyalektîkê ne. Berdewamiya guherîn û livdariyê *(hereketê, tevgerê),* di wê qonaxê de weke diyalektîkê hatiye binavkirin. Ji vê rêbazê re, ku bi rêya vê rêbazê hemû ramanên erênî û neyînî têne bidestxistin, diyalektîk hatiye gotin.

Ji bo ramanên *(berbiçûnên)* Platonî diyalektîk, diyalektîka ramana ye. Li hêla din jî, bi rêya yên sehekî, armanca xwegihandina ramanên bireseran *(heyberan, objeyan, nesneyan)* û xwegihandina zanayiyên nesneyan yên eşkere û naguhêr *(mayende, teqez)* e. Gotina Herakleîtosî ya <*meriv nikare, du caran xwe di çemekî de bişo.*> wekî destpêka danasîna diyalektîkê ya eşkere hatiye dîtin. Têgehên bûyîn û guherînê, di vê xalê de weke du têgehên bingehîn xwiya dikin. Meriv dikare bibêje ku feylesofên Serdema Pêşîn, herçuqasî li hêlên dijber cih girtibin jî, diyalektîkzan in. Mesela bi hêsanî meriv dikare bibêje ku Sokrates û feylesofên Sofîst, bi gelek awayên cihêreng rêbaza diyalektîkê bikar anîne. Lê li gor bîr û baweriya Arîstoteles; damezranerê *(bavê)* ramana diyalektîk ne Herakleîtos e, Zenonê Eleayî ye. Diyalektîka Zenonê

Eleayî, xwe dispêrê texlîdeke ramana zanaviyê *(jê).* Bi rêya çend rêbazên diyalektîk, Zenon bi alikariya çend rêz paradoksan bêderfitiya *(bêîmkaniya)* livdariyê nîşan daye. Li gor bîr û baweriya Zenonî boşî *(çokluk)* û cihêrengiyên li gerdûnê, xapînok in û dişibine xapînokiya livdariyê.

**Hegel û Formîla wî ya Diyalektîk**

Bêguman, feylesofê ku diyalektîkê formîle kiriye, Hegel e. Hegel bi xebat û rêbazên birêkûpêk, diyalektîkê formîle kiriye û xwe gihandiye xebateke felsefî a serkeftî. Li gor vê yekê diyalektîk, bi rêya livdariya sê awayan; ku ew jî tez, antîtez û sentez in, xwe pêkanîna Ramana Mitleq *(Ramana Teqez)* e.

Hegel ji livdariya ramanê dest pê kiriye û diyalektîka ku bi rêya vê ramanê bidest xistiye, ji bo livdariya gerdûnê jî bikar aniye. Lew re Hegelî, *mîna <ramaneke madî, ramaneke cismanî>* li gerdûnê mêze kiriye. Dîsa meriv dikare bibêje ku Hegelî, raman û heyînê, weke hev *(zanavên hev, ozdeşên hev)* dîtiye. Di vê xalê de diyalektîk, pêvajoya berfirehbûna temamiya raman û heyîna ye.

Marks, vê ramanê berovajî kiriye. Di rêya Hegelî de meşiyaye û bi awayekî madî, pêvajoya diyalektîkê nirxandiye. Livdarî *(tevger, hereket)* ji destpêkê ve, bi temamiya têgehên nakok û dijber, hatiye şirovekirin. Li gor baweriya Marks *(Marx)* livdariya madeyê, encama nakokiyên navxweyî ye û diyalektîka ramanê jî, di vê xalê de dengvedana livdariya madeyê ya ber bi hiş *(bîr)* ve ye. Ango hiş, dengvedana *(xweveguhastina)* madeyê ye. Ji ber vê yekê ye ku felsefeya Marksîst, bi navê Materyalîzma Diyalektîk tê binavkirin. Lewma jî em dibînin ku rêbaza diyalektîk, wekî zanista livdariya diyalektîk tê dîtin û nirxandin. Hasilê meriv dikare bibêje bi rêya xebatên Marks û Engels, diyalektîk xwe gihandiye wateya xwe ya îroyîn. Engels, danasîneke diyalektîkê a bi vî rengî daye ku ta radeyekî meriv dikare bibêje ku ev danasîn *(pênase),* danasîneke herî rast û aqlî ye: <*Diyalektîk ew zanist e ku li cîhana der û hişê mirovî*

*de, li zagonên gelemperî (tevdeyî) yên livdariyê digere.*> Bêguman meriv dikare bibêje ku danasîneke bi vî rengî, bi temamî xwe spartiye zanista û berfirehbûna diyalektîkê jî, girêdayî berfirehbûn û pêşveçûna zanista ye.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
28.08.2015

**Jêder**

***1-*** *Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015.*

***2-*** *Felsefeya Hegel ya Dewletê. Macît Gokberk.*

***3-*** *Ferhenga Felsefeyê. Ali Gurdilî. Xebateke Neçapbûyî.*

***4-*** *Destpêka Felsefeyê. Ahmet Cevizcî. Weş. Sentez. Sala 2007 an.*

***5-*** *Dîroka Felsefeyê. Cild 1. Ramanên Damezraner. Weş. Îletîşîm. 2012. Jacqueline Russ, François Jullien, Christian Jambet, Pierre Hadot, France Farago, Jean-Paul Dumont, François Chenet, Anne Baudart.*

**Felsefe, Di Tariyê de Gera Çiruskekê ye**

**Mîr Qasimlo**

Felsefe rêbaza dewlemendkirina zemîn û bêdera bingeha zanyariya mejiyê tekakesî û civakê ye. Civak û kesên xwedî mejiyekî dewlemend ku ‘pirs û gera bersivan’ ji xwe re kirî rûgeh *(kible)* di heman demî de xwedî karektere jî. Karektereke çik, hejwer ku pirosesa temambûna binyada xwe berev kutabûnê ve birî. Karekterekî gumanbar ku bêyî lêpirsînê, bi awayê xuyayî ji ti dîtbariyan bawer nake.

Jixwe li cihê lêpirsîn hebe, li wir hêsta naskirina doralî jî pêk tê û ev pirosesekê ye ku bi xwe re refleksên fêmbar jî diafirîne.

Mesela; Jinekê bi mêrekî re reqisiye, rê daye wî mêrê ku ew ji beden û quzê wê hez bike. Ku ev çalakî bi riyên ne fêrmî pêkhatibe, li gor kes û civakên bêfelsefe; xweşdaber e *(Qehpik)* e. Lê li gor kes û civakên xwedî felsefe û ramanwer, tişta ewil; pirs e. Pirsa sedemên pêkhatina navhatiye. Jixwe pirs destpêka naskirina bûyerê û gera bersivstendinê ye. Naskirina hêla derûnî û rengên seansên jiyana jina navhatî.

Mesela; Ji tebeqeya olî Şêxekî nexwenda, asosyal û bi ser de quzhez rabe zewaca keçikek 9 salî bi sipartina huquqa islamê û biranînên pêşrevên islamê ve girêdayî rewa bibîne, ku reaksiyona li hemberî vê karesetê; *(demekê pêşrevên ola îslamê tistekî dizanîbûn)* be, nexwe ev reaksiyon hîçbûna xwediyê xwe dide diyar kirin. Ku pergala aqil têkçûbe, hebûna ruh û bedenê, di helwesteke wiha budaleyî de nola maşînek bi proxrameke sînorkirî ye. Yanî bi helwesteke wiha ji hikmê aqil dûr, hikara ruhê saf bi qasî bedena mî’yek jî ne bikêr e.

Herwiha, aniha ji serokekî kurd yek rabe û bi adaniyakî forswer bibêje; Ey kurdno, min niha gillika diya we, û ez ê we wek keriyek pez bikarbînim, heke bersiva li hember raberkirina hêrsekî wiha bêrumetker *(Bavo ma çi hêjatiya kîrê te heye ku tu wî dikutî gillika diya*

*me?)* ne be, nexwe di hal û ruhîyeteke wiha de gıyan mirî ye, aqlê ku çavdêrî û sîwana parastinê li rumet û pîvanên însan dike, biloke bûye. Qey pêkan e ku mirî helwestwer bin.

Niha, bi baweriya min kurd dev ji felsefeyê berdin, hê negihane perava wê. Bi tevî ku felsefe herî zêde ji bo kom û civakên bi prensibên jiyanê sed sal li pey civakên xwedî dezgehên xwe birêvebirinê, xwedî sermayeke kulturî, felsefeyî ne, hewce ye jî, mixabin civaka kurd bîr bi hewcetiyeke wiha lezgîn nebirine. Ji ber bîrnebirineke wiha ye ku di rewşa îroyîn ya jiyana kurdan de meriv nikare rastî pêkhatinên rewnaq, guftugohên devkî, nivîskî û atmosferên rêravîker were. Bi zikûpişt zana û nezanên kurd, di mijara felsefeyê, zanyariyê de xwedî kirasekê ne. Yanî di kurdan de, binyadeke rewşênbîrî ku bi awayê pozitif rûneniştiye. Heta meriv nikare bibêje di kurdan de kategotiyekî xweser ya rewşenbîrî heye. Kes û xuyayiyên di nav gurrahiya gel û li ser dika medyayê de wek rewşenbîr tên zanîn, di esasê xwe de asosyal û berdevkin. Sînorê ramanweriya wan heta ber deriyê şêmûka îdeolojiyên dihundirîne ye. Di dewsa xwe bi aktîviteyên xwedî karektereke pêşrev û ronbar ku civak jê sude werbigirin de, biwestînin, qelemên xwe wekî gulleya li devê demançeya rêxistinan bikartînin. Pişta xwe dispêrin rêxistinan û zemîna dijminatiyê di navbera kurdên ku ji aliyê rêxistinan ve hatine parsel kirin de, avadikin.

Ka bêjin? Kîjan rêxistinên olî, sosyalîst û pergalên heyî yên dewletên rojhilat tehemulê civakek ramanwer dikin? Civak û di nava civakê de kesên azad û rewnaqwer, ji bo wan nola şur in. Tehluke û xeternakin. Ji ber ku bo ew dihatuya sistemên xwe yên destpotîk emirdirêj bikin-erê bikudînin, pêdiviya wan bi hevdilên bêvin, bêpirs, bêperspektîf, bêqisawet heye. Ji bo bêhikarkirina sîstemên wiha teng, rewşenbîrên bendên xwe qetandî, xwedî felsefe û bi ramanweriyeke serberdayî dizaynbûyî hewce ye, yan jî yên heyî ciger bi mebesteke wiha nebin, civak bitevhevî dibin zeviya bikarbar ya pergalên dewlet û rêxistinên Rojhilat. Ji ber vê

egerê ye ku-erê em dikarin bi dilhesayî raber bikin ku di gelek mijarên zanyarî, kulturî, dramî, millî, însanî de, helwesta kurdan ji bêhelwestî û bêserîbûna keriye pez wêdetir e. Ji ber ku bêlêpirsîn e. Di têgihiştina bûyerên de qels e, nikare şîrove jî bike. Li hemberî tişt, bûyer, pêkhatin, erdhej û qewmînên bi mezinbûn û razbariya xwe ji kapasiteya lokal ya civakê berfirehtirin de ditewe, axirî jî ber ku tênagihê, îteat dike.

Erê, heke îro di kurdan de hêla îteatkarî rûniştibe, sedema sereke bêparbûna ji hêla nasîner ya felsefeyê ye.

Di kurdan de, di meseleya millî de jî têgihiştinekî gurra bi frenkansên millî tune ye. Hezkirinekî felsefîk a lêger ku deriyên frenkansan li pêşiya veguhertina qedera dihatû û siberoja kurd veke û civaka kurd bi perwazkirineke kûrbin ve ber bi ramanweriyeke bêxayan bibe, tune ye. Tişta heyî ew e ku bi fêmkirineke lokal li ser bêstatûbûn û bênasnamebûnê şerê îdeolijiyan û partiyan e-erê ev geremol bi awayekî muridî-fanatikî tê piraktîzekirin. Halbukî, giyaniyên kurd xwe bi riyên naskirina rasteqiniyê dizayn bikirana, li hember her cure pêkhatinê gumanbar tevgeriyana, guman jê re nîn e ku wê bêyî ji her pêkhatinê re li defa hewarê bixistana, kêliyekê ji dema xwe ji bo bejingkirina fıkra hatî pêşkêş kirin veqetandina. Cihê mixabiniyê ye ku kurd di derbarî vî babetî de ji pileya pasîf ya murîdweriya cemietên îslamî ya îroyîn derneçûne.

Ev ne tenê di mijara siyasetê de wiha ye. Di mijara wêjeyê de jî heman bêserûberbûn û bêasoyetî, bêmejîçelqandin heye.

Di wêjeya me de pir kêm karekterên wek Anna Karenina hene ku em pê xwe li feştiyekî astbilind bişidînin.

Di wêjeya me de mêr ya melenkolîk e, ya şoresgerekî şikesti ye, ya bi qalibê fêrkeriya civakê tecawizkare yan ji axayek e. Di hemû karekterên navhatî de xwîn tune ye. Xwînkirin tune ye. Mekanizmeya hundirin ya bo bejinkirina bagerên ruh miriye. Vegotina çîrokan jî bi derûnekî şikesti ye.

Çima derûniyeke şikestî? Ji ber ku gava giyanî derbarî xirabî û nedilxweşiyên dijî de xwedî aqlekî pirsker û bersivxwaz nebe, dibe êsirê jiyanê, nikare jiyanê bo xwe bike qayika erdem û raseriyê. Jixwe karekterê jin bêkesayet e. Wekî pirogramek tenikî ye. Ku tu pê li pişkoka wê neke, liv lê xuya nabe. Li chê ku liv, hewl, raberkirina tercihan, helwestaravînada li hember neyîniyan nîn be, li wir felsefe tune ye.

Felsefe wekî me got di tariyê de gera çiruskekê ye û ji heyînên rûniştî yên bi sînor heznake. Gava karekterê me ji me re behsa tiştên derveyî tiştên rutin yên nas nekin nexwe li wir ezimantina taritiyê heye. Nexwe li wir hewla zêdekirinê tune ye. Nexwe li wir di meşa şîvereyekî bifettilok de bîr bi riyekî firehtira santral tune ye. Axirî bo di her warî de, ji bo zêdetir naskirin û şîrovekirin û bejinkirina bi mabesta zeftkirina rasteqîniyê yên derbarî babetên sosyal, zanîn, mejiyî û fikrî de, divê kurd konên xwe ji girdekan bigirin berev serejorên lûtkeyan ve bibin da ku di bêdera jiyanê de hikm li darîçaviyên jiyanê bikin.

Di mesela wêjeyê de mesele ne ew e ku em wêje û felsefE wekî du pêdeçûnên sedesed resen yên ji malbatekê dibînin. Lewra aqil û pêdeçûnên gumanbar û ramanwer, hest-dil-dilîniyet du seans û reqsên cihê ne. Erê kul ew e ku çawa di meseleyên din de binyadeke lêger nîn e, di wêjeyê de jî ev wiha ye ku ev lewazî jî ber nînbûna binyadeke sosyal û felsefîk e.

**Mîr Qasimlo**

**10.03.2016**

# LI SER TÊGEHA ERDEMÊ ÇEND GOTIN

Têgeha erdemê, wekî têgeheke felsefî, ketiye zimanê kurdî jî. Herçuqasî, carinan em ji bo <*erdemê*> têgeha <*dilpakî yan fazîletê*> bikar bînin jî, tê dîtin ku di zimanê me de têgeha <*erdemê*> bêtir berbelav e. Bi rêya vê nivîsê, min xwest ku hema bi kurtasî be jî ez hinekî li ser wateya vê têgehê rawestim û pênasiyên çend feylesofên hêja li vir aresteyî we bikim.

Têgeha erdem yan jî fazîletê, meriv dikare bi hêsanî bibêje ku ji tarîxa destpêka felsefeyê ve heye û xweş hatiye/tê bikaranîn. Li ser pirsa *(pirsgirêka)* <*wateya mirovî û jiyanê çi ye?*> bersiva <*jiyaneke xwedîerdem e.*> hatiye dayîn. Li gor vê yekê, bextewarî armanca jiyanê ya bingehîn e û ev yek jî, encax bi rêya erdemîtiyê dikare pêk were. Li gor vê ramanê, erdemîtî jî encax bi zanyariyê dikare bi dest bikeve, yan jî pêk were.

**Erdem di Serdema Antîk de**

Sokrates, Platon û Arîstoteles, gelekî bala xwe dane erdemê û xebatên xwe yên felsefî jî, axlebî li ser vê têgehê pêk anîne. Lewre, ji bo felsefeya ehlaqê jî, têgeha erdemê têgeheke girîng e û feylesofên din jî, gelekî bala xwe dane vê têgehê. Pirî caran hatiye dîtin ku bextewarî û erdem, wekî du têgehên têkildar hatine dîtin û nirxandin. Sokrates dema ku dibêje armanca jiyanê bextewarî ye, mebesta wî zanyarî *(bidestxistina zanyiyê)* ye. Ango li gor Sokrates, encax bi rêya zanayiyê meriv dikare bigihêje bextewariyê yan jî dikare bextewar *(dilşad, bextewer)* bibe. Ji ber vê yekê jî erdemîtî, encax bi zanyariyê dikare pêk were û ev yek jî, dê rê bide bextewariyê. Dema ku Zenonê Qibrîsî erdemîtiyê wekî şertê sereke ê bextewariyê daye pêş, bêguman vê yekê destnîşan kiriye û piştgiriya vê ramanê kiriye. Epîkurosgiran jî, prensîpeke wiha pejirandine û ji bo wan jî, a girîng rev a ji eşê û xwegihandina bextewariyê ye. Epîkurosgiran wiha digotin: <*tiştekî ku dê tu ji ciranên xwe şerm bikî, meke!*> Ev gotin jî nîşan dide ku e wan erdemîtiyê, weke bingeha bextewariyê dîtine û nirxandine. Zanayî

*(bilgî)* mirovan dike dilpak *(xwedîerdem)* û tiştê ku di wateya ehlaqî de rê li ber tevgera rast vebike jî, zanayî ye.
Piştre, tê dîtin ku têgeha erdemê di warê felsefeya ehlaqê de jî dibe yek ji wan têgehên sereke û jêneger. Li gor vê yekê jî erdem, ew têgeh e ku tevgerên mirovî yên rast û dirust nîşan dike, ye. Rastgotiya ehlaqî, bi erdemîtiyê re heman tişt tê dîtin. Rastiya *(rastgotiya)* ehlaqî û erdemîtî, di heman wateyê de tê biklaranîn.
Li derveyî vê pênaseya giştî ya erdemê; felsefeyên ehlaqê jî, dilerîneke cihêreng ya erdemê berfireh kirine. Wateyên cihêreng yên têgehên mîna baş-xirab, rast-çewt û hwd. ku li war û demê xwe biwate dikin, rê li guherîna wateya têgeha erdemê jî vekirine. Di vê çerçoveyê de gellek feylesofan, têgeha erdemê li navenda felsefeyê bi cih kirine. Li gor vê yekê erdem, qesîdîna îrade yan jî daxwaza ber bi <*baş a ehlaqî*> ve ye.
Li gor baweriya Sokrates, meriv dikare erdemê fêrî her kesê bike; lê li cem her kesê di heman radeyî de xwe nade der yan bi heman radeyî pêk nayê.

**Çend ramanên cihêreng yên li ser erdemê**

Erdem, ne sîstema ehlaqî ya olekê yan jî ramanekê ye. Radeya herî bilind, ya asta ehlaqî ye, heta meriv dikare bibêje ku giyan *(rih)* e. Ew giyan e ku erdemê *(erdemîtiyê),* mîna armanca jiyanê dibîne û mirovan digihîne bextewariyê.
Mirovên xwedîerdem *(erdemdar)*, jiyana xwe bi aqlê xwe didomînin û di tevger û biryarên xwe de jî, li gor daxwaza aqilê xwe tevdigerin. Lewma jî erdem, zanayî ye.
Platon erdemê, wekî zanayiyê dinasîne û dibêje, encax bi riya zanayiyê mirov dikarin bibin xwedîerdem. Zanayî jî zanayiya yên naguhêr e, ku ew jî bi aqil tê parastin û zanyar jî ew kes e ku xwe gihandiye zanayiya rast. Bêguman, ew zanayî jî zanayiya îdeaya ye. Di ferhengan de em dibînin ku têgeha erdemê wekî navê gelemper ê <*nefsbiçûkiya ku ji aliyê ehlaqê ve tê pesinandin, cigerdarî û rastgoyiyê*> hatiye pênasekirin, ku meriv dikare jêre bibêje fazîlet jî. Dîsa ji bo têgeha erdemê, <*mezinbûn û berfirehbûna rihê mirovî*> jî

hatiye gotin. Çawa ku me di destpêkê de got, têgeha erdemê ji destpêka tarîxa felsefeyê ve cihê xwe girtiye. Li ser pirsa *(pirsgirêka) <wateya mirovî û jiyanê çi ye?>* bersiva *<jiyaneke xwedîerdem e.>* hatiye dayîn. Li gor vê yekê, bextewarî armanca jiyanê ya bingehîn e û ev yek jî, encax bi rêya erdemîtiyê dikare pêk were. Li gor vê ramanê, erdemîtî jî encax bi zanyariyê dikare bi dest bikeve, yan jî pêk were.

Erdem, hêza xwenûkirinê ye, ewlehî ye. Piştgirî, xweşdîtin *(tolerans)* û nefsbiçûkî ye. Erdem, biryardarî ye, parvekirin e, dilxweşî û xizmeta civak û hawirdora mirovî ye.

Erdem, wêrekî ye. Lihelhanîna aqil û dilê mirovî ye û muhasebeya wujdanî ye. Ji bo muhasebeya wujdanî jî, guhdarkirina dengê dilî pêwist e. Erdem, dadwerî ye, berbiçûna ber bi başî, rastî û delaliyê ve ye. Ji ber vê yekê jî erdemîtî, encax bi riya zanyariyê dikare pêk were, yan jî em bibêjin bi rêya zanayiya rast dikare pêk were û ev yek jî, dê bibe sedemê bextewariyê.

*Erdem, xwe dispêre vê prensîpê:*
*<tiştekî ku dê tu ji ciranên xwe şerm bikî, meke!>*

Erdem tevgerîna azad e, ku tu zordestiyan qebûl nake û di bin tu zordestiyan de pêk nayê. Nîjada mirovî bi riya aqil û îradeya xwe, xwediyê wê hêzê ye ku başî, delalî, rastî û qenciyê hilbijêre. Hilbijartin, di ceribandina jiyanê de têgeheke girîng e. Erdem li war û qadên tundîtuj xwiya nake, xwedîaheng û xwedîpîvan e. Erdem di rêya azadiyê de, rêhevalê wêrekiyê ye. Erdem, xwenasîn û xwezanîna mirovî ye. Têgihiştina berpirsiyariyê û rastgotiyê ye.

***Derheqê erdemê de ramanên feylesofan***

***Friedrich Hegel**: Erdem, hişmendiya heyînê ye.*

***Kallikles:** Erdem, keysa bêhêza ye.*

***Spinoza:** Erdem, tevgerîna li gor aqil e. Bikaranîna hêza xwe ye.*

***Samuel Clark:** Erdem, tevgerîna li gor wesfên xwezayî yên heyîna ye.*

***Aristippos:** Erdem, di bidestxistina zewqê de xwedîpîvanîtî ye.*

***Joseph Butler:*** *Erdem, xwedarezandin e.*
***Immanuel Kant:*** *Erdem ne şuxlekî navajoyê ye, şuxlekî aqil e.*
***Berkeley:*** *Erdem ew raman e, ku ji aliyê ruhê mitleq ve tê nîşandan.*
***Friedrich Nietzsche****: Erdem, hewldan û xebata mirovî ya daxwaza xwegihandina raseriya mirovî ye.*
***Plautus :*** *Erdem, xwe neecibandin û xwekêmdîtin e.*
***Descartes:*** *Erdem di bikarîna a baş de, biryara me ye.*
***Herakleîtos:*** *Gerdûn, heta dawiyê hevqewirandina afirandin û tunebûnê ye. Hemû tişt jî, ji şerê dijberan der diçin.*
***Sokrates:*** *Misogeriya tekane, di zanayiya erdemê de heye. Meriv dikare erdemê fêr bibe. Mirov, ji ber nezaniya xwe xirab in. Erdem yek e, kit e û dabeş nabe. Erdem, xwenasîn û xwezanîna mirov e.*
***Montaigne:*** *Di warê xwe xirabnîşandinê de, nîjada mirovî gelek serkeftî ye. Nêçîra ku me daye dû; ku bi rêya aletan em dixwazin wê bikûjin, em bi xwe ne. Ji bo kuştina mirovan jî, em li meydanên berfireh û ronak digerin.*

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
29.08.2015

***jêder***

***1-*** *Felsefeya Ehlaqê. Etîk. Ahmet Cevizcî. Weş. Say. Sala 2014 an.*
***2-*** *Ji Bo Jiyanê Felsefe. P. Hadot. Werger: Kagan Kahveci. Pinhan.*
***3-*** *Destpêka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Weşanên Soran. 2015*
***4-*** *Dîroka Felsefeyê. A. Cevizcî. Weşanên Say. Stenbol. Sala 2009an.*

## **Hişmendî, Kurd û Felsefe**

**Evîn Berçem**

Pêdiviya me bi felsefê heye. Divê her mirov, li gorî xwe piçek be jî hay ji felsefeyê hebe. Ne ku em xwe zane û serpêhatî nîşan bikin, ji bo ku em ji bin giraniya pirsgirêka jiyanê derkevin û kari bin rêyeke rohnî û rast ji xwe re peyde bikin.

Bi zanetî yan jî bê-hemdî, em ji xwe re prensîba, baweriya jiyanê ava dikin. Gelekan hilbijartin û biryarên xwe li gorî baweriya xwe ya olî ava dikin û gelekan, li gorî çanda civakî; etîk û normên ku ava bûne diherikin ber bi pêşeroja xwe ve.

Ji bo ku mirov bikari be jiyana xwe li gorî bawerî û karaktera xwe ava bike, divê herî pêşî bi neynika felsefê xwe analîz bike. Ji bo ku mîna miroveke azad bifikire jî divê normên civakî, malbatî û siyasî yên ku ji zaroktiya me heta niha li ser me de ava bûye, bi gotina rasteqîn, mejiyên me şûştiye, tespît bikin û bi van pirsgirêkan re werin rû bi rû. Li gelek welatan de fikrên serbest û jiyanên karaktereke azad xetere ye. Mînak; li hin welatan de, dîtinên/ramanên li ser homoseksûaliteyê û redkirina Xwedê dikare bibe sedema kûştinê.

Herweha; em bindest in. Nijadên serdest/dagirker astengiya nasnameya me ne. Zimanê me bi salan qedexe bû û hîna jî derî li ser nasname û zimanê me girtî ye. Ev yek jî bûye sedema ku em civakeke bi êş û pirsgirêk in. Ji bo ku bikevin li ber doza azadîxwaziya me; ol û asîmilasyonê mîna sîlehek bikar anîne û hejmara kûştî, zindankiriyên me, mixabin rûreşiya vî sedsalî ye.

Ji bo ku rihûyeta me, karaktera me bi azad tevbigere, divê em xwe nêzî felsefeyê bikin. Jiyanek bi ramanê felsefe belkî me bêtir bextewar neke, lê gelek pirsgirêkan serrast dike û maneyeke dide hebûna me. Şertên jiyanê yên bingehîn mîna hûrmeta li gel mirova, hezkirina xwezayî û etîka mirovahiyê re jî rohniyek e felsefe.

Weke ku tê zanîn jî felsefe di dîrokê de, bingehiya heman zanistiyê ye. Arjuman û logîk bi ramanên empîrî ve girê dibe û zanistî ji vir ava dibe. Ji bo vê yekê jî ne tenê metodên felsefeyê, herweha teoriyên felsefeyê jî divê.

Bêyî bersiva teoriyên zanyariyê, etîkî û felsefeya ziman neyê dest girtin, bingehiyek jî ji bo tu tezê/zanistiyê ava nabe.

Felsefe mane û perçeyeke jiyanê ye.

**Evîn Berçem**

**07.03.2016**

## KOZMOPOLÎTÎZM Û ÊZDAYETÎ
Ali Gurdilî

Li gor pirraniya ramangir û akademîsyenên felsefeyê yên cîhanê, ramana kozmopolîtîk li civaka Yewnana Kevnare derketiye holê û ji vir jî, li dinyayê berbelav bûye. Têgeha kozmopolites'ê, cara yekemîn *(Beriya Zayînê)* di sedsala 3an de, bi ramanên Diogenes *(Diyojen)* dest pê kiriye, ku wê demê li ser pirsa 'tu ji kija deverê yî?' gotibû ku 'ez hemwelatiyê dinyayê me'. Bi vê gotinê, mexseda Diyojen ew e ku dibêje ez ne endamê tu netewe yan sîstemeka siyasî me. Li vir divê pênase û navê çend şopgirên vê tevgera felsefî jî *(kozmopolîtîzm, kozmopolîtanîzm)* werin dayîn ku meriv bikaribe li ser hinek xalan bikeve nîqaş û guftegoyê. Belê peyva kozmopolîtîzmê, peyveke yewnanî ye û ji hevududana peyvên 'gerdûn' *(kosmos)* û 'hemwelatî' *(polites)* ê pêk hatiye û di wateya 'welatibûna dinyayê' yan jî 'welatîbûna gerdûnê' de ye. Li gor vê tevgera felsefî şexs, endamê yan jî aîdê mirovahiyê ne ku mirovahî jî komuniteyeke mezin e.

Di vê nêzîkayîtêdanê de di dewsa gurzên *(pêwendiyên)* herêmî de, gurzên gerdûnî û ramanên gerdûnî girîng têne dîtin û pejirandin. Herweha li gor vê ramanê temamiya dinyayê, welat û niştiman e. Ji kesên ku van ramanan dipejirînin re kozmopolît yan jî kozmopolîtan tê gotin. Wekî feraseteke ehlaqê jî, di felsefeya yewnan ya Serdema Pêşîn de ji aliyê Kînikparêz, Stoaparêz û Sofîstan ve hatiye parastin. Mesela Arîstîpposê Sirenaykayî, ku parastkar û piştgirekî vê felsefeyê bû, wê demê wiha gotiye: 'Ez nikarim di quncikekî civakê de, xwe êsîr bikim. Lewra, ez biyaniyê hemû devera me.' Piştre tê dîtin ku hinek ramangirên romayî jî, ramana endametiya dinyayê betir berfireh kirine, derxistine pêş û bi fikr û felsefeya xwe, hemû cîhanê wekê neteweya xwe dîtine. Bi qewlê Epîstetos, 'peymana me bi hemû dinyayiyan re ye, ku em tevde birayê hev in. Nexwe, peymana me ne tenê bi kesên nas û

dost, yan jî zengîn û giregiran re ye. Xwe wekê hemwelatiyekê cîhanşumûl bibînin û li gor vê yekê tevbigerin.'

Li ser vê mijarê Seneca jî gotiye ku 'heke hûn bixwazin bijîn, divê hûn ji bo kesên din bijîn.' Wekî ku gelek ramangiran jî destnîşan kiriye, vê felsefeyê yan jî meyla felsefî, bandûreke mezin li dînê filehtî û misilmantiyê jî kiriye. Li vir gellek girîng e û divê were gotin ku haya medeniyeta rojavayê, bi saya wergerên erebî ji fikr û ramanên kozmopolîtîzmê çêbûye û bi vî hawî, ev fikr û raman, li medeniyeta rojavayê belav bûne.

Mesela gotina Diyojen *(B.Z. 412-323)* a ku gotiye 'heke te bizanibûya mala *(xanî)* min çuqasî berfireh e, dê tu ê bizanibûya ku mala te û hemû malên li dinyayê li gor mala min çuqasî bîçûk in; dinya, mala min e û ezmên jî, banê mala min e.' ku wekî danezana wî ya bingehîn tê hesibandin, di sedsala 10'an de (P.Z.) ji aliyê el-Sicistanî ve, li erebî hatiye wergerandin. Maneya vê gotinê têgihiştina wateya gerdûna ku Xwedê ew afirandiye, di çavê hemû mirovan de dîtina mirovahiyê û pîrozweriya hemwelatiya cîhanê ye. Bêguman dînê êzdayetiyê ji vê ramana *(meyla)* felsefî, filehtî û misilmantiyê jî kevintir e. Heta meriv dikare bibêje ku yek ji wan kevintirîn dînê yekxwedayî, êzdayetî ye. Lêbelê, ji ber sebebên nepeniya dînê êzdayetiyê, nebûna metnên wê yên nivîskî, tirs û qedexeya nivîsandina metnên dînî, rê li ber zanîna gelek ramanên ronak û hevpar yên cîhanşumûl girtiye û wekî dînekî nepen hatiye dîtin.

Armanca bingehîn ya vê gotarê, ji xwe ne destnîşankirina kozmopolîtîzma êzdayetiyê ye. Bi tenê destnîşankirina kêmasiyeke mezin ya derbarê vê yekê de ye. Ligel vê yekê jî ez ê hewl bidim ku çend ramanên êzdayetiyê yên kozmopolît destnîşan bikim û li ser têkiliya kozmopolîtîzm û êzdayetiyê rawestim. Wekî dîtineke gelemperî, li vir dikare were gotin ku têkiliya dîn *(ol)* û ramana kozmopolîtîzmê ligel hev tune. Lêbelê, ev gotin dê ne rast be.

Lewre, dibe ku dînek bi hinek ramanên xwe yên bingehîn, dikare bibe dînekê kozmopolît. Li vir faktora herî girîng, felsefeya giştî ya wê olê *(dînî)* ye. Yanî dema ku olek bang li bawermendên xwe dike, ji wan çi dixwaze? Derheqê jiyana komelî de, çi ferman dide? Mirovên ji miletê din, çawa dinirxîne? Gelo di fermanên wê olê de, êrîşkarî serwer e, yan jî xweşbinî û rûmeta li hemberî hemû miletên cîhanê? Bêguman, ji bo me pirsên girîng ev in û divê ku têkiliya êzdayetî û kozmopolîtîzmê jî, di vê çerçoveyê de were nirxandin. Nexwe, bawermendên olekê li hemû deverên dinyayê belav bibin jî, bi dehan zimanên bizanibin jî, heke ew hişmendiya ku hemû biyaniyan weke bira dibîne tunebe, ew nikare bibe olekê kozmopolît. Ruhê kozmopolîtîzmê, di xweşbînî û toleransê de dijî. Tu ola ku têde xweşbînî, xweşdîtin û rûmeta xweza û jiyana komelî tunebe, ew qet nikare bibe olekê kozmopolît. Raman û olên kozmopolît, ew ol in ku parastkarê başiya gerdûnî ne û wê başiyê belav dikin, in. Ango, kozmopolîtîzm, derbirîna ramana welatiya kollektîv û gerdûnî *(cîhanşimûl)* ye.

Ev raman, ev felsefe û ev têgihiştin jî, meriv dikare bibêje ku di ola êzdayetiyê de heye. Li vir dê were gotin ku ola êzdayetiyê, olekê qewmî ye û çawa dikare bibe olekê kozmopolît? Rast e, meriv ji dayîkbûna xwe didin êzdî û kesek nikare, piştre bibe êzdî. Lêbelê ev yek nayê wê maneyê ku êzdayetî, ne olekê kozmopolît e. Gelek ol hene ku deriyê wan heta taqê ji xelkê re vekirîne, lêbelê ne kozmopolît in. Çimku bawerî, dîn û diyanetên xwe li ser biyaniyan ferz dikin. Kesên ku weke wan bawer nakin jî, bi heterodoksiyê têne sûcdarkirin. Bêguman, têkiliya olên wuha bi kozmopolîtîzmê tune û nikare hebe jî. Niha dixwazim ji qewlên êzdayetiyê çend mînakan li vir aresteyî we bikim û em ligel hev, li ser maneya wan bi kûrahî bifikirin.

***Qewleke êzdiyan dibêje:***

*'Amîn Amîn Amîn*

*Tebarek Ellahû idîn*

*Ellahû eĥsenûl xaliqîn*
*Xêra bide şera wergerîn'*

Hemû kar û emelên baş û nebaş *(çê û neçê)* ku li gerdûnê têne ditin, ji xwedê tên. Yanî başî jî xirabî jî, yekser bi vîna *(qudreta)* Xwedê dibe. Ango, xirabiyeke cismanî ya ku dijberiya Xwedê û mirovan dike, tune. Lewma jî, başî û xirabî, herdem ligel hev in. Li vir, ya girîng hilbijartin û rêje *(qas)* e. Dîsa dema ku meriv li jiyana komelî ya êzdayetiyê mêze dike, meriv dibîne ku nirxên rastî, dirustî û qencî, gelekî girîng in û li pêş in. Di civak û ola êzdayetiyê de, sê ramanên ehlaqî û felsefî hene, ku meriv dikare wan wuha bihêjmêre:

**1- Rastî ye:**

Ango, divê meriv rastiyê bibêje, rast tevbigere û karê baş bike.

**2- Nasîn e:**

Nasîna Xwedê û mirovan û di hemûyan de jî, niyeta qenc e.

**3- Fedîkirin *(şermkirin)* e:**

Fedîkirina ji Xwedê û mirovan. Fedîkirina ji karên çepel.
Li vir dibe ku ev sê ramanên felsefî, xwe bigihînin ola Zeredeşt jî. Yanî ramana çêxwaz, gotina çêxwaz û karê çêxwaz.
*(Êzdî û Êzdiyetî, Çiyayê Kurmênc (Efrîn) Mihemed. E. Elî) - Dr.*

Di êzdayetiyê de fayiz, karê çepel, zina, derewkarî, niheqî, tehdeya li ajalan, çepelkirina xwezayê guneh û qedexe ye û li hemberî hemû bawerî û nîjadan rêzgirî heye. Lêbelê, 74 caran fermana wan rakirine û xwestine ku ji kokê ve wan xilas bikin. Mixabin, talukeya ku li ser êzdiyatiyê heye, niha jî didome û berdewam e. Ligel hemû tehde û zordestiyan jî, di êzdayetiyê de herdem tifak û hevkarî li pêş e.

***Qewlek dibêje:***

*'Çûme dîwana wî Padşayî*
*Min lê dîtin xweş û şayî*
*Serê hemuyan tifaq û tebayî'*

Di ola êzdayetiyê de, dijminatiya ol û baweriyên din yên cîhanê qet tune û ji xwe çar olên mezin jî, wekî olên heq têne dîtin û ji pêxemberên wan olan re, rêz tê girtin. Êzdî, bawerî û ramanên xwe yên olî, li ser oldarên biyanî jî ferz nakin û wan xweş dibînin. Heta ji ber vê xweşdîtina vê olê, hinekan ola êzdayetiyê mîna olekê bijarteker *(eklektîk, pinekirî)* dîtine.

Mesela li ser vê mijarê gorbehiştê Osman Sebrî di sala 1943- an de di kovara 'Ronahiyê' de li ser ola Êzdiyan wiha dinivîse: 'Tevî ko derheqê Êzdiyan de heya niha çend kitêbok hatine nivîsandin jî, a rast kesî xwe negihandiye rastiyê, ji ber ko rastî ji ber sebebekê winda bûye. Ew sebeb jî heye îro heznekirina Êzdiyan a ji xwendin û nivîsandinê re ye. Gava ez bi têxistiyên van kitêbokan qaîliya xwe nînim, ne ew e ko zanîna xwe a di vî warî de bi navê rastiyê berpêşî xwendevanan dikim! Êzdî Kurdine xwerû ne û ola wan a îro, ji averûya gelek olan bi hevketiye û hatiye pê. Ji ber vê ye ko dema em bawerî, rê û rêzanên ola Êzdiyan didine ber çavên xwe, bi rehetî tê de şopên olan Zerdeşt, Mûsa û Mihemed tev dibînin. Di nav avanyên han de gelek bi navên peyayên ola Mihened an kesên ko li nik xelkê wê xweyî rûmet in, hatine çêkirin. Xidir, Îlyas, Evdilqadirê Rehmanî, *(Geylanî)* Bilelê Ebeş, *(Bilalê Hebeş)* Habûbê Necar, Indirîsê xeyat, Çêl mêran *(Ereb in)* jî van kesan in. Ev peyayên ko di efsaneyên ola Mihemed de cihekî çak girtine, Êzdiyan wan ju xwe re kirine mal û di mergehê xwe de ji wan re avanî çêkirine. Ji vê xweya ye ko ola Êzdiyan ji ber nexwendinê çiqas gewherê xwe winda kiriye û ketiye bin darê ola Mihemed. Berê reş û Zemzem dîsa du tiştên ko di heca îslaman de şertê hecê ne, Êzdiyan ev jî ji xwe re çêkirine.' *[Osman Sebrî: Ronahî: 19- 20- 21 (1943) Yên vediguhêzîne: Stig Wikander- Weş: Orfeus. Antolojiya Tekstên Kurdî. Çapa nû. Stenbol 1996. R: 101- 112]*

Li vir divê were gotin ku rêzgirtina êzdiyan yên olêncihê, ne ji ketina bin bandûra wan, lêbelê dibe ku ji ber rêzgiriya wan be, ku

hemû olên xwedayî heq dihesibînin. Li perestgehên wan, hebûna sembolên *(gor yan jêmayên taybet)* peyayên olên cihê dibe ku yek ji wan sembolên xweşdîtinê be.
Ev yek, dikare wekî xwedîlêderketinekî jî were dîtin. Dîsa meriv dikare li vir bibêje ku di dema qirqirina ermenan de, êzdiyan bi qasî 20 hezar ermen ji qirqirina Dewleta Alî Osmanî parastine û xweyîtiyê li wan kirine. *(Lescot, Roger: enquête sur les yézıdıs de syrıe et du djebel sındjâr, beyrouth 1938, s. 127 f.)*

***Dîsa qewleke êzdiyan dibêje:***
*'... Xwedêo, tu li heftê û du miletan bêyî rehmê.*
*Serê ser belgiya, girtiyê hebsiya*
*Rêwiyê riya, kesîb, belengaz û êxsîra,*
*Me jî pêra ...'*

Li olekê bifikirin, ku qenciya 72 miletan dixwaze, hewara wan dike û piştre dibêje, me jî bi wan re bisitirîne. Ev qewl bi serê xwe tenê jî, dikare wekî nîşaneke xurt ya kozmopolîtîzma êzdayetiyê were dîtin. Maneya vê qewlê ev e: Em jî yek ji wan mileta ne û ax û ezmana me jî yek e. Bila ti kes nekeve tengasiyê, jar û belengaz nebe. Bêdad bila kes girtî û êsîr nemîne û li cîhanê, bila her qencî û başî hebe. Bawermendên êzdî, ji ber zilm û zora olên din, niha li hemû deverên dinyayê bûne koçber. Lêbelê hemû deverên ku lê dijîn, mîna mala xwe dibînin û rêzgir in. Ji xwe ramana bingehîn ya kozmopolîtîzmê, xweşdîtin e. Hêvî û başiya gerdûnê ye. Ramana hemwelatiya kollektîv û gerdûnî heye. Hasilê, meriv dikare bibêje ku di bawerî û ola êzdayetiyê de gelek ramanên nirxbilind hene, lêbelê neyên zanîn. Tehde û zordestiya li ser vê olê, wuha kiriye ku vê olê deriyê xwe ji derve re girtîye û lewma jî, wekî olekê nenas maye. Raman û felsefeya ola êzdayetiyê hêja ne û dê bibin yek ji wan haveyna civaka siberojê ya gerdûnî. Çimku êzdî, beriya xwe mafê vejiyînê didine yên ne ji xwe. Axirê, meriv dikare bibêje ku heke di gerdûnê de olên kozmopolît hebin,

bizanibin ku ola êzdayetiyê yek ji wan ola ye û dibe ku çavkaniya vê felsefeya hêja bi xwe jî êzdayetî be.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
09.11.2015

***Çavkanî***

*1- http://www.felsefevan.org/kozmopolitanizm.htmln*
*2- http://sabahulkesi.com/islam-kozmopolitizmi-william-gallois/*
*3- https://ku.wikipedia.org/wiki/Êzdîtî*
*4- https://tr.wikipedia.org/wiki/Yezîdîler*
*5- Êzdî û Êzdiyetî, Çiyayê Kurmênc (Efrîn)*
*Dr. Mihemed. E. Elî. PDF*
*6- Kovara Mukaddime. Hejmar 04. 2011. Di nav Êzidiyan de Pratîkên Jiyanê û Têgeha Nasnameyê. Şakire ÇELİK. (PDF)*
*7- Yazınca. kovara werger, lêkolîn û edebiyatê. Hejmar 9. PDF.*
*8-http://www.felsefevan.org/di-civaka-ezdiyan-de-saziya-biraye-axrete.html*
*9-http://www.felsefevan.org/di-civaka-ezdiyan-de-sistema-kaste-2.html*

## FELSEFE, SIRÊN GERDÛNÊ EŞKERE DIKE

## M. ALÎ KUT

Her cara ku mijara me felsefe be, ev pirs derdikeve pêşberî me, fena paradoksekê xwe bicar dike. Ew kesên ku bi vê disîplînê dadikevin, ji bo ku abstrakt û weko xeyalperestan neyên bi navkirin gellek caran dixwazin bi evîdenseke empirîk vêya pêşkêş bikin, mîna disiplînên din. Lê badilhewa ye! Bingehê vê fikirandinê li ser şêweyekî spekulatîf ava ye.

Dema ku em bikaribin vê bi evîdens û emprîk pêşkêş bikin, ji xwe êdî nema felsefe ye. Hemî ilm û zanist ji fentezî û lêgerînên spekulatîf û subjektîf destpê kirine, di çendî heyam û merhaleyan re derbas bûne ta ku gihiştine û di beşa xwe de bûne otorîte, aha ev prosesa pêşin beşa felsefê ye. Bi gotineke din em dikarin bibêjin felsefe dayika hemû ilman e.

Hemî hevîrê ilm û zanistê di teşta felsefeyê de hatiye sitirandin. Evîya yek ji pêdivîyên felsefeyê ê herî girîng e. Wekî din em dikarin bibêjin ku felsefe sirên gerdûnê eşkere dike! Di felsefeyê de heqîqeteke abadin tune ne. Ew beşê gerdûnê ku em dibînin û hîs dikin yê herî kêm û hindik e. Bi keşifkirina rontgenê em serwext bûn ku dunyayeke din ya tiştan heye. Gerdûn bi kodên nepen ve tijî ye û em incex bi metodên ku felsefe dide ber me, dikarin van kodan deşîfre bikin.

Ji bo me kurdan girîngiyeke din ya felsefeyê jî ziman e. Felsefe ziman dikemilî ne. Ziman dibe yê fikirandinê jî, ango zimanekî entellektuelî ava dibe, xurt dibe. Bi kurtî felsefe xezîneyeke fikrê ye, xwedîyên xezîneyeke welê ê ne tenê serkeftî bin ê xwedîyên dîrokê bin jî.

**M. Alî Kut**

**03.03.2016**

## Felsefe, Awayekî Hêjayê Ramînê ye

## Raif Yaman

Felsefe awayekî hêjayê ramînê *(think)* ye. Piraniya netewên bi serê xwe, serbest, serdest, dadwer, demokrat, hemdem û sosyal ên cîhanê netewên xwedî felsefe ne. Çimkî merivên bi felsefê diramin dizanin ku riya rastiyê ne yek e. Ji gelek riyên rastiyê haydar in û jê têra xwe berhem digirin. Dema bi yekê negihên armancên xwe, yên din diceribînin û di dawiyê da ji xwe ra riyeke serketinê peyda dikin. Ev netewe jî yek caran xwe şaş dikin û dikevin. Lê bi riya felsefa xwe, dizanin ji cihê ketine rabibin ser xwe. Netewên grek, çîn, germen, frenk, hîndî, pers, polonî û etc. di vî warî da çend nimûnên hêja ne. Netewên bê felsefe netewên qels in. Nikanin jiyaneke xweş bijîn. Piraniya wan bi sîstemên dîktator û totalîter tên îdarekirin. Jiyaneke dojehî dijîn. Dema dikevin jî pir caran nikanin rabibin ser xwe. Dibin berdest û bindestên netewên serdest. Bi hêsanî dev ji hêjahiyên xwe yên netewî berdidin. Bi navê dîn, hemwelatîtî, entegrasyon û etc. di nav netewên serdest da dihelin. Piştî demek bindestiyê hebûna wan a netewî bi dawî dibe. Bi hezaran gel û bi dehan netewe ji ber ku xwedî felsefeyeke netewî nebûne di sergoyê dîrokê da cihê xwe girtine. Tarîxa merivahiyê ji gel û netewên weha dagirtiye.

Netewa kurd neçar e rojekê bi pêş da dawiyê li berdestî û bindestiya xwe ya berdewam bîne. Ji bo bikanibe vê rast pêk bîne, pêwîst e felsefa Baba Serhengê Dewdanî, Ehmedê Xanî û Hecî Qadirê Koyî ji xwe ra bike bingeha felsefa netewî, ji fîlozofên dinyayê qenc têbigihê. Bi vê rê kurd dikanin mîna netewên bi rûmet ên cîhanê felsefê ji xwe ra bikin awayê ramînê; zanînê *(science)* ji xwe ra bikin awayê lebat û kirinê; jîna azad û bi şeref ji xwe ra bikin pîvana jiyanê, û li bin ala xwe ya rengîn, li dewleta xwe ya bi serê xwe, serdest, hemdem, sosyal, dadwer û demokrat bi serbestî jiyaneke xweş û bi rûmet bijîn.

**Raif Yaman / 03.03.2016**

## KÎNÎZM Û FEYLESOFÊN KYNÎKÎ (DIJBERÊN CÎHANA KEVIN)

Di dîroka felsefeyê de, em dibînin ku ji aliyê feylesofan ve dema felsefe hatiye kirin, piştî demekê ji wan felsefeyan hinek bûne felsefeyên sîstematîk û mîna dibistaneke felsefî, bi sedê salan hebûna xwe berdewam kirine. Bi vî awayî jî, mîna dibistanên *(ekolên, ferasetên)* felsefî hatine dîtin û pejirandin. Ferasetên felsefî yên Serdema Antîk, herçuqasî li gor hinek şert û mercên wê demê û pîvanên demkî bi navên cihêreng hatibin binavkirin jî, meriv dikare wan bi awayekî gelemperî wiha jî bisinifîne:

***Dewra Beriya Sokratesî***

**1-** *Dibistana Mîletê*

**2-** *Dibistana Efesê*

**3-** *Dibistana Eleayê*

**4-** *Pirranîparêzî*

**5-** *Dibistana Atomgiran*

**6-** *Feylesofên Sofîst*

***Felsefeya Yewan ya Klasîk***

**1-** *Sokrates*

**2-** *Platon*

**3-** *Arîstotales*

**4-** *Felsefeya Helenîstîk*

**5-** *Şikparêzî*

**6-** *Stoaparêzî*

**7-** *Epikurosparêzî*

**8-** *Kînîzm (ing: cynicism, fr: cynisme)*

Kînîzm, dazanîna Gorgiasê Sofîst û Antisthenesê şagirtê Sokrates e. Antisthenes, li Kynosarges Gymnasion'ê dibistana xwe ava kiriye. Wiha tê bawerkirin ku navê peyva dibistana Kînîzm'ê, ji peyva 'kyon' ê hatiye, ku wateya wê jî 'kûçik yan jî kûçikî' ye. Ji ber vê yekê jî, dibistana Kînîzmê di loda *(koma)* dibistanên Sokratesî de tê dîtin û nirxandin. Antisthenes wiha bawer kiriye ku mirov encax bi rêya erdemê yan jî bi saya erdemê dikarin

bextewar bibin û ev erdem jî, encax bi redda xweşiyên dinyewî *(malhebûnî, malbat, dîn, irf û adet û nirxên civakî)* dikare pêk were. Lêbelê, kesê ku Kînîzmê baştir daye nasandin, bêguman Diogenes e. Çimku Diogenes, li gor dazanîna Kînîzmê jiyaye û destê xwe ji xweşiyên dinyewî şûştiye. Dîsa tê gotin ku jiyana xwe di bîdonekî de derbas kiriye û xwestiye ku nebe hewcedarê hilberên civakî.

*(Feylesofên kynikî, li dijî hemû irf û adetên civakê derketine û li hemberî wan serî hildane. Piştî hilweşandina bajarê Atînayê çar dibistanên felsefî -Kînîzm, Septîsîzm, Epukurosparêzî û Stoaparêzî- derketine holê, ku dibistana kynîkiyan jî, yek ji wan e.)*

**Felsefeya Kînîzmê**

Kynîkiyan xwestine ku destê xwe bi temamî ji pêdiviyên civakî bişon û nema li gor civakê bijîn. Ji ber vê yekê jî, bi nêrîneke nebaş li zewac, malbat, malhebûnî, irf û adetên civakî mêze kirine û li dijî wan rabûne. Prensîpa wan ya sereke û herî girîng, erdem e û ji peyva erdemê jî, fahma azadiya mirovî û serbixwetiya derûnî dikin, ku jiyana xwe jî li gor vê yekê berdewam dikirin. Bêguman, têgihiştineke bi vî hawî, encax bi zanayiyê *(zanînî)* dikare pêk were, wate meriv encax bi zanayiyê dikare xwe ji pêdiviyên civakî rizgar bike. Ji bo wan zanayî û ehlaq, ne prensîpên nedîtbar in, lêbelê ew prensîp in ku bi awayekî berbiçav divê werin jiyîn û sepandin. Lewma jî, Ji bo wan, kesayetiya Sokrates mînakek baş e û rêz lê tê girtin. Li gor baweriya Kînîzmê divê meriv bi tenê xwe bispêre xwe, da ku têra xwe bike, wate bikaribe jiyaneke xwedîerdem bijî. Civakîtiya ku mirovan li dijî xwezayê berfireh kirine, beradayî ye û bi kêrî tiştekê nayê. Ji bilî ve yekê, mirovan bêesl jî dike û dibe sebebê dejenerasyonê. Li dijî vê dejenerebûnê jî, jiyaneke sade û siruştî diparêz in.

**Dibistana Kînîzmê û Skenderê Duquloç**

Skenderê Duquloç ku Şagirtekî Arîstotales e, bandûrek mezin li dîrokê kiriye, dîrokê guherandiye û felsefe jî, ji wê guherînê gelekî

ketumet bûye. Skender di demekê gelek kin de beşeke mezin ya Bakurê Afrîkayê, Rojhilata Navîn, Îtalya û Hîndîstanê dagir kiriye. Dewletên bajarî yên yewnan hilweşiyane û ketine bin serweriya împaratoriya Skenderê Duquloç û ji hêla çandî ve jî, serbixwetiya xwe wenda kirine. Skender li hemû deverên ku dagir kiriye, bajarên nû ava kiriye û ji Yewnanîstanê, yewnaniyan aniye û li wan bajaran bi cih kiriye û ji wan bajaran, artêşa xwe îdare kiriye.
Pirraniya koloniyan, bi jinên xwecîhî re zewicîn û nifûsa bajaran, gelek zû hate guherîn û bû kozmopolît. Lêbelê ethosa rêveberiyê û zimanê bajaran, her wekî xwe û yewnanî ma. Di dawiyê de jî, temamiya cîhana kevin ji aliyê bajarên yewnan ve hatine birêvebirin. Ev dinya jî, wekî dewra *(cîhana, dinyaya)* Helenîstîk tê zanîn. Di wê dewrê de bajarê herî girîng, bêguman li Misrê bajarê Îskenderiyê ye ku navê xwe ji Îskenderê Duquloç girtiye. Ev bajar, di demekê kin de bû navenda çanda navnetewî û perwerdehiyê.
Dîsa meriv dikare bibêje ku kitêbxaneya Îskenderiyeyê, **(1)** yekemîn kitêbxaneya navnetewî ye û di navbera salên B.Z.290-P.Z.646'an de, nêzîkî hezar salan xizmeta feylesof, lêkolîner, ramangir û xwîneran kiriye. Herweha wekî kitêbxaneya herî zengîn û giranbiha, ya cîhanê jî hatiye hesibandin.
Heyama Helenîstîk B.Z. di sedsala 4an de bi hilweşandina bajar dewletên yewnanî dest pê kiriye û heta damezrandina Împaratoriya Romayê *(B.Z. sedsala 1'ê)* 300 *(sêsed)* salan berdewam kiriye. Di wê demajoya sêsed salan de, çand û medeniyeta yewnanî li hemû deverên cîhanê belav bû û Komara Romayê jî, di rewşeke wuha de hate damezrandin. Herweha, filehtî jî li vê cîhanê derketiye holê. Wê demê, Filîstin jî mêtingeha Romayê ye û lewma jî, Ehda Kevin bi yewnanî hatiye nivîsandin.

*'Rast e. Heke ez ne Îskender bûma, min dixwest ku ez Diogenes bim.'*
***(Îskenderê Duquloç, Îskenderê Mezin, Skenderê Zûrqerneyn)***

Piştî mirina Skender, împaratoriya wî hilweşiya ye û şerên hizbî dest pê kirine. Herçuqasî yekîtiya wan ya çandî berdewam bike jî,

dawiya dubendiyên siyasî nedihat. Di vê dewrê de çar dibistanên felsefî derketine holê, -Kînîzm, Septîsîzm, Epukurosparêzî û Stoaparêzî- ku dengvedana taybetmendiyên vê dewrê ne. Ev çar dibistanên ku me qala wan kir, herî zêde li ser ewlehî û bextewariya mirovî rawestiya ne û ji bo mirovên medenî li rê û rêbazên ewle, aram û xwedîîstîkrar geriyane. Cara yekemîn, Kynîkî **(2)** derketine holê û di dema me de jî, meriv dikare wan wekî mirovên 'dijraber, nelirê' bihesibîne.
Antisthenesê kalikê wan, şagirtê Sokrates û hevdemê Platon bû. Heta ku bûye mirovekî navsere, di pergala arîstokrat ya feylesofan de, imrekî xweş derbas kiriye. Lê piştî mirina Sokrates û hilweşîna bajarê Atînayê, dilsar bûye û xwe daye alî û jiyanek sade û aram jiyaye. Piştî demekê jî libasên rêncberan li xwe kiriye û di nav xelkê feqîr de jiyaye û gotiye ku ez ne hikûmetê, ne zewacê û ne jî mulkiyetê dixwazim. Diogenes (B.Z.404-323) jî şagirtekî Antisthenes e û piştî demekê, jê zêdetir hatiye naskirin. Diogenes di nav gel de digeriya û bi zanetî tinazên xwe bi irf û adetên wan dikir, ji hinek kincik mincikan ji xwe cilan çêdikir, wan li xwe dikir û bi vî hawî wan şaş û ecêbmayî dikir. Bi kurtasî, meriv dikare bibêje ku mîna kûçikekî jiyana xwe berdewam kiriye. Ji ber vê yekê jî, yewnaniyan navê 'kynîkî' lê kirin *(ji kynîkos'a yewnanî),* ku di wateya 'kûçikî' de ye. Ev peyv, di roja me de jî tê bikaranîn, lêbelê wateya wê hatiye guherîn.

*'Ez hemwelatîyekî cîhanê me.'*
***(DÎOGENES)***

Diogenes û şopgirên wî, di wateya îroyîn de nae kynîk bûn, baweriya xwe bi dilpakiyê *(erdemê)* dianîn û prensîpa wan ya esasî ev bû: Têgihiştina herî girîng, di têgihiştina ferqa nirxên çewt û rast de ye û cudahiyên din jî, pûç û vala ne. Mesela mîna ferqa ê min û ê te, ferqa tazîtî-ne tazîtiyê, taybet-fermî, xav-pehtî û hwd. hemû adetên civakê, bêwate ne. Diogenes ferqa di navbera

yewnanî û biyaniyan de jî, bêwate dîdît û li dij derdiket û dema ku welatê wî jê hatiye pirsîn, gotiye ku 'ez hemwelatîyekî cîhanê me.' Dema ku vê gotine kiriye jî, tenê peyveke yewnanî bikar anîye, ku ew jî 'Kozmopolitan' e. Ji bo vê peyvê jî, em deyndarê Diogenesî ne. Derheqê Diogenes de gelek çîrok û rîwayet hatine gotin, lê di nav wan de a herî navdar ev e: Dibêjin Diogenes di quleke ku dişibe ya mişkan de dijiya û rojekê Skenderê Duquloç diçe serdana wî û jê dipirse, dibêje: 'Daxwazeke te heye yan na?' Li ser vê pirsa Skender, Diogenes jêre wuha dibêje: 'Belê. Li ber min sî neke, bes e.' Bêguman, mebesta gotina wî mecazî bûye û xwestiye ku bibêje mal û milkê dinyayê, bêqîmet in û pêdiviya min bi tiştekê tune.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
15.02.2016

***jêrnivîs***

***1-*** *Kitêbxaneya Îskenderiyeyê, yekemîn kitêbxaneya navnetewî ye û di navbera salên B.Z.290 - P.Z.646'an de, nêzîkî hezar salan xizmeta feylesof, lêkolîner, ramangir û xwîneran kiriye. Herweha wekî kitêbxaneya herî zengîn û giranbiha, ya cîhanê jî hatiye hesibandin.*

***2-*** *Kynîk, di wateya kûçikî yan kûçikaniyê (kyon) de ye û ji bo feylesofên ku piştgirê dibistana Kînîzmê ne, tê gotin. Diogenesê Kynikî, wateya vê gotinê wuha şirove kiriye: 'Ji min re dibêjin kûçik; çimku ji kesên ku hestiyan didine min ez dûvê xwe dihejînim, ji kesên ku pehînan li min dixin re diewtim û ez kesên bênamûs jî, gez dikim.' Peyva Kynikî, di roja me de jî tê bikaranîn, lêbelê wateya wê hatiye guhertin.*

***Çavkanî: Dîroka Felsefeyê. Ali Gurdilî. Xebateke Çapnebûyî.***

**Hevpeyvîn Bi Konê Reş re**

'Mirovekî Kurd im Ji sala 1514 an ve Ta roja îro; Di kul, êş û janên Gelê xwe de diponjim Xemxur û zikêşê Zimanê dê û bavê xwe me; Yekim, ji wan kesên ku, Li dor malbata Bedirxaniyan Dixepêrim. Ez Konê Reş im.'

**(Konê Reş)**

Demekê dirêj e ku min dixwest li ser navê malpera www.felsefevan.org ê ez ligel kek Konê Reş hevpeyvîneke pêk bînim û ji desta yekem, derbarê wî û xebatên wî de, xwe bigihînim hinek zanyariyan. Axirê vê dawiya min ji kekê Konê Reş rica hevpeyvîneke kir, mala wî ava be wî jî nego na û vê daxwaza me qebûl kir. Heçî em baş dizanin ku kek Konê Reş, di bîr û raya kurdî de mirovekî gelek naskirî ye û bi xebatên xwe yên hêja, di dilê me teva de konê xwe vedaye. Ligel vê yekê jî, ez hêvîdar im ku em ê karibin hevpeyvîneke ku bi dilê we be, pêk bînin.

**Ali Gurdilî:** Kekê hêja, di destpêkê de li ser navê xwe û xwendevanên malperê, ez gelekî spasiya cenabê te dikim, ku te vê daxwaza me erê kir. Mala te ava be.

**Ali Gurdilî:** Heke ez ne çewt bim, berhema te ya yekemîn 'Serpêhatiyên Mîran' e ku di sala 1991an de hatiye weşandin. Baş e, te çi demê dest bi nivîsandina kurdî kir û yekem car, tu bi kîja xebata xwe derketî ber raya giştî?

**Konê Reş:** Hezkirina min ji zimanê Kurdî re ji gundê min Doda destpê kiriye. Ev gundê ku, kesî jê ne bi zimanê Erebî û ne bi zimanê Tirkî zanîbû. Di nav wê trajîdiya zimanî de mezin bûm, min xwend û bi giyanekî Kurdperwerî hatim xwedî kirin. Nizanim çilo min dîwana Melayê Cizîrî peyda kiribû?! Di sala 1973'an de jî, min dîwana Cegerxwîn (Kîme Ez?), peyda kir û çend carekî bi seydayê Cegerxwîn re rûdiniştim. Hingî, min jî wek tevayî nifşê xwe, hin caran bi zimanê Erebî dinivîsand. Carekê min

jê pirsî; Seyda! Tu bi zimanê erebî an bi zimanê kurdî bêtir karî binivîsînî û his û hestê xwe bînî der? Seyda Beşişî û li min vegerand; bi Kurdî. Ji wê hingê ve nivîsandina bi zimanê kurdî niqutî dilê min.

Di sala 1977'an de li Almaniya Rojava, bişahî çav bi rojnameya (Roja Welat) diketim, bi Kurdî û Tirkî bû. Piştî vegera min Qamişlo di sala 1978'an de, min dest bi nivîsandina Kurdî kir, belê di warekî biçûk de bû, ji ber ku ziman qedexe bû.

Jixwe, berî ku ez herim Almanya, çûn û hatina min li cem van ronakbîr û zanayên kurdan hebû wek: Cegerxwîn, Mele Hesenê Kurd (Hesen Hişyar), Osman Sebrî, mala wî li Şamê bû û vê paşiyê Rewşen Bedirxan, Seydayê Tîrêj...

Di 12 êlûna 1980'î de, piştî derbeya Kanan Averîn li tirkiyê û hatina kerwanê xortên şoreşger ji bakurî welat bajarê Qamişlo, diçûm cem wan.. ji min werê ew bi her tiştên ziman û rewşenbîriya kurdî ji me bêtir zanin..!

Di destpêka salên de jî, rehmetiyê Samî Abdulrehman Partiyek li Sûriyê demezirandibû, partiya wî kovarek bi navê (Pêşeng), bi zimanê kurdî û rojnameyek bi navê (Gel), bi zimanê erebî diweşand. Dikarin bibêjim ku, carekê an du caran berhemên min di wê kovarê de hatin belavkirin.

Di sala 1984'an de, bi koçkirina seydayê Cegerxwîn re, min ev helbest derbarî koçkirina wê nivîsand, belê ev ne nivîsa min ya pêşî ye:

Va Cegerxwînê delalî
Xatir ji me xwest û çû
Li dûriyê der bi derî
Serxwebûn kula dil bû
Nav û dengê vî hozanî
Li cîhanê belav bû
Weke Taxûrê Hindokê
Ew Cegerxwînê kurda.

Bi rastî, bi hatin û naskirina ronakbîrên Kurd ji Ermenistanê, çavên min bêtir vebûn û zimanê Kurdî bi min şêrîn bû. Min ji tevan, sûd

wergirt û hezkirina ziman bi min re mezintir bû. Belê ez bêtir ji Dr. Celîlê Celîl fêrî danheva zargotina kurdî bûm. Ez wî, wek mamostayekî ji xwe re, di warê eşq û danheva folklorê kurdî de dibînim. Di warê nivîsandina gotaran de jî, ez ji (Tîr) ya Musa Anter ewa ku di rojnameya WELAT de li Stenbolê dihat weşandin û ji (Bexçe) yê Kemal Burkayî (Ferhad Can), ewa ku di rojnameya RONAHÎ de, ew jî li Stenbolê dihat weşandin, fêrî nivîsandina gotaran bûme. Ez wan wek mamoste ji xwe re, di warê nivîsandina gotaran de dibînim. Jixwe kêfxweş dibim ku şagirtekî Mîr Celadet Bedirxan bim. Di adara 1989'an de min û hevalê xwe Abdulbaqî Huseynî, kovarek bi navê (Gurzek Gul), folklorî û çandeyî bi Kurdiya Latînî weşand. Ev yekemîn kovara serbxwe bû di nav kurdên Sûriyê de. Dikarim bibêjim ku, navdariya min di nav Kurdên Sûriyê de bi Kovara Gurzek Gul derket.. Paşê bi gotar û pirtûkên min yên ku hatine çap kirin û di serê wan de ya li dor Jiyan û xebata Mîr Celadet Bedirxan/1992, ez bêtir hatim naskirin. Ta niha berhemên min di 60 rojameyek kovaran de hatine belavkirin. Jixwe berî nivîsandina bi kurdî, min jî wek gelekan bi erebî dinivîsand. Ez bawerim min dirêj kir.

**Ali Gurdilî:** Di nav xebatên te de, ligel berhemên helbestan berhemeke bi navê 'Serhildana Sasonê'. jî heye, ku gelek bala min çû ser. Ev berhemeke lêkolînî ya dîrokî ye yan edebî? Ji kerema xwe re tu dikarî hinekê din zanîniyan bidî me? Yanî ev xebat rasterast li ser Serhildana Mala Eliyê Ûnis e gelo, yan?

**Konê Reş:** Belê, raste li ser Serhildana Mala Eliyê Ûnis e**.** Ev berhema min di sala 1995an de, bi zimanê erebî li Şamê hatiye çap kirin. Hem jî bi kurdiya tîpên Farisî li Duhokê ji rex mamoste Musediq Tovî ve hatiye wergerandin û çap kirin. Ev berhem Dîrokî ye. Li dor berxwedan û serhildana malbata Eliyê Ûnis (Qewmê Çiyê) li Çiyayê Sasûnê, dizîvire. Piştî beravêtîkirina serhildana Şêx Seîd Efendî, mala Eliyê Ûnis, bi fermana Kemalîstan û sirgunkirina Anadola Rojava razênebûn û di encam

de li ber xwe dan, ta ku di sala 1936an de di nav kurdên Sûriyê re derketin. Min piraniya bûyer, serpêhatiyên şer û çîrokên berxwedana wan ji ser zimanê wan girt, berî ku koça dawî bikin.

**Ali Gurdilî:** Heta niha temamiya berhemên cenabê te hatine weşandin, yan yên li ber çapê û yên ku hê nehatine weşandin jî hene gelo?

**Konê Reş:** Keko! We ev berhemên min jibîr kirine, ev jî hatine çap kirin:
**1-** Komeleya Xoybûnê û Şoreşa Araratê, Hewlêr, 2000
**2-** Dîroka Qamişlo, Lêkolîn bi zimanê erebîye. Silêmaniyê/2006, Şam/2012.
**3-** Dîroka Rojanamegeriya Kurdî li Sûriyê û Libnanê: 1932 - 2012, lêkolînek berfireh e, Duhok 2013.
**4-** Bajarê Cizîra Botan û Hunera Mîr Bedirxan, Stanbol, 2013.
**5-** Ji Stêrên Welatê Qedexe, lêkolînek berfireh e li dor 33 navdarên Kurd e, Duhok, 2013.
**6-** Dergehê Jîn û Evînê, Helbest, Beyrûrt, 2001.
**7-** Cûdî Çiyayê Miradan, Helbest, wergerandina Hejar Îbrahîm, Şam, 2004.
**8-** Dara Çinarê, Helbest, wergerandina Îmad Elhesen, Şam 2006.
**9-** Şîhîna Şevbuhêrkên Dîl: Helbest, Ji weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd tayê Duhokê, êlûna 2010.
**10-** Helbestên zarokan: III. Amed (Diyarbekir) 2013.
Ta niha 20 berhemên min di navbera Sûriyê, Libnanê, Kurdistana başûr, Tirkiyê û Ewropa de hatine çap kirin û 7 jî amade ne ji çapê re. Bi hêvî me ku di demeke kurt de di nav destê xwendevanan de bin.

**Ali Gurdilî:** Li ser xizmet, têkoşîn û keda malbata Bedirxaniyan jî, gelek xebatên cenabê te hene newsa? Ji kerema xwe, tu dikarî wan bi kurtî bi me bidî nasandin? Niha muzexaneyeke me ya bo parastina xebatên malbata Bedirxaniyan heye, yan na?

**Konê Reş:** Bedirxanî li kû bin Kurdistan li wire..! Ez ne bawer im ti malbatan wek malbata Mîrê Cizîra Botan, Mîr Bedirxanê Azîzî: 1802–1868, ji dil û can kar, xebat û bizav di ber gelê kurd de kiribin û tev malê xwe û canê xwe di ber de winda kiribin. Mîr Bedirxanê yê ku di sala 1843 an de, di herêma Botan de mîrnişiyek ava kir, pere bi navê xwe deranîn û di bin navê Peymana Pîroz de, kurd li dor xwe civandin û belav kir û got: Dîn dine Xwedê ye, em tev birayên hev in.. Û wiha biyaniyan di pesnê wî de gotin: Bedirxan Edalet e û edalet Bedirxan e.
Tevî ku neferên vê malbatê ji sala 1847an ve di koçberî û sirguniyê de dijiyan, lê wan qet welatê xwe Botan, warê bav û kalên xwe, jibîr nekirin, ji desthilanîn neketin, li ber xwe dan û gelek xebat û bizav kirin, da ku navê gelê xwe di nav gelên cîhanê de bilind bikin. Neferên vê malbatê di sirguniyê de, di bin şert û mercên çetîn û dijwar de, xwe berpirsyarê gelê xwe didîtin û kêşeya gelê kurd barê xwe yê yekemîn dinasîn. Bi gotin û kirinê dixebitîn; çi di warê civakî û rewşenbîriyê de, û çi di warê siyasî de û wiha tev di sirguniyê de, dûrî xaka Cizîra Botan mirin.
Her û her daxwaza wan pêşxistina gelê kurd û bilindkirina navê Kurdistanê bû. Wiha wan Bedirxaniyan gelek komele û dibistan damezirandin, gelek kovar û rojname weşandin, hem jî bi saya wan gelek navend û enstîtu ji gelê kurd re hatine ava kirin.
Piştî koçkirina mîr Bedirxan di sala 1868an de li Şamê, kurê wî mîr Miqdad Medhet Bedirxan, li ser rê û şopa bavê xwe kir qêrîn û gazî. Qêrîn û gaziya wî ji ya bavê wî bû. Wî di roja 22ê nîsana 1898an de, yekemîn Rojnameya kurdî li Qahîre bi navê KURDISTAN weşand û di nav rûpelên wê de gazî û qêrînî kurdan kir û got: (Gelî Mîr û Axano! Kurmancno! Qenc bizanin xwendin, ilm û merîfet (li) dinyayê û axretê rûyê mirov sipî dike, mirov mihtacî tu nabe. Riya Xwedê de paş niho zaroyên xwe bie'limînin ilm û merîfeta, hûn bi xulaqetê xwe şûca' û cesûrin, heke hûn bibin xweyî ilm, hûnê ji dinyayê hemîyan xurtir û dewlemendtir bin)
Neviyê mîr Bedirxan jî, Mîr Celadet Ali Bedirxan:1893-1951, hêviyên bav û bapîrê xwe li erdê nehiştin, bi xwe re hilgirtin û

hilanîn û di ber wan de xebitî ta roja dawî ji temê xwe. Wî jî di roja 15.5.1932 an de hejmara pêşîn ji kovara xwe (Hawar) a bi tîpên latînî, li Şamê çapkir û di nav kurd û biyanyan de belavkir.. Wî jî, bi Hawara xwe, qêrîn û gaziya bav û bapîrê xwe gîhand kurdan û got: (Herçî em Kurd, me zimanekî delal heye û em pê diaxifin, piraniya me ji vî zimanî pê ve bi tu zimanî nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin. Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her miletekî, êdî ne bi tenê wezîfeke şexsî ye, lê wezîfeke milî ye jî..).

Ma ne hêjane ku yekî weke min li dor kar û xebatên wan binivîsîne..?! Û ta ku ji min bê ez ê li dor pîş, saz û hunera wan binivîsim û navê wan bilind bikim.

Di vê derbarê de dikarim bibêjim ku, naveroka çar pirtûkên min li dor Berdixaniyan dizîvirin:

Mîr Celadet Bedirxan, bi Erebî; Şam 1992; bi Kurdî Stokholm 1997

Komeleya Xoybûnê û Şoreşa Araratê, Hewlêr, 2000

Dîroka Rojanamegeriya Kurdî li Sûriyê û Libnanê: 1932-2012, Duhok 2013.

Bajarê Cizîra Botan û Hunera Mîr Bedirxan, Stanbol, 2013.

Û min bi dehan gotarên têvel li dor Bedirxaniyan nivîsandine. Hem jî, bi zimanê Erebî, min çend gotarên dirêj li dor serhildana Mîr Bedirxan, Mîr Abdulrizaq Bedirxan, Êzdînşêr û Xelefê Şûvî nivîsîne û di çapemeniya Erebî de belav kirine.

**Ali Gurdilî:** Rewşa zimanê kurdî, li Rojavayê Kurdistanê çawa ye kekê hêja? Yanî, pêşketin hene yan? Bi awayekî fermî perwerdehî û weşan?

**Konê Reş:** Wek ku hun tev dizanin, piştî serhildana melyonî ya pîroz li Kurdistana başûr di sala 1991ê de, wêjeya Kurdî li nav me kurdên rojava derbasî qûnaxekê nû û ewarte bû, qûnaxeke ku ji hemû qûnaxên berê bi akamtir, hêztir û navtêdantir û rêk li ber nivîskarên cidî hat vekirin.

Ji sala 1990î û bi virde, hinekî çavgirtin ji çapkirina pirtûkên bi zimanê kurdî hatibû girtin. Di wan salan de gelek dîwan, kovar, pirtûk hatin weşandin, ew jî bi dizî bû û eger bi hatina girtin cezayê wê mezin bû.. Lê ji berî çend salan ve, nexasim piştî yasayên çapemeniyê di sûriyê de derketin, ew rêka çûk jî ji ber me hat girtin, tevî ku di wan salan de me berhemên xwe li Şamê çap dikirin û li ser datanî li Beyrûtê çap bûne.. Xwediyên çapxaneyan jî gelek pere ji me distandin, bi behana ku ew tiştekî qedexe ji me re dikin. Vêca, ji neçarî me berê xwe dida Kurdistana başûr û dervî welat (Eurûpa û Stenbolê), da ku em li wîr berhemên xwe çap bikin, hem ji ber qedexbûna ziman û hem ji ber buhayê çapkirinê... Lê mixabin ji serhildana 12 adra 2004an û vir de, rewş hat guhertin.. û wiha ta vê nîv azadiya ku roja îro em têre derbas dibin. Roja îro rewşa edebiyata kurdî li rojavayî Kurdistanê di cihê xwe de pîkolê dike.. Wek rewşa edebiyata erebî ye li Sûriyê, ku ew jî di cihê xwe de sekinîye.. lê bêguman nivîskarên resen her di kar û barên xwe de berdewam in û bi bûyerên welatê xwe ve girêdayî ne. Niha rewş me piştî vê nîv azadiya ku em têre derbas dibin, hewlidanin berfireh di qada fêrkirina zimanê kurdî bi tîpên latînî di seranserî bajar û gundên kurdan de têne kirin û di gelek dibistanan de bi rengekî nîv fermî dersên bi zimanê kurdî têne dan. Her wiha gelek partiyên me jî dest bi korsên zimanê kurdî kirine û xort û keçan fêrî ziman dikin.

**Ali Gurdilî:** Di civaka me kurdan de, adetê ku tu qet jê hez nakî çi ye gelo? Û ji ber çi?

**Konê Reş:** Di baweriya min de ji adetên herî xerab di civaka me kurdan de, berberî û dubendiya navxweyî ye. Em xwe bi xwe şerê hev dikin. Em ji xelkê re baş zilam in û ji hev re şêrên har in..!
Ji berî 350 salî ve Ehmedê Xanî, ev adet protesto kiriye û gotiye: Ger dê hebûya me ittifaqek. Sed mixabin ku ta roja iro ev adet lidare û derbasî nav siyasetmedarên me bûye.

**Ali Gurdilî:** Niha qasî ku ez dibînim û têdigihêjimê, haya gelek xort û keçên me ji çand û dîroka kurdan tune. Ji kerema xwe, tu dikarî bo xwendina wan çend berheman pêşniyaz bikî? Yanî hem ji bo pêşketina zimanê xwe î kurdî û hem jî bo zanîna çand û dîroka xwe?

**Konê Reş**: Di serê tevan de ez Kovara Hawar û Ronahî, yên Mîr Celadet Bedirxan û rojnameya Roja Nû û Stêr yên Mîr Dr. Kamîran Bedirxan pêşniyaz dikim. Ji ber ku yê van bixwîne, wê Mîr Celadet û Mîr Dr. Kamîran Bedirxan, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can û yên mayî ji nêzîk ve nas bike. Û Ferhenga Kurdî û Folklora Kurdî yên Seydayê Cegerxwîn. Lê xwezî hina Ferhenga Seydayê Cegerxwîn ji tîpên Erebî biguhezta ser tîpên latînî da ku kurdên me li bakur karîbûna bixwînin.. Ev ferhenga Seyda, ne ferheng tenê ye, erê navê wê Ferheng e, lê ew dîrok e, erdnîgariye, zimanzaniye.

**Ali Gurdilî:** Ez bawer im ku kitêbxaneyeke cenabê te a zengîn heye. Niha tu çi dixwînî û ji kerema xwe tu dikarî hinekê kitêba ku tu dixwînî bi me bidî nasandin?

**Konê Reş:** Kêfa min gelekî ji pirtûkxaneya min re tê. Bi berdewamî ez dixwînim. Her dem pirtûkek di nav destê min de heye.. Ez bi herdû zimanan Erebî û Kurdî dixwînim. Niha pirtûka Kurdî ya ku ez dixwînim (Omeriya Mîrsom) e, ji nivîsa mamoste Şerefxan Cizîrî ye û ya bi zimanê Erebî (Gera Aphonse de lamartîne ya Rojhilatê) ye.

**Ali Gurdilî:** Bi qasî ku min xwendiye û ez dizanim, te wext û kedeke mezin daye çand û zimanê kurdî. Gelo tu qet jê poşman bûyî yan na?

**Konê Reş:** Qewt na. Poşman nebûme. Raste, ta ku ez nivîsekê ji fikir û xeyala xwe, ji encamê zanîn, serwextî û serboriya ji bo gelê

xwe û mirovahiyê dinivîsînim, sed dijwariyî dibînim, lê bi belavkirina wê nivîsê re jî kefxweş dibim. Ji ber ku sûdeye civaka min têde hebe. Bi nivîsandina li dor kul û êş, kêf û şahiya gelê xwe rehet dibim. Nivîsandin ne henek û tinaz in, ne yariyeke ku mirov sebra xwe pê bîne û çax û deme xwe pê re derbas bike. Nivîsandin berpirsyarî ye, name ye. Nivîsandin ji îro û sibe re ye. Qet ez poşman nebûme û nabim. Bav û kalên me kurdan ji mêj ve gotine: Ga dimre çerim dimîne, mêr dimre nav dimîne. Bela navê me bi qencî di nav gel de bimîne.

**Ali Gurdilî:** Li gor bîr û baweriya te, gelo felsefe çi ye? Û ji kerema xwe, tu dikarî hebekê jî behsa felsefeya xwe ya jiyanê bikî?

**Konê Reş:** Ez ne felsefevan im û ew pêzanînên min yên berfireh di warê felsefeyê de nînin. Belê felsefeya kurdî, deryayeke kûr û bê binî ye, gelek çem û cobar tevlî ava wê dibin.
Di baweriya min de felsefeya kurdî, ew serborî, tecrîbe, bîr û baweriyên ku ji sedê salan ve di nav gel de belav bûne û cihê xwe girtine wek; (Jin stûna malê ye). An ; (Gelekî nede ber dasê ku das nemîne asê). Lê bingehê vê felsefeyê, wek ku tê xwestin di civakê de nehatiye danîn. Bi tenê devikî ye, zardeva ye. Nehatiye erşifandin. Tevî ku Malayê Cizîrî hin ji felsefeya xwe bi nivîskî di eşqa Îllahî û pesnê Selmayê de aniye ziman. Ehmedê Xanî jî, di destpêka Mem û Zîn de bingehê wê felsefeyê destnîşan kiriye. Lê her bîr, bawerî û serboriyên civakî ku ji hezarê salan ve hatine serê civaka kurdî û devikî têne gotin, ewin bingehê felsefeya Kurdî.
Belê sebaretî felsefeya min, wek rewşenbîr û nivîskarekî kurd dikarim bibêjim; em tev dizanin bê çendî ronahî bi sûde ye, rewşenbîrî jî wiha ye. Karê rewşenbîr, xebata wî ji bo ciwanbûn û spehîbûnê ye. Bizava wî, ku şerê qelpbûn û sextbûnê bike, da ku cihanek ji mirovên sade çak, têde bijîn. Qedera rewşenbîr e ku li kiryarên çak di civaka xwe de bigere, çi ji qencan re be û çi ji xeraban re be.

**Ali Gurdilî:** Ji bo vê hevpeyvînê **e**z gelekî spasiya cenabê te dikim kekê hêja û di kar û barên te de, serkeftinê dixwazim. Malî ava, tu her hebî.

**Konê Reş:** Ez jî, ji dil spasiya te dikim kak Ali Gurdilî, serketin û berdewamiyê bo te, hevalên te û kovara we re dixwazim. Mala we jî ava be.

**Hevpeyvîn: Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**04.02.2016**

**Konê Reş kî ye?**

Konê Reş, rewşenbîr, nivîskar û helbestvanekî Kurd e. Navê wî Selmanê Osmanê Abdo ye. Sala 1953an li gundê Doda, nêzîkî Qamişlo hatiye dinyayê. Di malbateke Kurdperwer, zimanhez û rewşenbîr de mezin bûye. Ji mêj ve hez ziman, folklor û toreya gelê xwe kiriye. Û wiha gelek berhem û gotarên wî di kovar û rojnameyên kurdî yên mehane û rojane de, hatine weşandin û gelek pirtûkên wî hatine çapkirin. Û bi serketin di her çar perçeyên Kurdistanê de hatiye naskirin.

Konê Reş, yek ji wan kesên pêşî ye ku di van sîh salên dawî de li Binxetê bi zimanê kurdî nivîsandiye. Hêjî bi kar û barên xwe yê nivîsandina bi zimanê kurdî berdewam e. Ew hebûna gelê kurd di hebûna zimanê kurdî de dibîne û her dem dibêje: ‘zimanê me dîroka me ye.’ Hêvî û daxwazên wî jî evin; ku wê rojê bibîne; ew roja ku her sibeh rojnameyeke kurdî bi tîpên latînî li ber deriyê mala wî be û bi rêka wê rojnameyê nûçe û bûyerên Kurdistanî û cîhanî bixwîne.

**Berhemên Çapkirî**

**1-** Serpêhatiyên Mîran (1); Beyrût 1991

**2-** Mîr Celadet Bedirxan, bi Erebî; Şam 1992; bi Kurdî Stokholm 1997

**3-** Sîpan û Jîn (helbestên zarokan: 1); Beyrût 1993

**4-** Serhildana Sasonê: 1925-1936; Şam 1995
**5-** Şagirtê Bedir-Xan im (helbestên zarokan: 2); Beyrût 1996
**6-** Osman Sebrî: 1905-1993; Şam 1997
**7-** Xwedî û Berpirsiyarê kovara (Gurzek Gul) (1989-1992)
**8-** Her weha xwediyê stoneke rojnemevanî bû bi navê (Hindik Rindik) di heft nameya de li Duhokê û bi dehan gotar, lêkolîn, pexşan û helbest di kovar û rojnameyên Kurdistanî belav kirin.
**9-** Welato! Konê Reş; 1998; Beyrût, Libnan.

**Jêder**


https://ku.wikipedia.org/wiki/Konê_Reş
http://www.gavle.to/~zagros/dost/krwelato.htm
http://www.gavle.to/~zagros/dost/koneres.htm
http://www.kurdistanabinxete.com/Beshe_Kurdi/Koneresh/Koneresh_kiye.htm
https://www.facebook.com/kone.resh

## Civaknasî
## Bizavdarî, Statû û Rola Civakî

Bizavdariya civakî; Ji ber sedemên cihêreng, di nav tebeqeyên civakî de cihguherandina şexsa ye. Ev cihguherandin, carinan ji bo demekî û carinan jî, bi awayekî domdar pêk tê.

**Du Texlîdên Bizavdarîya Civakî Hene**
**1- Bizavdariya Berwarî**
Bizavdariya, ku di heman tebeqeyê de tê dîtin e.
**Ev Bizavdarî jî du texlîd e**
**A- Cîhguhêzî**
(Bizavdariya berwarî ya ku di qada cografîk de tê dîtin)
Ji cîhekî ber bi cihekî din ve cîhguhêziya şexsa ye, ku di statûya wan de ferqeka mezin dernakeve holê. Ev cîhguhêzî, dibe ku ji bo demekê kurt be, yan jî ji bo demekê gelek dirêj be jî. Carinan jî, bi awayekî domdar pêk tê. Mînak: Betlane, geşt, perwerdehî, qurs, ji gund koçkirina bajêr û hwd.
**B- Karguhêzî**
(Bizavdariya berwarî ya ku di qada jiyana sosyal de tê dîtin)
Ji hêla prejtîjê ve, yan jî di nav statûyên nêzîk de, çûn û hatina şexsa ye. Mînak: Memûrekê şaredariyê, dema ku derbasî memûrtiya benqeyekê bibe, dema ku mamosteyek bibe serkarê dibistanê û hwd.
**2) Bizavdariya Tîkane**
Ji derbasbûna jêr û jor, ya di nav tebeqeyan de re tê gotin. Şexsekê ku bizavdariya tîkane pêk bîne, di statû û şert û mercên wî yên jiyanê de, guherînên girîng pêk tên. Mînak: Dema ku mamosteyek bibe mebûsek, yan jî dema ku karkirek bibe karsazekî mezin. Bizavdariya tîkane, di dawîya salên dirêj û bi kedeka mezin pêk tê. Weke ku xortekî gundî, bixwîne û bibe endezyarekî mezin yan jî karsazekî girîng î dewlemend.

**Statûya Civakî**

Ji asûna şexsan, ya ku di civakê de cih digrin û xwediyê wê ne; statûya civakî tê gotin. Di civakê de, her şexs xwediyê asûnekê ne ji ber vê asûna xwe ya civakî jî, xwediyê rolekî ne. Di civakê de şexs xwediyê gelek asûna ne û di nav asûnan de, yek destnîşankar e. Ji vê asûnê re jî, asûna destnîşankar tê gotin.

**Rola Civakî**
Ji maf, berpirsiyarî, salahiyet û wezîfeyên şexsan re ku çavkaniya wan statûya civakî ye, rola civakî tê gotin. Di civakê de şexs xwediyê gelek asûna ne û ji ber van asûnan jî, xwediyê gellek rola ne. Civak dema ku statûyekê dide mirovan, li bendê ye ku ew şexs rolên xwe yên ku ji vê statûyê dertêne holê, pêk bîne.
Dema ku şexs rolên xwe yên civakî pêk tînin, di heman demê de fêrî civakîbûnê jî dibin. Ango, dibin kesayetiyek civakî. Her şexs, di civakê de xwediyê asûneka destnîşankar e û ji ber vê asûna xwe jî, xwediyê roleka destnîşankar e. Ji vê rola ku çavkaniya wê statûya destnîşankare re, rola destnîşankar tê gotin.

**Pevçûna Rolan**
Ji rolên şexsan, dema ku yek bi yeka din re tê tevlîhevkirin û şexs, li gor vê yekê tevdigerin, pevçûna rolan tê gotin. Ji vê rewşê re pevçûna rolan tê gotin.

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com

**Çavkanî**
**Destpêka Zanista Civaknasiyê – Ali Gurdilî**

## Psîkolojî / Derûnnasî
## Ekolên (Xwendegehên) Psîkolojiyê û Taybetmendiyên wan

Di pêvajoya berfirehbûn û pêşveçûna zanista psîkolojiyê de, mirov dikare behsa gelek teorîsyen û psîkologan bike. Hinek teorîsyen jî hene ku di wateyeke zanistî de, keda wan di psîkolojiyê de gelek mezin e û bûne damezranerên ekolên (xwendegehên) cihêreng. Niha jî em ê taybetmendiyên wan xwendegehan bidin nasandin.

**1- Binyatgerî (Strûktûralîzm) - (Wilhelm Wundt)**
Wilhelm Wundt, wekî damezranerê psîkolojiyê tê dîtin. Ew, bi xebat û ceribandinên xwe yên psîkofîzyolojîk, gihêjtiye vê astê. Hêmana bingehîn ya nêzîkayîtêdana wî ya psîkolojîk, vekolanan wî yên <hiş/bîr> in. Li gor baweriya Wundt; hiş, xwediyê hêza sererastkirina naverokên xwe ye. Ji ber ku vê yekê parastiye, navê ekola wî wekî <Hemdparêzî/Vînparêzî/Îradeparêziyê> jî hatiye binavkirin.
***1-*** *Binyatgeran pirsa, <Hiş çi ye?> pirsî ne.*
***2-*** *Li gor baweriya wan; mijarên psîkolojiyê, hiş û pêvajoyên zêhnî yên ku hiş/bîrê tînin holê ne.*
***3-*** *Zêhn; ji hêla avahiya xwe ve, bûyerên weke raman, têgihan, hest û hemd/îrade ye. Mînak: Dema ku em wextekê dirêj li rengeke mêze bikin, rengê din çawa xwiya dikin? Têgihana germ û serma, çawa pêk tê? Dema em pirsgirêkeke çareser dikin, em bi hevokan difikirin yan jî bi lewnan? û hwd.*
***4-*** *Helwesta wan ya ku psîkolojiyê bi hiş sînor kirine, mijarên psîkolojiyê jî teng kiriye.*
***5-*** *Rêbaza; <Lênêrîna Derûnî>, bikaranîne.*
***6-*** *Li gor Wilhelm Wundt; psîkolojî, vekolandina hiş û pêvajoyên wê ye.*

**2- Erkevanî (Fonksîyonalîzm) - (William James / John Dewey)**

Çavkaniya nêzîkayîtêdana erkevaniyê, Amerîka ye û di sedsala 20 an de derketiye holê. Ev nêzîkayîtêdan, bi şixulîna zêhnê û lihevhatina organîzmayê ya bi dorhêla xwe re, eleqeder dibe.

Fonksîyonalîst li gor vê helwesta xwe, pirseka bi vî rengî ji xwe dikin: <Pêvajoyên zêhnî, dikarin çi bikin gelo?>

Ferqa wan ya ji Strûktûralîzmê ew e, ku ew weke wan zêhnê di yek bingehekê de şirove nakin. Li gor baweriya wan; zêhn yan jî hêmanên zêhnê, lodeka pêvajoya ye. Li gor baweriya wan; zêhn tevahiyeka erka ye, ku di cîhana rasteqîn de rê li encamên pratîk vedike.

***1-*** *Pirsa sereke ya erkevanîparêzan, <zêhn, ji bo çi ye?> ye.*

***2-*** *Li bûyer û avahiya zêhnî, bi rêbazên çavdêrî û çavdêriya derûnî, vekolane.*

***3-*** *Li ser lihevhatina organîzmayê, ya bi dorhêlê re û serkeftina wî/wê ya çareserkirina pirsgirêkan rawestiya ne.*

***4-*** *Li gor wan tevger, <guncaneke çalak ya bi dorhêlê re> ye.*

***5-*** *Ligel hiş, divê li tevgerên aheng/guncan jî were vekolandin.*

***6-*** *Girîngiyê dane, xwepêşandan û feydexwaziyê.*

***7-*** *Demjiyanên derûnî, ji ketumetbûnên wê demê derketine holê. Li faqtorên, ku bandûra wan li ser jiyana derûnî û tevgerên me hene, rawestiyane.*

***8-*** *Heke bersiva, pirsa 'çima wiha tevdigere?' were dîtin, wê lihevhatina organîzmayê hêsantir bibe.*

***9-*** *Tevger; li gor encamên xwe, baş yan jî xirab in.*

**3- Tevgergerî (Behavyorîzm) - (John Watson / Îvan Pavlov)**

***1-*** *Behavyorîstan; Strûktûralîstan bi sûcê vekolandina mijarên kirdewar/oznel sûcdar kirine û bi tundî, li dijî psîkolojiya hiş derketine.*

***2-*** *Li gor bîr û baweriya wan; ji bo ku psîkolojî bikaribe bibe zanistek, divê li ser tevgerên mirovan yên têne xwiyakirin û dikarin werin pîvandin, raweste û bi vî hawî li wan vekole.*

***3-*** *Ji Behavyorîstan re; <Psîkologên Hişyarker-Bertek H-B> tê gotin.*

***4-*** *Tiştên ruhî, raserê xwazayê ne û zanist, bi wan re mijûl nabe.*

***5-** Mirov heta fikirînê jî, bi têgeheke weke demîngirtinê (şartlanmayê) dikare şirove bike.*
***6-** Ji ber ku tevgerên heywanan dişibine tevgerên mirovan, divê li wan jî were vekolandin.*

***Rexneyên ku li Tevgera Behavyorîzmê hatine girtin***

***1-** Ji 100 % mirov nikare objektîv tevbigere.*
***2-** Pirraniya bûyerên giyanî; ji ber ku nikarin werin çavdêrîkirin, li derveyê lêkolînên xwe hiştine.*
***3-** Bi riya demîngirtinê, qontrolkirina şert û mercên hawirdor û bi vê yekê xwesteka qontrolkirina tevgerên mirovan, rê li afiranderiya mirovan girtiye.*

**4- Psîkanalîz (Tevgera Psîkodînamîk)**

***1-** Di dawiya sedsala 19 an de, bi serpereştiya Sigmund Freudî dest pê kiriye. Sigmund Freud û çend hevalên xwe yên doktor gotine ku nexweşiyên aqlî û ruhî, nexweşiyên psîkolojîk in.*
***2-** Di dema vekolana nexweşiyên aqlî de, binehişê kifşkirine.*
***3-** Piştra, Freud û hevalên wî wiha bawer kirine ku sedemên nexweşiyên aqlî û ruhî, têrnekirina hest û ramanên me yên zarokatiyê ne, ku ber bi binehişê ve têne dahfdan û wisa tê xwestin, ku bila werin jibîrkirin.*
***4-** Li gor baweriya Sigmund Freud; hiş, ji sê (3) meretebeyan pêk tê.*

**1- Hiş:** Ya ku em têdigihêjinê.
**2- Beriya hiş:** Tiştên ku li gor xwestekên me, têne bîra mirov in.
**3- Binehiş / Binehişî:** Xwestek û hestên me, yên ku me wan bi temamî jibîrkiriye.

*5- Kesayetî/şexsîyet, ji sê (3) mertebeyan pêk tê:*

**1- Îd**

Hilika/navenda, kesayetiyê û hêla bîyolojîk ya ku xwe dispêre zewqê.

**2- Ego**

Rewşa hevsengî *(parsengî-denge)* ya ku rasteqînî lê serwer e.

**3- Superego**

Hêla sosyal/civakî, ya ku nirxdarazî têne pejirandin.

***6-*** *Binehişî ne pasîf, herdem aqtîv e. Carinan lewna xwe biguherîne jî, di xewn û xeyalan de xwe dide der.*
***7-*** *Pirraniya tevgerên me, li gor vê yekê (li gor rewşa binehişê) pêk tên/çêdibin.*
***8-*** *Freud û hevalên wî; wiha têgihiştine ku sedemên bûyerên ruhî/derûnî, bîyolojîk in jî. Yanî, bandûra biyolojiyê jî, li ser psîkolojiya me heye.*
***9-*** *Di bingeha tevgerên kesayetiyan de, jiyana wan ya zarokatiyê heye.*

***Derhişî (Binehişî) çi ye?***
*Avahiya ku ji aliyê hest, bîranîn û xwestekên me yên hatine dewisandin pêk hatiye. Sedemê dewisandina van hestan, bîranîn û xwestekên zayendîtiya hov û vajoyên êrîşkar in, ku bi demê re êş û şermê didin mirovan.*
***10-*** *Ji bo têgihiştina tevgerên mirovî, divê mirov bi zarokatî û rabirdûya wan bizanibe.*
***11-*** *Hindek sedemên tevgerên me, bîo-psîkolojîk in.*
***Rêbazên ku tevgera Psîkanalîzê wan bikaranîne:***
***1-*** *Dahûrandina Xewnan*
***2-*** *Hîpnoz*
***3-*** *Bibîrxistina Serbest*

**5- Nêzîkayîtêdana Bîrbirîgerî (Jean Piaget)**
***1-*** *Li gor vê nêzîkayîtêdanê psîkolojî; vekolandina bûyerên zêhnî yên weke serwextbûn/têgihîştin, hiş/bîr û fikirîn e.*
***2-*** *Şexs, ji wan pêvajoyan sûd werdigrin û derheqê xwe û hawirdorê xwe de, zanayiyan bi dest dixin.*
***3-*** *Ji bo têgihiştina şexsan, divê em bi awayê têgihiştina xwe ya şexsan û awayê têgihiştina wan ya civakê bizanibin.*
***4-*** *Rêbaza wan, rêbaza ezmûnê ye.*
***5-*** *Zanîn û fêrbûn, du riyên bidestxistina zanayiya ne.*

**6- Nêzîkayîtêdana Bîyolojîk / Bîyopsîkolojî (Adolf Mayer)**
***1-*** *Ev nêzîkayîtêdan; hewl dide da ku têbigihêje sebebên fîzyolojîk û psîkolojîk yên ku bandûrê li tevgerên mirovan dikin.*

**2-** *Awayê şixulîna xwiziya/avzêya derûnî û avahiya kimyewî ya xwînê û pêvajoyên tûreyî/sinirsel yên mejî, xwe di tevgerên me de didin der. Ango, bandûrê li tevgerên me dikin.*
**3-** *Ji bo têgihiştin (fêhmkirina) mirovan, divê mirov bi bîyolojî, sosyolojî û psîkolojiyê bizanibe.*
**4-** *Rêbaza ezmûnê, bikaranîne.*

**7- Nêzîkayîtêdana Tevdeyî (Psîkolojiya Geştalt)**
**(Karl Kofka- Wolfgang Kohler)**
**1-** *Li hemberê, Behavyorîst û Strûktûralîstan derketine.*
**2-** *Li gor bîr û baweriya wan bûyerên psîkolojîk, bûyerên tevdeyî ne. Ji ber vê sedemê; ji bo fêhmkirina mirov, divê bûyerên hawirdorî, bîyolojîk û zêhnî, bi hevdu re werin nîrxandin.*
**3-** *Tu tevger; bi serê xwe tenê, ne xwediyê wateyeke ne. Tevger; bi awayekî tevdeyî, ji şert û mercên sosyal û fizikî, ketumet dibin.*
**4-** *Her tevger, ji tevgera berê ketumet dibe.*

**8- Nêzîkayîtêdana Humanîst (Mirovhez) / (Maslow, Rogers)**
**1-** *Li gor vê nêzîkayîtêdanê; tevgerên mirov, ne bi binehişê û ne jî bi têkiliya H–B (Hişyarker û Bertekê) dikarin werin şirovekirin.*
**2-** *Berfirehbûna mirovî, hewcedarê pêdiviyên fizyolojîk û sosyal e. Têrnekirina wan, bandûreke neyînî li pêşveçûna psîkolojîk dike.*
**3-** *Têrkirina pêdiviyên mirovî û pêkanîna behre û potansiyela xwe, xala têrbûna wî/wê ye. Bi vî awayî, ew hebûna xwe pêktîne.*
**4-** *Rêza/dora pêkanîna mirov ya pêdiviyan, hilbijartina wan ya şexsî ye.*
**5-** *Dilêrîna wan ya bingehîn, <mafê hilbijartinê ya mirova> ye.*
**6-** *Rêbaza wan, Çavdêriya Derûnî ye.*

**Ali Gurdilî**
felsefevan@hotmail.com
**11.04.2016**

**Çavkanî**
**Destpêka Zanista Psîkolojiyê – Ali Gurdilî**

## **Ji Mîtolojiya Êzîdiyan**

Di pirtûka Mizhefa Reş de Xwedê, ji cewahîra xwe înciyekê sipî û bi navê ANFAR çûkek diafirîne. Xwedê înciyê datine ser pişta vê çûkê û di ser de çil (40) sal diborin. Piştra di heft (7) rojan de, heft ferîşteyan diafirîne. Navê ferîşteyên yekemîn ku, wî roja lehdê (yekşemê) afirandibû, datîne Azazîl. Vaye ev melek, Tawisî Melek *(Melekê Tawis)* e. Xwedê, Tawisî Melek dike melekê herî bilind û raser. Xwedê piştre şekil daye heft (7) ezmanan. Piştre ser rûyê erdê, tavê û heyvê afirandiye. Mirov, heywan, çûk û hutan afirandiye û wan xistiye nava hawranê xwe.

Di dawiyê de, Xwedê bi melekên xwe re rabû. Qîrekê wiha da încî ku ew bû çar perçeyan û ji hemû aliyan av derhat. Berê, dinya wiha hatibû afirandin ku têde hevrezan tinebûn.

Xwedê piştra Jibtraîl *(Cebraîl)* afirand ku ew jî, di lewnê çûk de bû. Hemû dorhêlê dinyayê teslîmê wî kir û wî şande dinyayê. Melek keştiyekê çêkir û di wir de jî sih (30) sal bihûrand. Piştre, hate Lalişê û li wir bi cih bû. Li dinyayê qîriya û behr *(derya)* bûne erd. Dinya jî bû ser rûyê erdê û hejîna wê dewam kir.

Xwedê ferman da Cebraîl ku, wê înciyê bike du perçeyan. Yek xiste bin erdê û ya din jî, danî ber deriyê bihûştê.

*Xwedê wiha axifî:*

*'Ez ê Adem û Hawê biafirînim û wê ew ê bibin mirov. Wê ji wan du nîjad zêde bibin. Yek ji wan gelan; Şahîd Ben Car û zarokên wî gelên Êzîdî ne ku ew, ji pişta Adem in.*

*Wê ev gel bibin gelê Tawisî Melek, ango gelên Azazîl. Piştre, wê ez ê şêx Hadî bişeynim ser rûyê erdê û dê ew ê li Lalişê bimîne.'*

Piştî vê yekê Xwedê ferman da Cebraîl, ku here welatê pîroz û ji wir ji hemû cihan axê bîne. E wî jî axê, agir, hewa û avê anî. Xwedê ji van çar regezan, mirovî afirand û ji hêza xwe rih da wî. Piştre,

ferman da Cebraîl ku wî bibe bihûşte. Piştî sed (100) salan, Tawisî Melek çû ba Xwedê û jê wiha pirsî: 'Ya Xwedan. Dê nîjada Adem çawa zêde bibe?'

Xwedê bersiva wî wiha da: 'Ez têkilî dinyayê nabim, lewre min kargêra *(birêvebirina)* dinyayê daye te.'

Xwedê ji dinyayê destê xwe şûşt û Tawisî Melek kete dewsa wî. Ango, bû cihgirê wî. Piştre, Tawisî Melek, Adem û Hawê ji bihûştê qewirand *(berda wan)* û bi vê yekê re jî; li dinyayê jiyanê dest pê kir.

**Menzel**

**Çavkanî:** Sabiha Banu Yalkut. Gelê Melekê Tawis. Weşanên Reş û sipî. Metis Guncel. çapa yekêm 2002. Rûpel: 43- 44

**Werger: Ali Gurdilî**

felsefevan@hotmail.com

## FERHENGOKA FELSEFEYÊ

**1- Aksiyolojî (Nirxzanî):** Di wateya 'zanista nirxan' de ye û ji peyvên yewnanî yên nirx *(axia)* û zanistê *(logos)* tê, ku di wateya zanistiya nirxan de ye. Bi navê etîk û estetîk, dibe du beş.
Etîk, li nirxên ehlaqî yên mirovan vedikole û estetîk jî, li têgeha spehitiyê *(delalî)* vedikole. Gelek dijware ku meriv etîk û estetîkê ji hevdu cihê bike û lewma jî, aksiyolojî li nirxên ku bandûra wan li ser tevgerên mirovan heye, vedikole.
ing: axiology
fr: axiologie
tr: aksiyoloji

**2- Antagonîzma (Dijraberî, Mixrikî):** Di wateya dijber, berçewt yan jî dijraber de ye, ku bi pirranî di warê tipê de tê bikaranîn. Gelek bûyerên fizyolojîk, di rastiya xwe de bi rêya antagonîzmayê pêk tên, ku ji wan re 'feedbacka negatîv' tê gotin. Yanî, cureyeke dewisandinê yan jî pêkanîna bandûreka dijraber e.
Du heyber, tişt yan jî bandûr, bi xêra hevdu hebûna xwe berdewam dikin û ku hebûnatiya yekê, girêdayî hebûnatiya a din e. Wekî 'em' û 'yên din'. Di vê xalê de hebûnatiya me, encax bi xêra hebûnatiya a din dikare pêk were yan jî xwe berdewam bike. Immanuel Kant, di gotara xwe ya bi sernavê 'Li Ser Armanca Hemwelatiya Dinyayê Ramaneke Dîrokî ya Gelemperî' de, vê têgehê wekî hêza dafdanê ya dîrokê bikar aniye.
ing: antagonism
fr: antagonisme
tr: antagonizma

**3- Antîpsîkiyatrî (Dijpsîkiyatrî):** Tevgereke psîkolojiyê ye û di sala 1960an de, li İngilistanê derketiye holê. Dijpsîkiyatrî li dijî angaşt û cibicîanînên psîkiyatriyê radibe û rexne li wan digre. Nûnerên wê yên sereke Franco Basaglia, Ronald Laing, David

Cooper, Michel Foucault û Thomas Szasz in. Komek psîkiyatr, hatine cem hev û zanayî û tecrubeyên xwe parve kirine.
Du nûnerên vê tevgerê yên sereke, Ronald Laing ê ingilîz û David Cooperê iskoçî, di sala 1967an de vê tegehê bi awayekî fermî bikaranîne û tevgerê dane destpêkandin.
Li gor bîr û baweriya wan şizofrenî, ne nexweşiyek e. Lêbelê bertekek sendromî ye, ku li dijî zordestiya malbat û civakê tê nîşandan û ku xwepêşandaneke şexsî a siyasî ye.
David Cooper, di kitêba xwe ya Mirina Malbatê *(The Death of the Family)* de gotiye ku malbatan ji bo ku bikaribin desthilatdariya xwe ya qelp li ser endaman ava bikin, nexweşiyeke afirandine û tipê jî ji bo danasîn, teşhîs, sinifandin û dîtina rêbazan, li ser vê mijarê bi navê *'psîkiyatriyê'* beşeka pisporiyê a taybet damezrandiye.
ing: anti-psychiatry
fr: antipsychiatrie
tr: antipsikiyatri

**4- Azadiya Negatîv:** Di wateyeke felsefîk de azadiya negatîv, beyî ku di bin tehde û zordestiya desthilatdariyê *(otorîteyê)* de bin, rewşa azadiya mirova ye. Di vê dilêrîna negatîv de, çalakiyên meriv û tevgerîna serbest, dertê pêş.
Mesela li gor Thomas Hobbes 'zilamê azad, ew kes e ku her tiştî bi îradeya xwe ya azad dike' ye. Ferqa di navbera têgehên azadiya negatîv û pozîtîv de, ji aliyê Isaiah Berlin ve di konferansa bi navê 'Two Concepts of Liberty' de hatiye destnîşankirin.
Li gor bîr û baweriya Berlinî, ev ferq di kevneşopiya polîtîk de bêtir xwe bi cih kiriye. Dîsa dikare were gotin ku têgeha azadiya negatîv, herî zêde bi felsefeya feylesofên ingilîz *(Locke, Hobbes, Smith)* re têkildar e û têgeha azadiya pozîtîv jî, bi felsefeya feylesofên mîna Hegel, Rousseau û Herder re têkildar e. Ango, di felsefeya wan de tê dîtin.
ing: negative liberty
fr: liberté négative

tr: negatif özgürlük

**5- Azadiya Pozîtîv:** Hêza destnîşankirina jiyana xwe, ya mirova ye. Meriv dikare li vir rewşa miroveke araqxwer wekî mînak bide. Ev kes ji aliyê vexwarina araqê ve, xwediyê azadiya negatîv e û rê li ber nehatiye girtin. Lêbelê heke bibe alkolîk, wê demê jî dê ji azadiya xwe ya pozîtîv bêpar bimîne. Lewre, rewşa alkolîzmê rê nade ku xwe pêk bîne.
ing: positive liberty
fr: liberté positive
tr: pozitif özgürlük

**6- Bedbînî (Reşbînî, Pesîmîzm):** Têgeha bedbîniyê *(pesîmîzm),* bi wateya xwe ya resenî dijberê peyva xweşbîniyê *(optîmîzm)* ye. Wekî nêrîneke dinyayê jî, portreyeke reş û bedbîn disewirîne. Mirovên bedbîn, herdem dawiyeke bedbîn xeyal dikin û derheqê siberoja xwe de jî, reşbîn in.
Arthur Schopenhauer di berhema xwe ya bi navê 'Dinyaya Pêşnûma û Hemdê' de, sebebên reşbîniya metafizîkî raxistiye holê. Gotina wî ya navdar ew e ku gotiye 'jiyan, bi temamî êş û jan e' *(Alles Leben ist Leiden).*
Bandûra reşbîniyê, di sedsala 20an de, bêtir hatiye hîskirin. Hinek kesên ku di bin bandûra bedbîniyê de mane jî ev in: Émile Michel Cioran, Ulrich Horstmann, Ludwig Marcuse û Theodor Heuss.
ing: pessimism
fr: pessimisme
tr: kötümserlik

**7- Cewher:** Wateya peyva cewherê rasteqîniya ku piştgiriya lêkerên guhêrbar dike, a ku xwe bi xwe tê meydanê û di xwe de ye, ye. Bi gotineke din meriv dikare bibêje ku a ku ne di kirdeyê de ye, a ku bi awayekî serbixwe di xwe de heye ye.
John Locke'yê ramangirê ingilîz, ji bo peyva substantia'yê ku di zimanê latinî de di wateya 'ya ku di binî de ye, a ku bingeh e'

wuha dibêje: ‘Em têginagihêjin wesfên *(çawanî)* ku bi serê xwe hebûna xwe didomînin û bi awayekî bêgav, em wuha difikirin ku divê hinek tiştên din yên ku palpiştiya wan dikin jî hebin. Herweha dîsa em wuha dipên û difikirin ku ev tiştê piştgir, di nesneyên din de jî heye. Vaye em ji vê wesfa hevpar re, dibêjin cewher.’ Rene Descartes jî wuha dibêje: ‘Dema ez li cewherê difikirim, ez li tiştekî wuha difikirim ku ji bo hebûnatiyê pêdiviya wî bi tişteke din tune.

Heke em eşkere bibêjin, divê em bibêjin ku bi tenê Xweda wuha ye.’ Baruch Spînoza jî dibêje; ‘ez ji têgeha cewherê, fahma heyîna ku ji ber xwe ve çêdibe û weke xwe ye dikim. Ji bo pêkhatina vê têgehê jî, pêdivî bi têgeheke din tune.’

Lêbelê zanist, hebûna tişteke naguhêr napejirîne. Ligel vê yekê hinek teoriyên nûjen dibêjin ku heyîn ji kuarkan pêk tên ku madeyên hevpar û naguhêr in. Di felsefeya diyalektîk de cewher, made *(mather, matière, madde)* ye.

ing: substance

fr: substance

tr: töz

**8- Cogito ergo sum:** ‘Cogito, ergo sum’ (Difikirim, nexwe ez heme), gotineke felsefî ya René Descartes *(1596–1650)* e û di rasyonalîzma rojavayê de, wekî gotineke (elementeke) damezraner hatiye dîtin. Cogito ergo sum, wergera latinî ya hevoka ‘Je pense, donc je suis’ ku hevokeke fransî ye û ji kitêba wî ya ‘Discours sur la méthode–Rapeyvên li ser Rêbazê, 1637’ hatiye girtin. Descartesî di destpêkê de çar *(4)* prensîpan destnîşan dike:

***1-*** *Ji bilî fikrên eşkere û zelal, divê fikreke din neyê pejirandin.*

***2-*** *Pirsgirêk ji bo ku bikaribin werin çareserkirin, divê têra xwe werin dabeşkirin.*

***3-*** *Fikr, divê ji sadetiyê ber bi yên tevlîhev werin rêzkirin.*

***4-*** *Divê meriv bala xwe baş bidê ku fikrek kêm nemabe yan nehatibe jibîrkirin.*

Piştî destnîşankirina çend prensîpan, wuha pêde çûye: Sehekên me xapînok in û carinan me dixapînin. Ji bo vê hindê jî, divê em baş bizanibin ku hemû tiştên xwiyakirî, ne mîna xwe ne. Yan jî mîna xwe, xwiya nakin. Gelo ez ê çawa bizanibim, ku ez a niha li ber sobê rûniştime? Ez nikarim bi vê yekê bizanibim, çimku dibe ku ez di xewê de bim yan xewnekê dibînim. Yan jî dibe ku şeytanekî muzawir *(muzîp)* henekên xwe bi min dike. Lêbelê, tekane tiştê ku ez jê gumanê nakim ew e ku ez difikirim. Ez di xewê de bim jî, yek min bixapîne jî û ez xwe bêbeden bifikirim jî, ez difikirim. Çimku ez difikirim, nexwe ez heme.
ing: cogito ergo sum
fr: cogito ergo sum
tr: cogito ergo sum

**9- Darwînîzm:** Teoriya peresanê ya dîrokzanê xwezayê Charles Darwin e, ku li gor vê teoriyê peresan bi rêya hilbijirîna siruştî pêk tê. Guftegoyên li ser Darwînîzmê, bi pirranî li ser mijara peresana ku bi rêya niqandina *(seleksiyon)* siruştî pêk tê, hatine kirin.
Lêbelê peyva Darwînîzmê ji aliyê oldarên cihê ve, wekî îdeolojiyekî tê bikaranîn û nasandin. Lewma jî, zanyar nabêjin Darwînîzm. Biyologê E. O. Wilson jî dibêje ku, 'zanyar nabêjin Darwînîzm.' Wekî gotina dawî meriv dikare bibêje ku di dema me ya îroyîn de wateya giştî ya Darwînîzmê, di wateya teoriya peresana zanistî de ye.
ing: darwinism
fr: darwinisme
tr: darwinizm

**10- Dibistana Frankfurtê (Ekola Frankfurtê):** Navê vê dibistanê ê resen, 'Institut für Sozialforschung' e. Wekî tevgereke ramanî bilêvkirina Enstitûya Lêkolînê ya Civakî ye, ku di sala 1923an de li Almanyayê hatiye damezrandin û ji disîplînên cihêreng yên wekî civaknasî, siyaset, psîkanalîz, dîrok, ciwannasî *(estetîk)*, felsefe û muzîkolojiyê, gelek zanyar û feylesofan aniye cem hev.

Nêzîkayîtêdana gelemperî ya vê dibistanê, teoriya rexneyî ye. Dibistana Frankfurtê, berê xwe daye rexnekirina Marksîzmê û hewl daye ku di vî warî de, teoriyeke civakî ya rexneyî û nû damezrîne. Wê demê Şoreşa Ûris dejenere bibû û veguheriyabû Stalînîzmê û tevgerên çepgir jî, li Ewropayê têk diçûn. Hebûna kirûyên Nazîzm û faşizmê û tevgerên siyasî û îktîsadî yên ku di sîstema kapîtalîst de xwe didane der, şert û mercên vê dibistanê afirandine. Dirûşmeya bingehîn ya vê ekolê, rexnekirina sosyalîzma Sovyetê û sîstema kapîtalîzmê ye.
Di van şert û mercên dîrokî de, Dibistana Frankfurtê hewl daye ku teoriyeke civakî ya rexneyî raberê civakê bike û rêya qada teorîk ya ku xitimî ye vebike. Jurgen Habermas, Walter Benjamin, Theodor Adorno, Max horkheimer û Herbert Marcuse, navê girîng yên Dibistana Frankfurtê ne.
ing: frankfurt school
fr: école de francfort
tr: frankfurt okulu